



**Zanîngeha Wan Yûzûncû Yîlê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**DI EDEBIYATA GELÊRÎ YA KURDÎ DA DI'A û NIFIR**

**Amadekar**

Ahmet ÖNER

**WAN – 2017**



**Zanîngeha Wan Yûzûncû Yîlê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

## **DI EDEBIYATA GELÊRÎ YA KURDÎ DA DI'A û NIFIR**

**Amadekar**

Ahmet ÖNER

**Şêwirmend**

Doçentê Alîkar Nesim SÖNMEZ

**WAN – 2017**



**Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi**

**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Dili ve Kültürü Bölümü**

**Yüksek Lisans Tezi**

## **KÜRT HALK EDEBİYATINDA DUA VE BEDDUA**

**Hazırlayan**

Ahmet ÖNER

**Danışman**

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2017

## KURTE

### DI EDEBIYATA GELÊRÎ YA KURDÎ DA DI'A û NIFIR

Di edebiyata Kurdî ya Gelêrî da, beşek ji folklorê di'a û nifir in. Dema ku meriv bixwaze fikir û ramanên xwe sedî sed bigihîne merivekî an jî meriveke din, gelek caran hewcehiyê bi di'a û nifiran dibînin. Di demên wiha da, tenê di'a û nifir dikarin kula dilê meriv der bikin; di van deman da, ku di'a an jî nifir neyê kirin; hizr û raman qels dimînin.

Armanca yekemîn ew e, ku ev xebat bibe mînak û gelek kes hêjayiyên folklorîk dema ku berhev bikin û biweşînin da ku berhevkarên ku bixwazin kitêb û ferhenga di'a an nifiran çap bikin, ji van berhevkirinan wek çavkanî sûdê jê werbigirin. Mabesta duyemîn ew e, ku bal kişandina ser curbicur peyvên ku nav hevokan da derbas dibin. Û bêjin, destpêk û kurahiya ziman û wêjeya Kurdî diherike hezaran sal a.

Gelek kes pir cihan di'a, nifir, biwêj, gotinê berê, dijûn, çîrok, şîret, çîrok, destan, stran, zûgotinok, serborî, tiştonek û metelok hwd. berhev dikin. Ji ber vê cûdahiya di navbera herêman da, di berhemên folklorîk da jî xwe nîşan dike. Ger orjînalîteya wan xera bibe, pîspor dê çawa bikaribin, cûdahiyên di navbera herêman da fêrbîn. Bal hat kişandina ser derxistina meydanê ya yekîti û dewlemendiya zimanê Kurdî.

Piştî çend xalên destpêkê, vê xebatê da di'a û nifir ji gelek kesan rûbirû hat pirsîne. Yên ku di hiş da bûn û yên ku kovar û kitêban da hatine çapkirin û hinek jî yên ser malperan hatine weşandin, xebatê da kombûn. Her çiqas herêma ku lê hatime dinyayê "Serhed" be jî, ew nayê wê wateyê ku ev di'a û nifir yên der û dora Serhedê ne. Ev xebateke xam e, ji ber wê yekê me di'a û nifir li gorî mijar û herêmên wek Serhed, Amed, Hekarî, Botan, Behdînan, Soran, Baban, Dêrsim, Şingal, Rojava û Mahabad hwd. nivîsîne. Di vê xebatê da, me bi tenê di'a û nifir li gor wateya sernavan û herêman nivîsîn, wate û şiroveya wan ya berfireh nenivîsîn. Ew mijara xebateke û lêkolîneka din e. Ango xebata di'a û nifiran ne alfabetîk in.

Dawîyê da ev xebata li gorî rê, rêbaz û reçikên zanistî amade bûye edîb, şaîr, zimanzan, rewşenbîr, lêkolîner, hunermend û hemû kesên ku bi ziman, wêje, çand, dîrok, pezişk û civaknasiya kurdan ra têkildar in ra bi dilşadî û bextewarî pêşkeş dibe wek çavkaniyekê akademîk a bingehîn.

**Peyvên Sereke:** Di'a, Nifir, Folklor, Edebiyat, Edebiyata Gelêrî.

## ÖZET

### KÜRT HALK EDEBİYATINDA DUA VE BEDDUA

Kürt Halk Edebiyatındaki folklorik türlerden biri de dua ve beddua konusudur. İnsan istek ve amaçlarını yüzde yüz birisine ulaştırmak istediği zaman bazen bunlara ihtiyaç duyar. Bu durumda ancak dua ve beddualar kişinin kalp ve gönlünden geçeni tam olarak anlatır veya kişiyi rahatlatır. Kimi zaman konu dua ve beddua sözleriyle ifade edilmediğinde maksat eksik kalır veya anlam tam yerine gelmez.

Bu çalışmayı hazırlama amaçlarından biri halk edebiyatında akademik olarak, folklorik eserler hazırlayanlara ve özellikle de dua ve beddua sözleri alanında makale, sözlük, dergi ve kitap çalışanlar için bir kaynak olarak istifadesine sunmaktır.

İkinci amaç halk arasında konuşulan dua ve beddua cümleleri içinde geçen birçok eski ve anlamlı kelimeleri göz önüne getirmek aynı anda Kürt dili ve edebiyatının derinliği ve mazisinin yüz yıllara dayandığını görmektir. Bir diğer amaç ise araştırmacı ve yazarların değişik Kürt bölgelerinde bulunan atasözü, bilmece, bulmaca, deyim, şarkı, hikaye ile beraber dua, beddua ve küfür sözlerine aşina olabilmelerini sağlamaktır. Böylece coğrafi bölgeler arası zengin dil ve kültür farklılıkları ortaya çıkmış olmaktadır. Bu çalışma ile Kürt dilindeki zenginliğin ve bölgeler arası farklılıkların tanınmasının yanında dil birliğinin oluşması ve dil varlığının akademik düzeyini uzmanların dikkatine çekmeye çalışılmıştır.

Birkaç başlangıç noktasından sonra bu çalışma çoğunlukla insanlarla yüz yüze görüşülmüş ancak bir kısmı da makale, dergi ve kitaplarda yazılanlarla birlikte çeşitli facebook ve internet sayfalarından istifade edilmiştir.

Her ne kadar yaşadığımız bölge “Serhad” olsa da çalışmamız “Serhad” ile sınırlı kalmıştır. Çalışma Serhad, Amed, Hakkari, Botan, Dersim, Behdinan, Soran, Şehrezor, Şengal, Kafkasya, Rojava, Mahabad gibi bölgelerden toplanılanlarla yazılmıştır. Çalışmamız bölge ve konulara göre tasnif edilmiş. Fakat alfabetik olmamakla birlikte geniş mana ve yorumları konuyu dağıtacağından başka bir çalışmaya bırakılmıştır.

Bu çalışma sonuçta Kürt dili, edebiyatı, tarihi, kültürü, sanatı, tıbbi ve sosyolojisi ile ilgili akademik çalışan bütün araştırmacı, dilbilimci, edebiyatçı, şair, sosyolog, doktor ve sanatçılara temel bir kaynak gibi takdim edilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Dua, Beddua, Folklor, Edebiyat, Halk Edebiyatı.

## **SUMMARY**

### **PRAYS AND CURSES IN KURDISH FOLK LITERATURE**

One of the folkloric sections in Kurdish folk literature are prays and curses. Sometimes, when people want to convey their wishes and aims to someone fully they need them. In such cases, only prays and curses explain fully what goes through in the person's heart. In these situations, if prays and curses are not done, the purpose is incomplete.

One of our aims to prepare this study is that people preparing precious works in folk literature and especially those preparing books and dictionaries in the field of words of prays and hate benefit from their works as a source. Our second goal is that by considering some radical and old Word in the sentences of prays and hate used among people, we can say that the roots and depths of Kurdish language and literature date back to countries.

Our another goal is that researches collect prays hate phrases , idioms, proverbs, swearword,riddles,puzzles in different regions. So this leads to language and cultural differences among geographical regions. With this study, the experts recognizing the differences and the unith and richness or Kurdish language are taken to attention.

After several points of debut much of the endeavor we wrote down prays and hate phrases lay interweaving with people face to face on the other hand the rest of this endeavour we utilite it from the boks, magazines and web sites. No matter where the place we live in is "Serhad" it doesn't mean that it was completed only here. Our endeavour was gathered and written down from the regions of Serhad, Amed, Hakkari, Botan, Behdinan, Soran, Şehrezor, Mahabad, Dersim, Kafkasya and Rojava. This study was assorted in respect of issues and regions, but not by alphabetical order. Nevertheless purview and comments were left for another study. Ultimately we present this study to all academical researchers work as linguists, litterateurs , poets and artists as a basic resource to who Works on Kurdish language , literature , culture , history and sociology.

**Key Words:**Pray, Hate (Curse), Folklor,Classical Kurdish Literatuare .

# NAVEROK

KURTE.....	IV
ÖZET .....	V
SUMMARY .....	VI
NAVEROK.....	VII
PÊŞGOTIN.....	IX
KURTEBÊJE.....	XI
<b>1. DESTPÊK .....</b>	<b>1</b>
1.1. Ferhengnasî û Peyvsaziya Di'a û Nifiran.....	1
<u>1.1.1. Ferhengnasiya Di'ayan .....</u>	<b>2</b>
<u>1.1.2. Ferhengnasiya Nifiran .....</u>	<b>4</b>
1.2. Dîroka Erdnîgariya Lêkolîn û Lêgerîna Di'a û Nifiran.....	5
<b>2. DI'A û NIFIRÊN HERÊMA SERHED, BOTAN, AMED û HEKARIYÊ .....</b>	<b>10</b>
<b>2.1. Di'a.....</b>	<b>10</b>
2.1.1. Bîr û Bawerî .....	10
2.1.2. Cil û Berg .....	17
2.1.3. Deng û Dengbêjî.....	19
2.1.4. Dilovanî û Mehder.....	20
2.1.5. Êş û Nexweşî .....	21
2.1.6. Fedakarî û Tefanî.....	22
2.1.7. Miraz û Bext .....	25
2.1.8. Mirî û Mirin .....	27
2.1.9. Rizq û Debar.....	31
2.1.10. Xwarin û Vexwarin .....	34
2.1.11. Zarok (Kur û Keç) .....	36
2.1.12. Zewac û Malbat .....	39
2.1.13. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan .....	43
<b>2.2. Nifir .....</b>	<b>45</b>
2.2.1. Ajal û Heywan.....	46
2.2.2. Bîr û Bawerî .....	48
2.2.3. Cil û Berg .....	56
2.2.4. Dar û Hêşînahî.....	57
2.2.5. Êş û Nexweşî .....	57
2.2.6. Miraz û Bext .....	74
2.2.7. Mirî û Mirin .....	78
2.2.8. Reng û Rengdêrî .....	90
2.2.9. Riziq û Debar.....	91
2.2.10. Wesle û Parçe .....	98
2.2.11. Xwarin û Vexwarin .....	99
2.2.12. Zarok (Kur û Keç) .....	101
2.2.13. Zewac û Malbat .....	105
2.2.14. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan .....	113
2.2.15. Beşek Kifriyên (Dijûn) Wek Nifiran.....	<b>126</b>
<b>3. DI'A û NIFIRÊN HERÊMA BEHDÎNAN, BABAN û SORAN.....</b>	<b>128</b>
<b>3.1. Di'a.....</b>	<b>128</b>
<u>3.1.1. Bîr û Bawerî (Îman).....</u>	<b>128</b>
3.1.2. Beheşt (Cennet) .....	129
3.1.3. Cerg û Mêlak .....	129

3.1.4. Çav û Çavpîsî (Çavzer).....	129
3.1.5. Dilovanî û Rehm.....	130
3.1.6. Dil û Hinav .....	131
3.1.7. Dinya û Cihan.....	131
3.1.8. Geşt û Rêwîfî .....	132
3.1.9. Gor û Qebir.....	132
3.1.10. Mal û Melal .....	133
3.1.11. Mirad û Bext.....	133
3.1.12. Mirî û Mirdin.....	134
3.1.13. Rizq û Debar.....	134
3.1.14. Zilm û Zalim.....	135
3.1.15. Xêr û Xêrat .....	136
3.1.16. Qeza û Bela.....	137
3.1.17. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Beşan .....	137
<b>3.2. Nifir .....</b>	<b>139</b>
3.2.1. Agir û Cehnem (Dojeh).....	139
3.2.2. Cerg û Mêlak (Dil û Hinav).....	140
3.2.3. Çav û Çavpîsî (Çavazer).....	141
3.2.4. Derd û Derman .....	141
3.2.5. Gor û Qebir.....	142
3.2.6. Serî (Qaf).....	142
3.2.7. Şeytan (Pelîd) .....	143
3.2.8. Mal û Malbat .....	143
3.2.9. Mirad û Bext.....	143
3.2.10. Mirî û Mirdin.....	144
3.2.11. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan .....	144
<b>4. DÎ'A û NIFIRÊN (DUAYIY û ZEWTIY) BI DIMILÎ .....</b>	<b>146</b>
<b>4.1. Di'a.....</b>	<b>146</b>
4.1.1. Bîr û Bawerî .....	146
4.1.2. Êş û Nexweşî .....	147
4.1.3. Miraz û Bext.....	147
4.1.4. Rizq û Debar.....	147
4.1.5. Zewac û Malbat .....	148
4.1.6. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan.....	148
<b>4.2. Nifir.....</b>	<b>149</b>
4.2.1. Bîr û Bawerî .....	149
4.2.2. Êş û Nexweşî .....	149
4.2.3. Miraz û Bext.....	151
4.2.4. Mirî û Mirin.....	151
4.2.5. Xwarin û Vexwarin .....	152
4.2.7. Zewac û Malbat .....	153
4.2.8. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan .....	154
<b>5. ENCAM.....</b>	<b>155</b>
<b>6. ÇAVKANÎ.....</b>	<b>161</b>
6.1. Çavkaniyên Nivîskî .....	161
6.2. Çavkaniyên Devkî (Rûbirû).....	163
6.3. Çavkaniyên Malperî .....	165
<b>7. XWE JÎNENÎGARÎ.....</b>	<b>167</b>



## PÊŞGOTIN

Di vê xebata ser edebiyata Kurdî ya gelêrî da li ser ferhengnasiya têgehên di'a û nifira hat rawestandî û di nav gel da çawa tê axavtin û belav bûna pênaseya wan di'a û nifiran hat dayîn. Têkiliya ferhenga di'a û nifiran, çavkaniyên di'a û nifiran, 'emilandina wan a rojane û li gor herêmên cuda cuda kîjan di'a û nifir hene têkilî bi Edebiyata Kurdî re hat diyarkirin. Keresteyên vê xebatê ji axivtina rojane ya axivkerên zimanê Kurdî bi diyalêkta Kurmanciya jorîn (Bakur), Kurmanciya naverast (Sorani) û Kirmanckî (Dimilî) ve hatin wergirtin.

Kesên li ser di'a û nifiran xebitîne hatin diyarkirin. Derbarê dabeşkirina di'a û nifiran de agahî hatin dayîn. Mînakên Herêmên curbicur hatin berawird kirin û nîqaş kirin. Pênaseyên di'a û nifiran ên heyî hat dayîn û li gor agahiyên deveran hat pênasekirin û binbeş kirin. Ciyê di'a û nifiran di nav hêmanên edebiyata Kurdî da hat nîqaşkirin û diyarkirin. Derbarê xebat û tomarkirin û dabeşkirina li ser di'a û nifiran ên li hinek deverên Kurdistanê da jî agahî hat dayîn.

Ev xebat ji destpêk û sê beşan pêk tê. Destpêkê da terma di'a û nifir warê ferhengê û erdnasiyê ve tê kîjan wateyê cureyên di'a û nifiran nav xelkê Kurda çawa tên bi karanin. Beşa yekemîn derbarê mînakên di'a û nifirên Kurdan yê herêmên bakur in. Beşa duyemîn di'a û nifirên deverên başurê Kurdistanê ne. Beşa sêyemîn jî taybetî (xasma) bi zaravayê dimilî ve di'a û nifirên Kurdan e. Dawiya her beşê da ew di'a û nifirên nakevin bin tu polan hat rêz kirinê digel encam û lîsta çavkaniyan hat amadekirinê.

Lê mixabin li gor agahiyên me yê îro em hêj rastî xebateka rêkûpêk û ji bilî kêmtir tu çavkaniyên niviskî nehatin. Di vê xebata pîraliya di nav gel da zêdetir jêderkên me yê devkî bûn. Dem dem rûbirû dem dem jî bi alîkariya çapemeniyê û medya ya civakî me agahî bi destxistin. Agahiyên herî zêde ji herêma Serhed, Botan, Amed, Hekarî, Behdînan, Soran û Baban da hat bi destxistin. Di nav wan herêman da jî deverên notula Wan, Muş, Bilîs, Agirî, Îdir, Erzirom, Sêrt, Hekarî, Semsûr, Bazîd û Qulp a navçeya giredayî bajara Îdirê hwd. digel kal, pîr, rûspî, axa, mezin, zana, rewşenbîr, helbestvan, seyda, şex, mela bi taybetî jî rasterast di nav gel xwe da bi alîkariya malbatên niştecih û 'eşîrên qedîmî ve me ev di'a û nifir zêdetir rûbirû tomarkirin.

Ji ber astengî û bêçaretiyê me hewl da ku ev çand û kelepora dewlemed a derheqê di'a û nifirên Kurda da bi alîkariya gel û mamosteyên xwe yê hêja ve em

xebateke akademîk û zanistî ji bo nîfşên me yê nê pêşerojê ra gencîneyeke berfireh amade bikin. Ev gencîne bira nav kitêbên arşiv û kitêbxaneya Kurdistanê da cihê xwe yê qedirbilind û giranbîha bigre.

Ji bo vê xebata dilnizim spasî û rêzên xwe pêşkeşî hemû arîkar û piştgirên xwe dikim. Bêguman amadekirina xebateka wiha hêsan nebû, lewra li ber destê me tu xebatên rêkûpêk bi pergaleka ya akademîk nivîskî qed tune bûn. Ji ber vê jî danîna çarçoveya vê xebatê û gihîştina encamên rast û durist gelek dijwar bû. Her wiha di amadekirina vê tezê da alîkirin û hêsanbûyên mamosteyên min ê hêja profesore alîkarvan Dr. Nesim Sönmez û arîkariya dost, heval û seydayên min ên hêja cihê rêzê ne. Ji ber vê yekê ez di serî da spasiya mamosteyê xwe yê rênîşander birêz Nesim SÖNMEZ û mamosteyên lîjnê profesore alîkarvan Dr. İbrahim SÜRÜCÜ û profesore alîkarvan Dr. Mahmud DÜNDAR'a jî dikim.

Ji ber dewlemendî kirina teza me, pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng û rexneyên xwe yê di cih da ez malavahî li 'eşîr û malbatên gelê xwe dikim. Eger pêşniyazên wan nebûna bi rastî jî ev xebata yê kêr bimaya û negihîştî armanca xwe ya asta bilid. Loma jî ez deyndarê vê dostaniya gelê xwe yê dilsozane me.

Herwiha ji bo ku di nava kar û barên xwe yê giran û gelek zêde da ji min ra wext veqetandin teza min xwendin, nirxandin û bi pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng yê devkî ve ev xebat dewlemend kirin. Ez spasiyeke pir ji dil û can pêşkêşî hevala Selva û hevalê Mihemed Baqî Ronî û dayîka wan a hêja Fayîme Xanimê û Seydayên rêzdar Mela Reşid Dundar, Arif Qereqaya, Musa Celalî û Salihê Dihê dikim.

Ji bo peydakirina hinek çavkaniyên zaravayên Kurmanciya navendê (Sorani) û wergerandina hinek peyv û hevokan ez spasiya dostê xwe yê hêja zimannas Mohammed Mêrgeyî Rewandizî dikim û bi minet keda wî bi bîr tînim û malavahî lê dikim.

Ji bo ku bi hebûn û perwerdekirina min, hebûna xwe va kêfxweşî û feyzê dide min, ez vê xebatê diyarî dayîka xwe ya temen dirêj wek xezîneya zimanê Kurdî xwerû axivker û zana Day Nîsbet Xanima keça Hesênê Osê ku dilgel Qehremanên rizgariyê mal û canê xwe dan ber top û guleyên mîletên dagirker, metînger, mirovaxwer, xwînmêj û derewîn û digel hemû alîkare min xwişk û birayên xwe yê ji dayîka min ra jî spasdarim.

Ahmet ÖNER  
WAN -2017

## **KURTEBÊJE**

- amd. : Amadekar  
B. : Beş  
Bnr. : Binêre  
ç. : Çap  
Çev. : Çeviren  
H. : Teqwîma Hîcrî  
H.b. : Heman berhem  
H.r. : Heman rûpel  
hwd. : Her wekî din  
Vb. : Her wekî din.  
H.X : Hejmara Xwemîrî  
j. : Jimar  
M. : Teqwîma Mîladî  
nd. : Nivîskarên din  
R. : Teqwîma Rûmî  
R: : Ragihandin  
r.a : Rehma Xwedê Lê be  
r. : Rûper an rûpel  
s.x.l : Silava Xwedê Lê be  
vgz. : veguhêzer  
Wer. : Werger  
Weş. : Weşanger/Weşanxan

# 1. DESTPÊK

Kevneşopiya gelan bi tevahî di nav edebiyata Gelêrî da cihekî taybet hildigire. Gel bi van xusûsiyetan tên naskirin û bi van taybetiyên xwe ve di nav alema şaristaniyê da ji xwe ra ciheke giring vediqetînin û di dîrokê da bingehêkî datînin.

Miletê Kurd jî mîna milletê din yê cihanî xwedî dîrokeka bingehiya wê kevnare ye. Ji ‘emrê şaristaniyê da demên kevin heta roja ku em tê da dijîn, em lê dinhêrin ku di dîrok, çand û kelepura Kurdan da, bala meriva tişteki dikşîne ku neteweya Kurd jî xwediyê bîr û baweriyeka xurt e. Di’ a û nifir jî wek neteweyên cuda di edebiyata Kurdî da cihêkî girîng digrê. Di’ a û nifir warê ferhengî û erdnîgariyê ve meriv dikarê bi vî şiklî bide naskirin.

## 1.1. Ferhengnasî û Peyvsaziya Di’ a û Nifiran

Di’ a û nifir jî di Edebiyata Kurdî da cureyeke hem gelêrî hem jî ya klasîk e. Bi rastî jî edebiyata Kurdî a klasîk jî di hêla di’ a û nifiran ve gelekî dewlemend e. Di’ a û nifir nav bîr û baweriyaya gel da dema despêka afirandina însan da heta îro rewşa xwe didomîne. Ev mijar pir dîrokî û kavmareye di nav wêjeyê da cihekî girîng girtiye. Ji ber vê yekê girîngiya di’ a û nifiran jî diyare ku şaristaniya mirovahiya hemû gelan da jî wek ya Kurdan roleka mezin cî daye di’ a û nifiran. Her wisa jî çand û edebiyata Kurdî ya gelêrî jî beşeka mezin cih<sup>1</sup> û war daye di’ a û nifiran.

Di navbera di’ a û nifirên gelan û çanda wan a pîralî de têkiliyên xurt hene. Em wan têkiliyan di navbera di’ a û nifirên Kurdan û çanda wan a dînî, civakî û aborî da jî dibînin.

Di ziman û çanda gel a rojane da girîngiya di’ a û nifiran bi giştî beşeka pir mezine û bi taybetî jî di nav edebiyat û zimanê Kurdî yê axaftinê da cih girtiye. Di nav civaka Kurdan jiyana aborî û çanda rojane da xelkê Kurd bi awayekî devkî hem nav axaftin, karûbar, goftûgo û danûstandinên xwe da hem jî jiyana xwe ya dînî da rojên mibarek wek qendîl, remezan, în, ‘eyd û ‘erefatan hwd. da di’ a û nifiran bikartînin. Bi layê alim û zanayên Kurdan ve şîret, nesîhet û xutbeyan da jî di’ a tê ‘emilandin. Digel vê hinek kes dema hevdiîtin, xatirxwestin û ibadet kirinê da jî di’ a û lavayî ya ji kesayetên cuda jî dixwazin.

---

<sup>1</sup> Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 1992, r. 328 ; D.izolfî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Dengê, Amed 2011, r. 103.

Wekî di'ayên Kurdî, nifirên Kurdî jî bi jiyana Kurdan a piralî ve rasterast girêdayî ye. Di vî warî da nifir û di'a du tiştên dijwate ne. Nifir ji ber astengî û xerabiyên jiyane nav miletê Kurdê bîrûbawer da mîna heqê xwe parastin tê axaftin. Lêbelê miletê Kurd vê yekê naxwazin û yan jî nifir kirinê na'ecibînin û heznakin.

Di'a û nifir jî du faktorên girîngin ji bo dewlemendî kirin û pêşve çûna her zimanekî cihan ê. Nifir nav miletê Kurd da tişteki wek maf girtin û ceza kirina kesên sûcdar tê 'emilandin. Lê belê nifir nav malbat û 'eşîrên Kurdan da xasma nav kesên bîr û bawer da zêdetir xweş nayêqebûl kirin. Nifir, kifrî, dijûn, derew, dizî, vir, îftira, xwînrijandin, xiybet, dek û dolab nav gel da mîna tişteki guneh, qirêj, nebaş, kirêt û bêum tê dîtin. Lê bêguman ev yek jî ketiye nav axaftina rojane û çanda milet a mirovatiyê. Kitêbên pîroz û piranî 'alimên oldar nifiran heznakin û na'emilînin ji ber vê yekê jî em dixwazin vê astê da behsa têgeha di'a û nifiran bi aliyê ferhengî û erdnîgariyê ve binasînin.

### 1.1.1. Ferhengnasiya Di'ayan

Li gor ferhengan meriv dikare bibêje "di'a" têgeheka dînî ye û peyveka 'Erebî ye. Pirjimariya vê peyve di zimanê 'Erebî da "Ed'iye" ye. Di kitêb û ferhengên Kurdî da wek van forman di'a, dia, dua, wird, lava, niyaz<sup>2</sup> û dirozge<sup>3</sup> tê 'emilandin. Me di vê xebata xwe da forma di'ayê tercîhkir.

**Wateya Ferhengî:** Wateya vê peyve gazîkirin, denglêkirin, lavayîkirin, banglêkirin, îbadetkirin, perestî, bergeran, hêvîkirin, niyaz, daxwazî û alîkarî xwestine.<sup>4</sup>

**Wateya Termî:** Ji ber mezinahî û rûmeta Xwedê bendeyê wî yê rêzdar ji bo pêdivî, daxwaz û bêçaretîyên xwe her dem têkiliyê ji Yezdan ra datînin û derd û mirazên xwe yê bêderman radigihîninê. Bi wateyeka din va di'a ji bo hezkirin, perestî û rûmet dayîna Xwedê ye.<sup>5</sup> Evd acizî û xizaniya xwe bi di'a kirinê dide nîşandin. Şêwazên di'akirinê li gor erdnîgarî, pirtûkên pîroz, pêxember, çand û zanînen dînî ji hev vediqetin.<sup>6</sup>

Bi laye di'a va evd hawara xwe digihîne Yezdanê xwedanê gerdûnê û sedarê roja dadkirinê. Wek dibêjin rêya rast nîşanî me bide û rêya yê Te xweş viyane.

<sup>2</sup> Farqînî, *b.n.b.*, r. 521 ; D.Îzolî, *b.n.b.*, r.165.

<sup>3</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *Zargotîna Kurda*, Berg II, Weşanên Aram, 2013 Amed, r. 382.

<sup>4</sup> Cubran Mes'ud, *el-Ra'id Mu'cemu'l Luğatîl Esrî*, Darûl 'Ilim, 1992 Beyrut, r. 359; Ahmed Nedîm Serînsu, *Ferhenga Termên Dînî*, Weşanên Wezaretê Perwerdehiyê, Enqere 2009, r. 61; Farqînî, *b.n.b.*, r. 521. D.Îzolî, *b.n.b.*, r.165.

<sup>5</sup> Cubran Mes'ud, *b.n.b.*, r. 359 ; Serînsu, *b.n.b.*, r. 62.

<sup>6</sup> Suleyman Akkuş, "Di Dîwanên klasîk û çanda Kurdan de Dua", Kovara Nûbiharê, Hejmar 132, r. 33.

## **Cureyên Di'aya**

Di nav gel da gelek awayiyan di'a tên kirin. Feqet li gor hinek nêrnan cureyê di'ayan meriv dikarê bi vî awayî rêz bikê.

**Di'ayên Bi Zimanê Îstidadî:** Wekî di'ayên hemû gîhayan û heywananê ku hemû bizimanê îstîdada xwe ji Feyyazê Mutlaq dixwazin û di'a dikin.

**Di'ayên Bi Zimanê Hevcehiyên Fitrî:** Wekî di'ayên hemû jiyandarên ku ji bo pêdivî û hewcehiyên xwe, yên ku xwe bi xwe nikarin bi dest bixin ra di'a tê kirinê ne. Ji bo berdewama heyata xwe ji Cewadê Mutleq ihtiyac û rizqê xwe dixwazin.

**Di'ayên Izdirarî:** Di'ayên ku bi zimanê bêçaretîyê va di'a kirine ku her jiyandarê ku di bêçaretîyê de ye, bi hêviyeka qet'î, di'a dike; bi alîkarekî meçhûl îltîca dike, heviya xwe dizivirîne bi aliyê Rebê Rehimê xwe. Ev cureyê di'a bi awayekê fitrî, sirûştî, xwezayî û bêçaretî yê va çêdibe.<sup>7</sup>

Ew her sê cureyên di'a tengasiyek nebe her tim qebûl dibin. Bersîva van di'ayan carna heman dem, carna dimîne roja dawî, carna jî bi xwestineka zêdetir bi sûd ve tê dayîn.

**Di'ayên Meşhur:** Ew meşhûrtirîne di'ayan dibe du cureyan.

**Di'ayên Fîlî û Halî:** Di'ayên ku gel jiyana rojane da navbera xwe da dema karûbar û danûstandinê da her tim bikartînin.

**Di'ayên Qelbî û Devkî:** Di'a kirina bi ziman û bi dil e. Xwestina tiştên ku bi dest va nayênin. Taybetiya girîng, armanca xweşik û fêkiya şêrina vê di'ayê ev e: Merivê ku di'a dike dizane ku: "Kesek heye ku dengê hatiratê dile wî dike; destê wî kesî dighê her derî; dikarê her daxwaza wî kesî bîne cih, bi acizîya wî merhemet bike û bi feqîriya wî meded bikê." Vî di'ayê ev kesên ku di'ayên ku gel nav xwe de bi nenivîskî di'êmilînin û gel devkî nav xwe de bikartînin.

Di wî curê di'a da xwestina tiştêkî madî zêdetir wesifdan, pesindan û spasiya Xwedê heye.

Lêbelê tê zanîn ku çarçoveya sînorê di'a jî gelekî berfirehe. Pêwiste ku li ser wan di'ayên cur bi cur xebatên cuda cuda bêne çekirin. Ango îro mijara xebata me di'ayên

---

<sup>7</sup> Bedîuzzaman Sêidê Kurdî, *Ji Kulliyata Rîsaleyên Nûr Peyva Bîst û Seyemîn* (Wer.: Sabah Kara), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 1992, r. 27-28.

devkî yên nav gel da bûne çand û adatên gel. Em dixwazin bin banê beş û binbeşan da ser di'ayên devkî û çandî bisekinin digel nifirên gel ve teza xwe bînin dawiyê.

### **Çavkaniyên Di'aya**

Çavkaniyên di'a yên serekeyî Qur'ana Pîroz, Sineta Pêxember (s.x.1), Di'ayên Ewliyyayan, Kitêbên Dînî û rasterast Şaristaniya Gelan, Edebiyata Gelêrî û Çanda Milet e.

Ev xebeta me ya nû xebateka cudaye, babeta me di'ayên rastêrast nav gel dane, devoka rojaneye, em dixwazin bêhtir li ser vê mijarê bisekinin. Heke ji bo girîngiya di'a çend ayet, hedîs û di'ayên olî bêne mînak dayîn ev jî dibe keyfeka li ser kêyfxweşî yê.

Di Qur'an-a pîroz da Xwedayê dilovan û dilvîn ferman dike: “Bibêje: Eger ne ji dua û îbadetê we be, Xwedayê min dê çi ji we bike? , “ Ji min re dua bikin ta ku ez cewaba we bidim” , “Em bes ji bo te îbadet dikin û her ji te tenê arîkariyê dixwazin” ev ayetên Qur'anê jî girîngî û çavkaniya di'a ya yekemîn datîne pêş çav.

### **1.1.2. Ferhengnasiya Nifiran**

Beriya her tiştî “ nifir” jî têgeheke wek beddi'a tê naskirin. Peyva “beddi'a”yê jî wek peyva di'ayê peyveke ‘Erebî ye. Peyva nifirê jî di nav Kurdan da li gorî devok û deveran tê guhertin. Wek nifir, nifrîn, nifîn , dijûn, nalet, û zewtiy<sup>8</sup> tê bikaranîn.

**Wateya Ferhengî:** Beddi'a kirin, le'net kirin, sozê kotî û peyva kiret e. Şanê nifir lanet, recm, recimandin, aforoz, nefret, sixêf, nixwûmandin, veşartin û qedexe kirine.<sup>9</sup> Yan jî; bela xwendin, lanetkirin, înkâr kirin û nefrtekirina a hebûna hemû tiştê hatine afirandinê û bawerî neanîna hebûnê ye.<sup>10</sup>

**Wateya Termî:** Hebûn û Yekîtiya Xwedê qaîl nebûn, yan jî Xwedê û hemû afirandinên wî qebûl nekirin û betal kirinê. Nifir peyveka kufreyê însan dike heywanekî cinawir.<sup>11</sup> Nifir însan ji ber bêheqiyê û zilmê ji bo parastin û destxistina mafên xwe, heman dem daxwazên nebaş û kotî ji bo dadmendiya radigihînê afiranderê Gerdunê. Yan jî ji bo mafên xwe peyvên kotî û kiret di'emilîne.

Di'a û nifir du peyvên dijiwatê ne; yek erêniye ya di jî neyêniye. Di'a her dem dilhazî û behnfirêhî tê kirin. Nifir dema zilm û zordestiyê da ji bo cih anîna ‘edaletê tê kirin. Afirandina însan heta îro nav gelan da di her mijarê da cure cure nifir tên bikaranîn.

<sup>8</sup> Mahmud Lewendî, *Hêvi Kovara Çandîya Giştî*, Hejmar 3, Paris - France 1985, r.80-86.

<sup>9</sup> Zana Farqînî, *b.n.b.*, r.1301 ; D.Îzolî, *b.n.b.*, r.165.

<sup>10</sup> Serînsu, *b.n.b.*, r. 211.

<sup>11</sup> Bedîuzzeman Sêidê Kurdî, *b.n.b.*, r.22.

Nifir û di'ayên ku em ê nav teza xwe da cih bidinê nifir û di'ayên nav jiyana gelan a rojane da tên 'emilandin û axaftin.

## 1.2. Dîroka Erdnîgariya Lêkolîn û Lêgerîna Di'a û Nifiran

Dema ku me hewl da em vê lêkolînê bixebitin ji ber derfet û kêmasiyên çavkaniyan destpêkê da biryar hat dayîn ku em vê xebatê bakurê welêt li herêma Serhedê bixebitin.

Lê roj bi roj çarçoveya xebatê berfireh bû. Bi rêya medya civakî û taybetiya bajarê Wanê vê lêkolînê per û baskên xwe fireh kir. Ew tabetiyên bajarê Wanê wek zêde bûna 'âlim, zimanzan, penaberên rojava, 'eşirên rûnişte, malbatên qedîm ku deverên cuda cuda koçber hatinê navenda bajar û zimanzanê başurê welat yên Zaningeha Wanê da doktora û lisansa bilind diqedînin ra hevdîtin û goftûgo hat çêkirin. Ji bilî wan derfetan bi layê nivîskar ve piraniya deverên ku Kurd lê dijîn lêgerîn û lêkolîn beriya xebatê hatibû çêkirin.

Dîrokê da sînoren ku Kurd lê dijîn li gor gelek lêkolîner, geroknas û dîroknasan va diyare. Ji ber piraniya çavkaniyên dîrokî em dixwazin welatên ku hezaran sale Kurd lê jiyana xwe domandine kifşbikin û binivîsin. "Jixwe erdnîgariya ku Kurd têda dijîn, ku wekî Kurdistan tê binavkirin, beşek ji vê erdê, 'erdê Mezopotamyayê ye a din jî derdorê çiyayê Zagrosê û Arran ê. Ev deveran jî bêhtir bi ol, şaristanî, felsefe, çand û hunerê tê naskirin. Li ser rûyê erdê gelek tişt yekemîn car li Mezopotamya hatinê îcadkirin."<sup>12</sup>

Gelek pêxember li vî erdî hatine şandin û gorên gelek pêxemberan hê jî li van axan e û wekî cihê duakirin û perestîşê tên bikaranîn. Ev baweriya xurt di çand, folklor û wêjeya Kurdî de bûye sedema dewlemendiyeke mezin ku gelek mînakên di'ayan derdixe pêşberî me."<sup>13</sup>

Wek tê zanîn di dîn de tiştê herî girîng dua û perestîna e. Heta li gor zanyarên dînî em dikarin bibêjin ku dua bi xwe bendetî ye. Di Qur'ana pîroz de derbarê vê mijarê de ayeteke wiha heye: " Bêje, heger ku duaya we tunebûya, wê perwerdegarê min çima girîngî bidaya we."<sup>14</sup>

Çavkaniyên dirokî da ev sînor yalê Rojava da li çiyayê Zagrosê destpê dîke heta çiyayên Torosê yên behraspî, yan jî kendava Farisan (Xelîca Besrayê) heta navenda

<sup>12</sup> Kemal Burkay, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Dengê, Diyarbakır 2008, r.31-42.

<sup>13</sup> Akkuş, *b.n.b.*, r., 32 ; M.Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê* (Wer.: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol 2002, r. 27; Şerefxan Bitlîsî, *Şerefname*, ( Wer.: M.Emîn Bozarslan), Weşanên Dengê, Amed 2006, r. 94-118.

<sup>14</sup> Akkuş, *b.n.b.*, r. 33.



Anatolya yê, yalê bakûr va ji li ciyayên Qefkasyayê destpê dike heta deşta ‘Ereban yan jî rojavayê Azerbeycanê, Qeredaxê heta nêzikî herêma Bexda û Babîla kevnare dirêj dibe, bi layê nexşeyên dîrokzan û erdzanan va tê xetkirin. Navenda xwe da gelek bajar û herêmên kevnarê yên îro nav sînorê dewletên cuda cuda da dihewîne.<sup>15</sup>

Li vê derê jî em dixwazin hinek deverên lêkolîn û lêgerina xebatê lê hat çekirin û hinek bajarên deveran yên navdar balê bînin ser û rêz bikin. Navê van bajaran iro wiha tê bi lêvkirin.

**Devera Serhedê:** Îdir, Qers, Agirî, Bazîd, Erzirom, Erzîngan, Erdêxan, Wan, Mûş, Bedlîs, Tetwan, Xelat, Elcewaz, Xîzan, Norşîn, Ercas û Panos.

**Devera Hekariyê:** Colêmerg, Şemzînan, Gever, Elbak, Nehrî û Çelê.

**Devera Botan:** Şirnex, Cizîra Botan, Mêrdîn, Nisêbîn, Qoser, Erux, Miks, Sêrt, Êlîh, Dihê, Şêrwan û Heskêf.

**Devera Amedê:** Amed, Silîva, Riha, Heran, Wêranşar, Semsûr, Gahta, Dîlok, Sêwrek, Pîran, Xetay û Îskender.

**Devera Behdînan:** Duhok, Zaxo, Mûsil, Laliş, Şingal, Amîdiyê, Akra, Şûş, Barzan, Berwarî û Birîfkan.

**Devera Soran û Şehrezûrê:** Hewlêr, Kirkûk, Silêmanî, Xaneqîn, Herîr, Rewandiz, Koyê, Soran, Kelha Dizê, Ranya, Helebce, Xurmatû, Mendelî, Mexmûr.

**Devera Rojavayê Bakur:** Dêrsîm, Mereş (Gurgum), Sêwaz, Meletî, Xarpêt, Çêwîlg, Çapakçûr (Genç), Qonya û Enqere.<sup>16</sup>

**Rojava (Bin Xet):** Qamişlo, Heskê, Efrîn, Kobanê, Serê Kaniyê, Tirbe Sipiyê, Dêrik, Amûdê, Mînbij, ‘Ezaz, Jerablus, Girê Spî, Bab û Heleb.

**Welat û Deverên Din:** Înşalah pêşerojê da jî em dixwazin li ser vê bingehiyê da deverên cuda cuda mîna:

**Devera Mukiryan ( Erdelan):** Erdelan, Dalman, Tagsu, Şemiran, Hawer, Rawdan, Suleman, Anber, Mehran, Tenûre û Levî.<sup>17</sup>

<sup>15</sup> Evliya Çelebî, *Evliya Çelebî Seyahatnamesi*, İstanbul 1997, r. 154; Şemsettin Samî, *Kamus’ul A’lâm*, Matba’aya Mihranê, Stenbol 1889-1898, r. 3841; Sezen Bilir-Alişan Akpınar, “Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu” *Kovara Dîroka Kurdî*, hejmar 3, r. 21-22; Kaşgarlı Mahmut, *Divan-ü Lugat-ü Türk*, Stenbol 2001, r. 253. ( Bnr.: *Kovara Dîroka Kurdî*, Hejmar 3, r. 37) ; M.Emîn Zekî Beg, *b.n.b.*, r. 27 ; Şerefxan Bitlîsî, *b.n.b.*, r. 94-118.

<sup>16</sup> İbrahim Sediyanî, *Adını Arayan Coğrafya*, Özedönüş Yayınları, İstanbul 2015, r.181-189.

**Rojhilat:** Hewraman, Dinewer, Loristan, Mehabad, Sine, Îlam, Kirmanşan, Urmiye, Hemedan, Xuremabad, Şarîkurd, Dêzful, Kazrun, Miyanduaw, Kamyaran, Mako, Banê, Serdeşt, Gûrgan, Kurdkoy û Xoresan.

**Arran (Kurdistana Sor an Qeredax):** Lâçin, Qubadlî, Zengilan, Kelbajar, Qerekişleq, Qotirlê, Kurdhacê, Muradxanê.<sup>18</sup>

**Qefqasya:** Ermenîstan, Gûrcîstan, Azarbaycan, Nexşewan, Tirkmenîstan, Elegez hwd.

**Kurdên Diyasporayê:** Ewropa, Emerîka, Îskandînav (Swêd, Denmark, Norveç) Ozbekîstan û Qezaxîstan<sup>19</sup> hwd. ra ji têkiliyê daynin û vê çanda gelêrî bi aliyê ziman û edebî va dewlemend bikin û bighînin asta çavkaniyên resen û akademîk.

Ji bilî vê li gor dîn, felsefe, terîqet, mezheb û nêrînên çandî nav milletê Kurd da rewşa xwe îro jî kêmtir didomînin wek Şîe', Yersan, Ehlê Heq, 'Elewî, Êzîdiyayetî yê çand û edebiyata wan da di'a û nifir çawa tên 'emilandin em vê xebatê bi wan va jî dewlemend û xurt bikin.

Despêka misilmanbûna Kurda û têkilîyên wan bi Îslamê va qedîmîyê; yanî serdema Qasidê Xweda Pêxemberê Xweşewîst Mihemed (sxl.) da, despêka nazil buna Quranê şinva milletê Kurd peşîyê tekûtek, malbat malbat û bi laye şandên bazirganiyê wek malbata Gavan (Caban el-Kurdî), Deylêm el-Kurdî<sup>20</sup>, Meymun el-Kurdî (Ebu Buseyir), yên diyarin ku bûne Eshabiyên Qasidê Xweda.<sup>21</sup> Lêbelê em dikarin li vira bibêjin ku Kurd jî miletekî kevnare û binecihên rojhilata naverastin jiber vê yekê li gor milletên din zêdetir nêzîkî cihê belavbûna ola îslam û Qur'an a pîrozin. Dibeko rojekî rûpelên dîrokê yên rasteqîn vebin emê bibinin ku yên îro tên gotin feqed hêj ne bi îspate ji bilî wan belkî dehan û hezaran kes û malbat yên bêne diyarkirin. Gotine bibe zanîst a akademîk.

Serdema Cenabê Omer (r.a) salên 638-640 miladî da ji sînore mislimanan deysta 'Ereba gîhiştiye Çiyayên Qefqasya yê. Xelkê Mezopotamya yê û xelkê ku navbera Çiyayê Zagros û Torosan da dijîn gelemperî baweriya xwe Xwedê û roja axiretê anîne. Kurd jî

---

<sup>17</sup> Sheerin Ardalan, *Erdalan Kürtleri*, Avesta Yayınları, İstanbul 2011, r.30.

<sup>18</sup> Sheerin Ardalan, *b.n.b.*, r.22.

<sup>19</sup> Şerefxan Bitlîsî, *Şerefname*, (Wer.: M.Emîn Bozarslan), Weşanên Dengê, Amed 2006, r. 16-17 ; M.Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdîstanê* (Wer.: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol 2002, r. 27.

<sup>20</sup> Bi alîkariya Caban el-Kurdî bûye misliman, mihafizîya Qesra Îranê rêza yekem da kirîyê. Di herba qadîsyeyê da liba mislimana cih girtîyê pêşberî dewleta Sasanîyan şer kirîyê. (Bnr.: Ahmed Mirza Mirza, *b.n.b.*, r.63.)

<sup>21</sup> Ahmed Mirza Mirza, *Îslam Tarihinde Kürtler*, İslamın Kürdistan'da Yayılması, Nida Yayıncılık, İstanbul 2015, r.63; İbrahim Sediyanî, *b.n.b.*, r.181-189; Mela Mahmut Ma'sum Botî (Dîlberîn), *Cerxa Cihanê Tarîxa Kurd û Kurdîstan*, Stenbol 2011, r. 22-24.

miletê bawermend e, di dîrokê da biştî miletê ‘Ereb rêza duduyan da bûne misliman û yekîtiya Xwedê û hebûna roja axîretê qebûl kirine. Destpêka belavbûna dînê Îslamê ya parzemînan şûn va bi alîkariya kitêbên pîroz, şevên qendîla, rojên bimbarek wek rojên îne, hec, eyd -‘erefat û qendîlan da ew di’ayên hatin bikaranîn ketin hindûrê devoka gel û belav bûn nav çand û edebiyata xelkê Kurd jî.

Bandora dînê îslamê û jêderkên dînî û medresan digel alîm, şêx, seyda, mela û ewliya yên ku hezaran di nav miletê Kurd da derketine meriw dikarê li gor devok û herêma rêz bikê. Diyalektên zimanê Kurdî; Lorî, Goranî, Kurmancî, Kirmackî li gor zimanzanan tînen qebûl kirine. Ev diyalekt jî nav navêndên edebiyat û medreseyan wek Hemedan, Dînewer, Merîwan, Dewdan, Kirmanşah, Sinê, Caf (Helebce), Bedlîs, Cizîr, Hekkarî, Miks, Sêrt, Hîzan, Bazîd, Amed (Diyarbekir), Lîcê, Xelat, Amêdiyê, Lalêş, Şêxan, Erîz, Girgaş, Mehabad, Silêmaniye, Qeredax, Koye, Birîfkan, Kerkûk, Sêwreg, Hezan<sup>22</sup> hwd. da ziman, zanîst pêşva cûye û zêdetir berhem hatine nivîsandin.

Baba Tahîrê Hemedanî, Fatîma Lorê, Rihan Xanima Loristanî, Abdîselamê Babek, Şêx Fexîrê Adîyan, Şêx Nuredînê Birîfkanî, Eliyê Hêrîrî, Melayê Cizîrî, Mela Remezanê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Eliyê Teremaxî, Weda’î, Axayokê Bêdarî, Mela Yûnisê Helqetînî, Melayê Bateyî, Pertew Begê Hekkarî, Feqê Reşîdê Hekkarî, Ehmedê Xanî, Îsmâîlê Bazîdî, Muradxanê Bazîdî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Şukriyê Bedlîsî, Xaris Bedlîsî (Sewadî), Emîr Yaqubê Zîrkî, Mewlewî, Nalî, Salim, Kurdo, Hacî Qadirê Koyî, Mestûre Mahşeref Xanima Erdelanî, Liza Hanîma Caf, Mela Yehyayê Mizûrî, Seyfiyê Şoşî, Mela Ehmedê Xasî, Osman Efendiyo Babîj, Mela Mansurê Girgaşî, Şêx Şemsedînê Xelatî, Şêx Evdîrehmanê Axtepi û Malbata Axtepiyan,<sup>23</sup> Mevlana Xalîdê Şehrezorî, Siyahpûş (Mihemed Cevad), Pîremêrd, Wefayî, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Evdilê Goran, Hejar, Şêx Rîza Telebanî,<sup>24</sup> Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî, Şêx Elaeddînê Xeznewî, Xelîfê Ûsîvê Celalî, Seyîd ‘Eliyê Finîkî, Şêx Tahîrê Şoşî, Şêx Seydayê Cizîrî, Mela Xelîlê Sêrtî,<sup>25</sup> Zimanzan Eli Seydoyê Ûrdûnî,<sup>26</sup> Hezretê Norşînî, Mela Mihemed Qutbê Erwasî,<sup>27</sup> Cefer Quliyê Zengîlanî, Şêx Esa’dê Erbîlî, Evdilqedîrê Geylanî, Bedûzeman Seîdê Kurdî, Şêx Seîdê

<sup>22</sup> Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2013, r.114-119.

<sup>23</sup> Adak, *b.n.b.*, r.118-119.

<sup>24</sup> Prof. Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîsê, Stenbol 209, r.5-6.

<sup>25</sup> Necatê Zivingî, *Stêrkên Edebiyata Kurdî*, Weşanên Banga Heqê, Stenbol 2014, r.264-363.

<sup>26</sup> Muhammed Alî es-Siwêrekî el-Kurdî, *Ûrdûn Kûrtleri* (Çev.: Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2006, r.187-188.

<sup>27</sup> Mela Mihemed Qutbê Erwasî, *Tîba Melayê Erwasî* (Wer.: Kadri Yıldırım), Weşanên Enstîtuya Zimanên Zîndî ya Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê, Stenbol 2013, r.11-12.

Paloyî, Mela Mihemedê Celalî, Şex Evdirehmanê Taxî, Hemze Begê Miksî, Xelîl Xeyaliyê Motkî, Seîd Remazanê Botî, hwd. hezaran zêdetir aliman ev edebiyata Kurdan ya gelêrî da di'a û nifir bi gotin, helbest, dîwan, mewlûd û berhemên xwe ve pêşve birçûne. Ji ber vê jî di'a û nifirên gelêrî notila axaftina jiyana rojanê di nav milletê Kurd da cih û warê xwe girtiye.

Dema ku em çavkaniyan û gotinên gel dinêhêrin. Dîyar dibe ku şaristanî û bingehiya gelek îcadan li ser axa Kurdan derketine û belav bûne seranserê cîhanê. Vê yekê jî ziman, çand û wêjeyê kevnare çêkiriye.

Ji ber vê dewlemendiya alîm, nivîskar, şaîr û erdnîgariya berfireh a wînda bûyî me destpêkir ku nav zengîn bûna ziman û edebiyatê da bi çanda îroyîn û qedîmî va dia û nifiran li gor hêza xwe tomarkin û binivîsin,

## 2. DÎ'A û NIFIRÊN HERÊMA SERHED, BOTAN, AMED û HEKARIYÊ

### 2.1. Dî'a

Di'a ew hêvî, rica, xwezî û xwestekên mirovan yên ku ji Xwedê ji bo xwe an ji bo keseke din tên kirin û xwestin in. Di ziman û jînegariya Kurdî da gelek di'ayên xweş û bala hene. Her çiqas tu di zanîngehê beşa wek mamostetiya ziman û edebiyata Kurdî û herwekî din da bixwînê jî tu dikarî van di'ayan gelek caran ji pîr, kal, rîspî û mezinan bibihîzî.

Lê mixabin nifşên nû zêdetir nifiran dikin û peyvên nebaş dibêjin. Lê mezinên me her tim di'ayan dikin. Di'ayên ku me ji wan bihîstin wek hingiv, şîr û şekir e ji bo çand û wêjeya Kurdî.

Di navbera di'ayên gelan û çanda wan a pîralî de têkiliyên xurt hene. Em wan têkiliyan di navbera di'ayên Kurdan û çanda wan a dînî, civakî û aborî da jî dibînin. Li vir em dixwazin li ser çend mijaran bisekinin.

Di bin vê beşê de binbeşên “*Bîr û Bawerî*”, “*Cil û Berg*”, “*Êş û Nexweşî*”, “*Dilovanî û Mehder*”, “*Fedakarî û Tefanî*”, “*Xwarin û Vexwarin*”, “*Mirî û Mirin*”, “*Deng û Dengbêjî*”, “*Rizq û Debar*”, “*Miraz û Bext*” “*Zewac û Malbat*”, “*Zarok (Kur û Keç)*”, û “*Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan*” hat diyar kirin. Ev binbeş di nav edebiyat û çanda gelê Kurd da bi kurtasî wiha cih digrin.

#### 2.1.1. Bîr û Bawerî

Cefayê te kifaretê axîretê be.

Xwedê çend sala ‘emrê te kurtke bide ser aqilê te.

Xwedê devê ziyana we bigire.

Xwedê dîn û dinya te berk ( zexm) bike.

Xwedê şuxulên we lê bîne.

Xwedê te bela û şetelan biparêze.

Xwedê tifaqa we bela neke.

Ya Rebî tu bi merhemet û mezinahiya xwe bikî.

Ya Rebî tu heqê bindestan li zorderstan bistînî.

Ya Rebî tu rehm û kerema xwe bike.

Ya Rebî tu vê xwînê rawestîni.<sup>28</sup>

\*\*\*

Ey Xwedayê şev û rojan tu me biparêzi.

Hoce Xizir piştewani te be.

Xwedê derdê we nişani min nede.

Xwedê mirina min pêşiya we bide.

Xwedê tev îşê we be.

Xwedê ya te lê bîne.

Xwedê yar be bila hemû dinya neyar be.<sup>29</sup>

\*\*\*

Ceddê bavê Gula Şêx bê alî te.

Destê ewliyayan li piştê te be.

Destê Şêx Gulê li ser te be.

Destê Xizir li ser te be.

Duayê tizbiyê li pey te be.

Duayên Xewzê Hîzan li pey te bîn.

Lawo hemû derî li ber te vebin.

Mîr Hesenê Welî te bibexşîne.

Nifirên min li te ra bibin dua.

Ocaxa bavê Şêx Sano bê hawara te.

Oxira te ya xêrê be.

Yêk, du, sê gazî Gorandeyştê dikim tu tengasiyê nebîni.

---

<sup>28</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Devera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>29</sup> Zimanzan Hakan Çiftçi, *Devera Serhedê*, Gîhadîn-Agirî 1977. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

Qeza û bela dûrî te bin.  
Şahê Naxşebend te bibihîze.  
Şêx Evdilqadirê Gêylanî te biparêze.  
Şêx Seydayê ber derê beytê hevalê te be.  
Şîre min li te helal be.  
Şiva Xizir Eleyhîselam li ser serê tebe.  
Tengasiyên te bibin fîreqetî.  
Tu cînarê Mûsa Pêxember bî.  
Tu cinnete bibînî.  
Tu di vê dine da tu axîniyê nekişînî.  
Tu heyrê nemînî.  
Tu jarî û jûriye nebînî.  
Tu nekî Xwedê bide te.  
Weysel Qeranî deste xwe bigîhîne te.  
Xizir bê hewara te.  
Xwedê rozgareke<sup>30</sup> baş bide te.  
Xwedê te dinyê rê da nehêle.  
Xwedê teala te ji nîfaq û teşqeleyan biparêze.  
Xwedê tu derd û dermanî neke para te.  
Ziyareta Zêvê li rûyê te bikene.<sup>31</sup>

\*\*\*

Kevir li bin lingên te wek penîr nerm bibe.  
Oxira te ya xêrê be.  
Perê Xwedê li ser te be.

---

<sup>30</sup> Rozgar: Bext, miraz, qeder, enînivîs, çarenivîs.

<sup>31</sup> Mem Artemêt, *Kovara Folklorê Kurdan*, h.6, Amed 2016, r.77.

Pêxember û ewliya bibin rêberên te.

Rêya te vekirî be.

Wey tu nekî Xwedê bide te Seydayê min.

Xwedê alikariya te bike.

Xwedê îmana te kamil bike.

Xwedê karê te li hev bîne.

Xwedê te rûspiyan û salihan binîvîse.

Xwedê tirên te bike fis da ku deng nede, fisên te bike tir da ku bîn nede.

Xwedê ya rebî me mecbûrî nebaş neke.

Xwedê, kesî neke tora bêbavan.<sup>32</sup>

\*\*\*

Agire tifika we bila ti cara netefe.

Bi xêr here, bi xweşî vegere.

Bi xêr û silamet bigê ciye xwe.

Bi xêr û xweşî be.

Bi xêr û xweşî bighê ciye xwe.

Çavê kesî Xwedê li riya dûr nehêle.

Deste Xocê Xizir li pişta te be.

Deste Xwedê li pişta te be.

Elî û ez du'açiyê te, Xwedê du'açiyê te.

Emanetê Xwedê be.

Îmana te kamil be.

Îşela<sup>33</sup> kitaba te li destê rast be.

Îşela tu herî ku derê riya te vebe.

---

<sup>32</sup> Day Nîşbet Öner û Malbata We, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945, Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>33</sup> Îşela: Xwedê hezke ango meşele, maşelah, maşalêh, îşeleh, inşallah, maşare, bişalê û ma şalê.



Îşela tu yê her dem xêra qezenc kî.

Îşela tu yê îmana xwe xelas kî.

Îşela tu yê qet gunehan nekî.

Mihemed rêbêre (hevale) te be.

Oxir<sup>34</sup> be ji te ra, Elî û Mihemed rêberê te be.

Oxira xêrê be.

Oxira te a xêrê be, Elî û Mihemed deste xwe li pişta te xe.

Resûlê Ekrem li pişta te be.

Riya te vekirî be.

Şêx Evdilqadirê Gêylanî li pişta te be.

Şêx Evdilqadirê Gêylanî were hewara te.

Tu arê cehnimê nebînî.

Tu cîranê Hz. Isa bî.

Tu nekî, Xwedê bide te.

Tu pir eydiya (îdan, cejnan) bibînî.

Xocê Xizir alî (alîkariya) te bike.

Xocê Xizir bi te ra be.

Xocê Xizir rêberê te be.

Xwedê alîkarê<sup>35</sup> te be.

Xwedê bi îşê te ra be.

Xwedê bi te ra be.

Xwedê bide îman û Qur'anê.

Xwedê bide îmanê.

Xwedê bide rehmê.

---

<sup>34</sup> Oxir: Sefer, birêketin, çûn, dûrketin û koç.

<sup>35</sup> Alîkarî: Piştgirî, komekî, yarmatî, harîkarî, piştewanî, alî û alîgirî.

Xwedê çavê kesî li reya dûr nehêle.  
Xwedê çavê kesî li riya nehêle.  
Xwedê di dilê te da çi hebe bîne cî.  
Xwedê hesretê ji dilê te derxe.  
Xwedê hewe li ometa Mihemed nacih<sup>36</sup> neke.  
Xwedê îmana kamil, emelê salih bide te.  
Xwedê îmana te kamil bike.  
Xwedê îsleh bike.  
Xwedê nimêya (nimêja) te qebûl bike.  
Xwedê rojiya te qebûl bike.  
Xwedê rûreş neke.  
Xwedê rûyê te reş neke.  
Xwedê te fedîkar<sup>37</sup> dernexe.  
Xwedê te hezar salî bike.  
Xwedê te ji bela û qeza mehfeze bike.  
Xwedê te ji bîra xwe nebe.  
Xwedê te ji dehf û bela dûr bixe.  
Xwedê te ji îmanê û Qur'anê mehrûm neke.  
Xwedê te ji qeza û bela sitar bike.  
Xwedê te ji riya heq dernexe.  
Xwedê te ji salihan binivîsîne.  
Xwedê te ji ser serê me kême neke.  
Xwedê te ji vî halî bifilitîne.  
Xwedê te kamil bike.

---

<sup>36</sup> Nacih: Serketin, miwafeqiyet, fezîlet û pîrozî.

<sup>37</sup> Fedîkar: Şermok, şermoke, şermkirin, mehçup bûn.

Xwedê te kêmi hevala neke.

Xwedê te mehfeze bike.

Xwedê te motacî kesî neke.

Xwedê te motacî tu benî adema neke.

Xwedê te salih bike.

Xwedê te sitar<sup>38</sup> bike.

Xwedê te sitar û mehfeze bike.

Xwedê tifaqa we xira neke.

Xwedê tu bela neyne pêşiya te û hevalê te.

Xwedê û pêxember bi te ra be.

Xwedê û pêxember ji te razî be.

Xwedê we li dîn û dinyayê kêfxweş bike.<sup>39</sup>

\*\*\*

Belkî filankes ber mîre xwe diaçiyê te be.

Belkî nifirê min tera bivin dia.

Belkî ocaxa min diaçiyê emrê te be.

Bira çil mêrê Şîxadî dergê xêra te veke.

Bira dergê şexs-ziyareta te vekirî be, tu cara nekevî bin dergê teng.

Bira destê te herd diniya neve, hin ji diniya ron, hin ji diniya terî.

Bira dua her heft siyarê mala Adiya te be.

Bira dua mala Şêxûbekir te be.

Bira dua mala Şîxisin te be.

Bira dua Qurs Xelîl te be.

Bira dua ziyareta Gulheyranê te be.

Bira dua ziyareta Xirdinebî te be.

Bira Xwedê te baltê dijmina xayî ke.

Bira Xwedê yar be, evd neyar be.

---

<sup>38</sup> Sitar: Hevz, parastin, hifzkirin û sitirandin.

<sup>39</sup> Mustafa Gazî, *Nifir û Duayên Kurdî*, Zîncîreya Pirtûkên Enstîtûya Kelepora Kurdî 33. Çapxaneya Wezareta Perwerdeyê, Çapa Yekem, Hewlêr 2006, r. 91-101.

Cidê te te razî be.  
Çara Pîra Fat bê hewara te.  
Çiça ziyaretê miqerim hene tev hewara te bîn.  
Dua mala Adiya te be.  
Dua ziyareta miqerim te be.  
Mertala (qelkan) Şems ser milê te be.  
Nanê bavê teyî dayî hewara te bê.  
Ocaxa Cin Teyar hewara ocaxa te bê.  
Ocaxa min hewara te bê.  
Ocaxa min piştovanê te be.  
Şems (Xwedê)<sup>40</sup> komeka te ra be.  
Şems hewara te bê.  
Şems piştovanê te be.  
Şêxşima cidê tera be.  
Şîrê diya teyî dayî hewara te bê.  
Xaliqê dinê-alemê bê hewara te.  
Xatûna Ferxan ber te rûnî.  
Xwedê hewara heftê du mileta bê, paşê hewara me.  
Xwedê oxir, namûsê bide te.  
Xwedê te ji korpiya mixeneta xayî ke.  
Xwedê te ji nezera neşûştiya xayî ke.  
Xwedê te pîr bike, bîr neke.  
Xwedê te rastî hevalê dilsax bîne.  
Xwedê te ya xirav xayî ke.  
Xwedê yaziya te rast ke.  
Lawo înselâh Şems piştevaniya te be, tu têk neçî.  
Ya Şems, tu hewara heftê du mileta bêyî, paşê hewara mala min, zarê min bêyî.<sup>41</sup>

### 2.1.2. Cil û Berg

Bi xêr be.  
Bi xêr û xweşî biqetînî.

<sup>40</sup> Şems (Xwedê): Li gor baweriya Ezîdiyan kesê layike perestine.

<sup>41</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *Zargotîna Kurda*, Berg II, Weşanên Aram, 2013 Amed, r. 382-387.

Xêrê jê bibîne.  
Bi xêr biqetîne.<sup>42</sup>

\*\*\*

Bê bela û şetele be.  
Bê qeza û bela be.  
Bi firehî biqetîne.  
Bi rojên xêr da bîqetînî.  
Bimbarek be.  
Cefa kufarê<sup>43</sup> be.  
Ev nû be sedê din kevin bin.  
Hezaran bidirîne.  
Kefaretê gunahan be.  
Kurê min bi kêfxweşî kevin ke.  
Kurê min bi xweşî bidirînî.  
Nav hezar ‘eydan bibe.  
Pê hezar ‘eydan bibînî.  
Pir cila biqetînî.  
Pîroz be.  
Xêrê jê bibîne. Xwedê mirazê te pê<sup>44</sup> bike.<sup>45</sup>

\*\*\*

Jiyaneke xweş tê de biborîne.  
Li ser xêrê bidirînî.  
Pîrozî bit hezaran bidirînî.

---

<sup>42</sup> [Http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041](http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041). Ragihandin: 14 Îlon 2016.

<sup>43</sup> Kufar:Kufaret,kefaret.

<sup>44</sup> Ji bo cil û bergên bûk û zava.

<sup>45</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata We, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1963. Ragihandin:15 Sibat 2016.

Rojeke rind pê derbaske.

Xwedê mirazê te hasil biket.<sup>46</sup>

\*\*\*

Bimbarekî te be.

Tu pir cila biqetînî, ‘emrê te dirêj be.

Xêr û xweşî biqetîne.<sup>47</sup>

\*\*\*

Bi xêr û xweşî li xwe ke.<sup>48</sup>

Bi xêr û xweşî biqetîne.<sup>49</sup>

\*\*\*

Bira bive mû<sup>50</sup> neqete.

Bira Xwedê nexaşê balnîsa bike dezî, neqetîne.<sup>51</sup>

### 2.1.3. Deng û Dengbêjî

Can can.

Deng li dinê be.

Deng xweş.

Saet xweş.

Xweda kêmaniya<sup>52</sup> dengê te nede.<sup>53</sup>

\*\*\*

Belê Seyda saet xweş.

Dem baş.

Dem xweş.

<sup>46</sup> Hecî Hesên Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>47</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Devera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>48</sup> Ji wan kesan re tê gotin ku kinç û çilên nû kirine.

<sup>49</sup> Gazi, *b.n.b.*, r.81-101.

<sup>50</sup> Mû: Rî, simêl, porr, pûrt, pirç, rîs û rêv.

<sup>51</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>52</sup> Kêmanî: Kemasî, netemamî, qisûr û nekamilî.

<sup>53</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.311.

Dengê te her hebe.

Dengê we sax be.

Her bijî her bêjî.

Saeta te xweş.

Tu her hebî.

Xwedê dengê te pir zîzke.<sup>54</sup>

\*\*\*

Dev xweş bî.

Dilxweş bî.

Kêfxweş bî.

Saeta te xweş bit.

Xwedê dengê te her tim zelal bike.

Xweş bîn bî.<sup>55</sup>

\*\*\*

Bira tu xaş bî, gula govenda bî.

Bira tu xaş bî, gula siyara bî.

Sehet bî, qewat bî.

Tu biji dinyalikê eşq û dil, bêderd, bêkul.<sup>56</sup>

#### 2.1.4. Dilovanî û Mehder

Çengê<sup>57</sup> Pêxemberan li ser te be.

Tu bikevî ber sîngê pêxemberan.

Xwedê bi rehma xwe, alîkarê me be.

Ya Rebî tu bi rehma xwe me werî rehmê.

Ya Rebî tu merhemeta xwe ser me da bibarînî.

<sup>54</sup> Zimanzan Hakan Çiftçi, *Devera Serhedê*, Gîhadîn –Agirî 1977. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>55</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>56</sup> Ordixan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>57</sup> Çengê: Basik, mil, dest, kulm, lep û mist.

Ya Rebî tu merhemetê têxî dilê vî zalimî.

Ya Rebî tu rehma xwe bibarînî ser vê xwînê.<sup>58</sup>

\*\*\*

Hey Xweda tu me û wan rasterê bikî.

Tu babeta mehdara pêxemberê Xweda bî.

Xwedê merhemetê têxe dil û mêjiyê wî decalî

Ya Rebî tu avekê ser vî agirî da hirsînî.

Ya Xweda tu dilovaniya xwe bi me bibî.

Zalimo Xwedê li te were rehmê.

Zalimo Xwedê te rasterê bike.<sup>59</sup>

\*\*\*

Tu têkevî ber şef'eta pêxember.

Ya Rebî tu vê xwînê rawestî.

Zalimo Înşalah Rebil 'alemîn piştê bişkênit.<sup>60</sup>

### 2.1.5. Êş û Nexweşî

Canê te sax bibe.

Nexweşiya te here çêla<sup>61</sup> zer.

Ser û çavên we neêşin.

Xwedê êş û kederan nîşanî te neke.

Xwedê tu nexweşiyên nede canê we.<sup>62</sup>

\*\*\*

Nexweşiya te av bibet.

Nexweşiya te bit dar û beran.

<sup>58</sup> Mela Reşîd Dündar, *Devera Serhedê*, Gimgim-Mûş 1945. Ragihandin: 10 Çile 2016.

<sup>59</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>60</sup> İdrîs Bateyî, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirnex 1978. Ragihandin: 30 Cotmeh 2015.

<sup>61</sup> Çêl: Çêlek, mange û mêşîn.

<sup>62</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016.



Nexweşiya te here gayê sor.

Xwedê te hemû bela û şetelan biparêze.

Ya Rebî kâfir jî vî derdî nebînin. <sup>63</sup>

\*\*\*

Kifaretî gunehan be, tu jê pa (xelas) bî.

Xwedê cankî sax bide te.

Xwedê şifa xêrê bide.

Xwedê şifa xêrê bişîne.

Xwedê şifayê bide. <sup>64</sup>

\*\*\*

Bira tu usa bijî xelq havjiya xwe te bîne.

Dinyalikê eşq bî, dil bî, derbaz kî.

Gul bî, geş bî, neçilmisî.

Lingê te kevira nekeve.

Tu tu cara nekevî bin te'lı-tengiya, hema bin fireyada bî, qencyêda bî.

Tu tu derdê giran nebini.

Xwedê 'emrê dirêj bide te.

Xwedê 'emre te dirêj ke.

Xwedê tu kederê te nexe. <sup>65</sup>

#### **2.1.6. Fedakarî û Tefanî**

Derdê te bikeve canê min.

Bila ez gorî bim.

Ez bi gorî. <sup>66</sup>

Ez bi qurban.

Ez bi qurbana te bim.

---

<sup>63</sup> İdrîs Bateyî, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirnex 1975. Ragihandin: 11 Sibat 2016.

<sup>64</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

<sup>65</sup> Ordixan û Celilê Celil, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>66</sup> Ji bo biçûkan.

Ez goriya te bim.  
Ez li dora serê te bigerim.  
'Emrê min di ber 'emrê te bigere.  
Taya te be, mirina min be.<sup>67</sup>

\*\*\*

Can fida.  
Can goriyê<sup>68</sup> min.  
Ez benî.<sup>69</sup>  
Ez bi fedayê te bim.  
Ez bi heyran.  
Ez cangoriyê zimanê xwe bim.  
Ez derdê we nebînim.  
Ez gorî<sup>70</sup> te bim.  
Ez mirina we nebînim.  
Ez qurbana çavê te bim.  
Ez qurbana rihê te bim.  
Ez xidam.<sup>71</sup>  
Ez xizmet karê te bim.  
Ez xulam te kerem kiriye.  
Ez xulam.  
Gorî gorî ez goriya te me.  
Mirina te bê dayka te.  
Te ocaxa min vemirand.

---

<sup>67</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.311.

<sup>68</sup> Rojava ji bo şehîdan dibêjin. Canfida, xwebêxş, pêkrewan.

<sup>69</sup> Ji bo mezinan.

<sup>70</sup> Ezgorî : Ezqurban, ezheyran, ezxulam û ezbenî. Rêzdar, hêja.

<sup>71</sup> Jin ji bo mêtê xwe dibêje.

Te ocaxa min xerab kir

Tu emanetî Xwedê bî.<sup>72</sup>

\*\*\*

Bila pêş wî tu bimrayî.

Çi heyf ji wî ra xwezî bila ez bûma.

Emrê te dirêj be.

Ez bimrim ji bo te

Ez ji wî ra kor bim.

Mirina te bê min.

Mirina te bê ser min.

Nexweşî ya te, mirin ya min be.

Te mala min xirab kir, mal mîrat.

Te ocaxa min deverû xist.

Xwedê 'emrê me bide te.<sup>73</sup>

\*\*\*

Ez bedela wî mirî bama.

Te kuçikê min reş kir.

Te mala min sot.

Tu koriya çavên min bit.<sup>74</sup>

\*\*\*

'Emrê min ber 'emrê te keve.

Nexweşiya wî çîka malê şîrîn be.

Te mala min wêran kir.

---

<sup>72</sup> Brahîm û Newroz Kurdî, *Devera Rojavayê*, Kamîşlo 1976-1978. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>73</sup> Day Nîşbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2016 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>74</sup> Hecî Hesen Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

Te ocaxa min kor kir.

Xwedê hevza te şepûk û şetelan bike.

Xwedê rihê min ber rihê te bigrîne.

Xwedê rûkî rûspî me bibe hizûra xwe.<sup>75</sup>

\*\*\*

Ronaya çevê minî.

Serê min ber serê te keve.

Xwedê min qurbana te ke.<sup>76</sup>

### 2.1.7. Miraz û Bext

Kevirê li ber lingê te bibe penêr.

Rebbî mirazkê te bike.

Tu delavê<sup>77</sup> teng da nemînî.

Xwedê bextekî spî bide te.

Xwedê cansaxiyê bide te.

Xwedê mexseda te bibe serî.<sup>78</sup>

\*\*\*

Miradê te pê bê.

Tu bibe hakim û sewcî lav.

Tu her tim şad û bextewar bî.

Tu her tim serfiraz û jîr bî.

Xwedê miradê te bike.<sup>79</sup>

\*\*\*

Ax çavên min birijin bêmiraz.

Çavên min birijin, bêbext.

<sup>75</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>76</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>77</sup> Çiyê ku çem tê re nizm diherike.

<sup>78</sup> Artemêt, *b.n.b.*, r.77.

<sup>79</sup> [Http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041](http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041) Ragihandin: 14 Îlon 2016.

Tu bi mirazê xwe şa bî.

Xwedê bextê te spî ke.

Xwedê hevza te nezera çavan bike.

Xwedê miraz bexşê, mirazê te xêr ke.<sup>80</sup>

\*\*\*

Xwedê miradê te bike.

Xwedê miradê we bi hev bike, tev kal û pîr bike.

Xwedê miradê we bi hev bike.

Xwedê nefsa tengayiyê bike fireyî.

Xwedê taliya mera (merivan) xirab ney ne.

Xwedê te bi miradê te şa bike.

Xwedê te bi motacî evda neke.

Xwedê tevî îşe te be.<sup>81</sup>

\*\*\*

Atara<sup>82</sup> min serê te be.

Bira dara miraza mirazê te bike.

Mirazê min def-dewatê te bive.

Mirazê min şaya te bive.

Mirazê te malê be.

Oxira te oxira xêrê be.

Riya te rast be.

Şek te nekeve.

Tiştêkî xirab xwe ra nebînî.

Xwedê riya te rast ke.<sup>83</sup>

---

<sup>80</sup> Mamoste Zimannas Hakan Çiftçi, *Devera Serhedê*, Agirî 1978. Ragihandin: 19 Sibat 2016 ; Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Devera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>81</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

<sup>82</sup> Atar: Dek û fen li yekî kirin.

<sup>83</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

### 2.1.8. Mirî û Mirin

Cihê wî cenet be.

Gora wî fireh be.

Gora wî tijî nûr be.

Rehmeta Xwedê lê be.

Xweda wî ji ‘ezabê qebrê mihafeze bike.

Xwedê bi rehma xwe şa ke.

Xwedê bigihîne rihê miriyan.

Xwedê miriyê we bibexşîne.

Xwedê rehma xwe lêke.

Xwedê wî bixe cenneta xwe.<sup>84</sup>

\*\*\*

Axa wî gelek bit.

Gora miriyên te cenet bit.

Min wî bexşand.

Serê we sax bit.

Xêra miriyên te bit.

Xwedê ‘emrê te dirêj ket.

Xwedê gerdena min wî aza bike.<sup>85</sup>

\*\*\*

Heqê xwe lê helal bikin.

Qebra wî fireh be.

Qebra wî pir nûr be.

Rehmel<sup>86</sup> dê û bavên te be.

---

<sup>84</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r. 311.

<sup>85</sup> Edebiyatnas Necmî Akin Xanî, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1972. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

Serê me / we xweş be.

Xerîkê rehmetê<sup>87</sup> be. / Biherike rehmetê.

Xwedê cihê çûyî nede şermê.

Xwedê ji guvaştina qebrê xelas ke.

Xwedê ji we ra bike zexîra<sup>88</sup> axiretê.

Xwedê sekerata wî sivik bike.

Xwedê wî ji ‘ezaba qebrê biparêze.

Xwedê wî tengasiyên qebrê firêqet bike.<sup>89</sup>

\*\*\*

Cihê xewa te tê, bira mirina min were.

Xwedê bi îmanê bibe hizûra xwe.

Xwedê bi rehma xwe wî ya şad bike.

Xwedê sekerata mirinê ser wî sivik bike.

Xwedê wî bibexşînê.

Xwedê wî bixefirîne.<sup>90</sup>

\*\*\*

Min gerdana wî/te aza kir.

Rebil ‘âlemîn qebrê te ron bike.

Xwedê def’a qeza û bela ser bike.

Xwedê deftera ‘emelê te destê rastê bide û pişt ve nede te.

Xwedê gerdana<sup>91</sup> wî aza bike.<sup>92</sup>

\*\*\*

---

<sup>86</sup> Rehme: Dilovanî, dilnerm, rehm û rehma Xwedê.

<sup>87</sup> Dema mirinê

<sup>88</sup> Ji bo zarokên mirî.

<sup>89</sup> Day Nîsbet û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2016 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd- Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>90</sup> Mela Ferîd Bazîdî, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1958. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>91</sup> Jin bo mêrê xwe dibêje.

<sup>92</sup> Hecî Hesên Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

El hikmû lillah.

Ruhê wî şad û bextewar be.

Xwedê ji te razî be, rahme li miriyê we be.

Xwedê li wî biborê.

Xwedê wî ji îzgorê<sup>93</sup> biparêze.<sup>94</sup>

\*\*\*

Cihê wî bo saxan bit.

Cihê wî nîveka behîşt bit.

Serê we gelek sax bit.

Warê wî bihuşt bit.<sup>95</sup>

\*\*\*

Bav û birê te sax be.

Cînarê Pêxember bî.

Dê û bavê te pey Pêxember nimêj ke.

Ez ser milê we herim gorê.

Peyrêwê Pêxember bî.

Xwedê mirina we ravayê(nîşanî) min nede.

Xwedê te bixefirîne.

Xwedê xuliya wî zêde bike.<sup>96</sup>

\*\*\*

Bira serê we sax be.

Ciyê (ware) wî cînet be.

Ciyê te cînet be.

---

<sup>93</sup> Îzgor : 'Ezabê qebrê.

<sup>94</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>95</sup> Îdrîs Bateyî, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şîrnex 1978. Ragihandin: 30 Cotmeh 2015.

<sup>96</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.



Rehma Xwedê lê be.

Rehma Xwedê li miriyê te be.

Rehme li dê û bavê te be.

Rehme li gora bavê te be.

Rehme li miriyê te be.

Xwedê bide ber destê miriyên te.<sup>97</sup>

Xwedê bigîne ber destê miriye te.<sup>98</sup>

Xwedê bihêle malxweyê malê.

Xwedê emirkî direj bide te.

Xwedê emrê dayik û bavê te zêde ke.

Xwedê emrê direj û canê sax bide te.

Xwedê emrê te bike kal.

Xwedê emrê te direj bike.

Xwedê emrê te hezar salî bike.

Xwedê emrê te zêde bike.

Xwedê ji her qapiya (deriyan) qapîkî (deriyekî) lê veke.<sup>99</sup>

Xwedê rehma xwe pê şa bike.

Xwedê rehme lê bike.

Xwedê riya doxrî bide te.

Xwedê sebre bide.

Xwedê xelas ke.<sup>100</sup>

Xwedê xêra te qasî çiya mezin ke.

Xwedê xêra te qebûl bike.<sup>101</sup>

---

<sup>97</sup> Parsek gava sedeqeya xwe digire weha dibeje.

<sup>98</sup> Xwedê xêra te bigihîne ci an qebûl bike.

<sup>99</sup> Ji bo wan nexweşên ku li ber mirinê ne te gotin, yanî yan bimire ji vî ezebê xelas bibe yan jî sax bibe.

<sup>100</sup> Di şîne de ji bo mirî te gotin.

<sup>101</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

\*\*\*

‘Emrê te ‘emrê sîmir be.  
Bira hestiyê te nava cinetêda be, xalî ser te sivik be.  
Hestiyê te nava cinetêda be.  
Pê bî, gorê bî, gor ber te fîre be.  
Silametî, xêr-xaşî filankes ji kelê derê bê mala xwe.  
Tu sax herî, silametî ,bêyî.  
Xêr herî silamet vejerî.  
Xêr û silamet destê xwe derê xwe xî.<sup>102</sup>

### 2.1.9. Rizq û Debar

Destê te vekirî zikê te têr be.  
Kûpên zêran li ber te bin.  
Mala te ava ocaxa te şên be.  
Nanê rehet bixwî.  
Nanê te çandî be kevçiyê te tê de be.  
Tu ji nan û dew nekevî.  
Xwedê destê te ve bîne.  
Xwedê karê te li hev bîne.<sup>103</sup>

\*\*\*

Mala we ava kurê we zava be.  
Me kêmkir Xwedê zêde bike.  
Xwedê bereketê nav malê te xe.  
Xwedê bereketê têxe rizqê we.  
Xwedê dayîm zêde bike.  
Xwedê mala we bîr û kanî bike.  
Xwedê nesîbekî xêr bîne ser te.

---

<sup>102</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>103</sup> Artemêt, *k.n.b.*, r.77.

Xwedê pariyekî rizqê helal bide me.

Xwedê rizqê we zêde bike.

Xwedê rizqekî helal, jineke delal, maleke fireh nasîbê te bike.<sup>104</sup>

\*\*\*

Tu tu car nanê xwe ji jariyê neşkênî.

Xwedê jinek baş nesîb ket.<sup>105</sup>

\*\*\*

Bereket be ji we ra.

Bereketa Îbrahîm Xelîlula têkeve perê te.

Bi xêr û xweşî be, Xwedê ji qimil sitar ke, Xwedê ji tofana sitar (parastin, hevz) ke, Xwedê bi rizqe we ke, bi xêr û xweşî bixwin.<sup>106</sup>

Îşela tu herî ku rizqê te yî çêbe.

Qismetê (şans) te zêde be.

Torinê<sup>107</sup> torinê te kêmaniyê nebîne.

Tu cara (qet) kêmaniyê nebînî.

Tu dest bavê ji axê da, destê te da bi zêr be.

Tu destê xwe bavê axê, ax di destê te da bi zêr be.

Tu destê xwe bavê çî bira bi zêr be.

Tu destê xwe bavêjî ji axê da, ax di destê te da bibe zêr.

Tu herî kîjan derî, derî ji te ra vekirî be.

Tu herî, tu sirf li xizna (xezîneyan) rast werî.

Tu motacî tu evda nebî.

Tu qe nekî, Xwedê bi te de.

---

<sup>104</sup> Day Nisbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Zimanzan Hakan Çiftçi, *Devera Serhedê*, Gîhadîn-Agirî 1978. Ragihandin: 9 Sibat 2016.

<sup>105</sup> Edebiyatnas Necmî Akin Xanî, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1972. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>106</sup> Ji wan kesan re tê gotin ku zeviya xwe diçînin.

<sup>107</sup> Torin: Nevî, dûnde, zuriyet, paşhatî.

Tu qet tengayiyê nebînî.  
Tu tunebûnê nebînî.  
Tu wer (her dem) di zêdayiyê da bî.  
Xwedê bereketa Îbrahîm Xelîlula têxêyê.  
Xwedê bereketa xwe jê dernexe.  
Xwedê bereketa xwe têxêyê.  
Xwedê cinetê bike nexsîbê te/we, wan, ...  
Xwedê îşê te rast bike.  
Xwedê îşê te rast bîne.  
Xwedê îşkî xweş di te derxe.  
Xwedê neqenciyê neke nesîbê we.  
Xwedê nisîbê te fire bike.  
Xwedê qîsmetek helal û zelal bide te.  
Xwedê riya te rast bive (bibe).  
Xwedê riya te veke.  
Xwedê rizqe helal bide te.  
Xwedê yeka te bi hezarî ke.  
Xwedê yeka te bike dido.  
Ya rebî tu rihmek bi xêr bide; heywane te birçî ye, tenê nayê.<sup>108</sup>  
Yeka te bi hezar be.<sup>109</sup>

\*\*\*

Bira risqê te zêde be.  
Derge fire be, miqîm dergê fireyê te vebe.  
Dua Xwedê risqê te be.  
Kevir ber piyê te bive penîr, penîr jî bive hevîr.

---

<sup>108</sup> Dema di'aya barane te kirin ev di'a tê gotin.

<sup>109</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

Kodka te tijî dew be.  
Risqê te ji ezmana bê, ser teda birije.  
Textê te bira vekirî be, textê eşqê be, yê şayê be.  
Tu bin dereceda nemînî.  
Tu kuda herî dergê xêra ber te vekirî be.  
Tu nan bî, dew bî, zere (masîzer) te nekeve.  
Tu zere te nekeve.  
Xaliqê dine-alemê risqê te bighîne.  
Xwedê ber destê te kê m neke.  
Xwedê bike hema miqîm bêyî ser bêderê.  
Xwedê dergê teng nede te.  
Xwedê risqê te batinda bighîne.  
Xwedê te bêguman neke Xwedê gumana meriyê bêguman nebire.<sup>110</sup>

#### **2.1.10. Xwarin û Vexwarin**

Bi goşt û xwîn be.  
Derek te pê neêşe.  
Li te bigivire.  
Me kê m kir, Xweda zêde bike.  
Noşîcan be. , ‘Afiyet be.  
Sifra we daîmî be.  
Xwedê zêde bike.<sup>111</sup>

\*\*\*

Afiyeta canê te bî.  
Ew xarin û vexwarin t’amê bihuştê bin.  
Helalî canê te bî.  
Înşallah tu pê ser wê xwarinê negirî.  
Li te noşî can be.

---

<sup>110</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>111</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.311.

Rebî we bixêle quwet.<sup>112</sup>

Te helal bî.

Tu quwet pê bigirî.

Xwedê ‘ef û aza biket.

Xwedê carek dî nesîb bike.

Xwedê nesîbê we pê bigîne.

Xwedê şûna wê tijî biket.

Xwedê zêde ket.<sup>113</sup>

\*\*\*

Bereketa Xelîl Îbrahîm be.

Hey Xwedê me kêmkir tu zêde bikî.

Mala we ava be.

Mala we şên be.

Şîfa be.

Te xweş û helal be.

Xwarina we goşt û birinc be.

Xwedê bereketê têxe mala we.

Xwedê rizqê we zêde bike.

Xwedê we ra têxe quwet.<sup>114</sup>

\*\*\*

Înşalah nanê te pehtî be, ber serê te be.

Kevir ber piyê te bibe penîr.

Li te şîr û şekir be.

---

<sup>112</sup> Quwet (Qewet): Hêz,şiyar,taqet,jêhatin û xurtî.

<sup>113</sup> Mihmed û Zerîfe Bateyî, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirnex 1973-1979. Ragihandin: 30 Cotmeh 2015 ; Hecî Hesen Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemanêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>114</sup> Mela Reşîd Dündar, *Devera Serhedê*, Gimgim-Mûşê 1945. Ragihandin:10 Çile 2016.

Mala we xana Xwedê be.  
Me kê m kir, Xwedê zêde bike.  
Mîna şîrê diya te helal be.  
Sifra we her dem tijî be, li erdê be.  
Xwedê dew sê tijî bike.<sup>115</sup>

\*\*\*

Destê te (we) sax be.<sup>116</sup>  
Xwedê şûna wê tije bike.  
Xwedê zêde bike.  
Zikê hewe (we) neêşî.<sup>117</sup>  
Xwedê zewalê nede kebanîya malê.<sup>118</sup>

\*\*\*

‘Efiyeta we be.  
Me kê m kiriye, Xwedê zêde ke.<sup>119</sup>

### 2.1.11. Zarok (Kur û Keç)

Xweda zarokên te ji te re bihêle.  
Xwedê bav û birayên te bihêle.  
Xwedê kurekî bide te.  
Xwedê te bike bavê heft lawan.<sup>120</sup>

\*\*\*

Xwedê bihêle.  
Xwedê kurê te bihêle.  
Xwedê te bistrîne.

<sup>115</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>116</sup> Piştî xwarinê ji kesên ku xwarin çêkirinê re tê gotin.

<sup>117</sup> Dema mevan ji ser xwarine radibe dibeje, "Xwedê zêde bike." mazûban jî weha lê vedigerîne.

<sup>118</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

<sup>119</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>120</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.311.

Xwedê te salih binivîse law.<sup>121</sup>

\*\*\*

Bûkê piyê te xêr be.

Xwedê ji mala te zarokan kêr neke.

Xwedê zarkekê salih bide te.

Xwedê zarok û kiçkên me çavan biparêze.

Yarim tu piran biqetînê.<sup>122</sup>

\*\*\*

Lawo, Xwedê tev şuxulê te be.

Nav dinê be.

Serê we ser balgiyê we be.

Têr kur û têr qîz bî.

Xwedê çavên te zarokan şil neke.

Xwedê ji te re kurê te xayîke.

Xwedê keç û kuran bide we.

Xwedê te ji dayîka te re xayîke.

Tu cêwî bizêyî.<sup>123</sup>

\*\*\*

Têr ‘emr bit.

Têr ‘emr dirêj bit.

Xwedê ji bo te pêlid.

Xwedê piçûkêd te bihêlid.

Xwedê we re têke zewadeyê axîretê.

Xwedê wî zarokê biket çuçika beheştê da bo te bînit roja mehşerê ava kewser ê.

---

<sup>121</sup> [Http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041](http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041). Ragihandin: 14 Îlon 2016.

<sup>122</sup> Brahîm û Newroz Kurdî, *Devera Rojavayê*, Kamîşlo 1976-1978. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>123</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Devera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.



Xwîşka bira bit.<sup>124</sup>

\*\*\*

Bi dê û bav mezin be.

Bi navê xwe mezin be.

Bûka we bi zêdayî be.<sup>125</sup>

Şîrê min li ber te mûm û fener be bişewite.

Şîrê min li te helal be, li ber te çira be.

Tu bavê heft lawa bî.

Xwedê bedena we şên bike.<sup>126</sup>

Xwedê ewledê te bihêle.

Xwedê kurkî bide te.

Xwedê te kal û pîr ke ji dê û bavê te ra.

Xwedê warê te hêşîn ke.<sup>127</sup>

Xwedê zaroya te sitar ke, Xwedê miradê we pê bike.

Xwedê zaroyê te ji te ra bihêle.

Zêdaya we bi xêr be.<sup>128</sup>

Zaroya we bi xêr û xweşî be, bi dê û bav be.<sup>129</sup>

\*\*\*

Bira Xatûna Ferxan şekê bedena te nexe.

Şems bedena te şîn ke, Xwedê kurkekê bide te.

Xwedê bedena te şîn ke.

Xwedê mirazê me şaya kur-qîzê te bike.<sup>130</sup>

---

<sup>124</sup> Hecî Hesên Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016 ; Edebiyatnas Necmî Akin Xanî, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1972. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>125</sup> Zêdahî: Ji ber peyva zarok ve hatiye bikaranîn.

<sup>126</sup> Ji mala bêzarok re te gotin.

<sup>127</sup> Yanî Xwedê te bikê xwedî zarok.

<sup>128</sup> Ji mala ku bûye xwedî zarok re te gotin.

<sup>129</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

<sup>130</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

## 2.1.12. Zewac û Malbat

Bûka we bi pê û par be.  
Daweta we li ser xêrê be.  
Hûn li ser balgiyekî pîr û kal bin.  
Mal ji te hezar malî.  
Mala te ava, tijî bûk û zava.  
Malî ava./ Mal ava./ Mala te ava.  
Xwedê we bi hev şa ke.<sup>131</sup>

\*\*\*

Bînahiya min ez heyrana çavê reşbelek bim.  
Evîna te bejn zirav be.  
Evîna te bi dilê te be.  
Li hevdûra kal û pîr bibin.  
Xwedê deriyekî xêrê li wî veke.  
Xwedê keçikek çarde salî bike nesîbê te.<sup>132</sup>

\*\*\*

Mala te ava be, kurê te zava be.  
Mala te ava, kurê te zava.  
Mala te ava, Xwedê te bike zava.  
Xwedê wî û hevala wî bi hev şa bike  
Xwedê xûya te û mêrê te li hev şîrîn bike.  
Xwedê yeke xweşik bike nesîbê te.<sup>133</sup>

\*\*\*

Bûka we pê û par, şivanê we dar û gopal be.

<sup>131</sup> Yildirim, *b.n.b.*, r. 310.

<sup>132</sup> Civaknas Fatma Öner, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1972. Ragihandin: 21 Tîrmeh 2016.

<sup>133</sup> [Http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041](http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041). Ragihandin: 14 Îlon 2016.

Mala te bibe sed malan.

Mala we wek kaniyan biherike.

Xwedê Îman û Qur'anê nesîbê we bike.

Xwedê mirazê we bi hev bike.

Xwedê poşmaniyê nede.

Xwedê yeke/a salih nesîbê te bike.<sup>134</sup>

\*\*\*

Hûn tengasiyê nebînin.

Mala we xana Xwedê be.

Pê û par te xêr be.

Xwedê bedena te ter bike.

Xwedê bejna te ter<sup>135</sup> bike.

Xwedê canê te hêşîn bike.

Xwedê te serfiraz bike.

Xwedê xêrlî bike.

Xwedî keyfxweşî bin.<sup>136</sup>

\*\*\*

Ji Xwedê ve paristî bî.

Jin û mêr tevr û bêr bin.

Xwedê digel te be.

Xwedê mehçûb neke.

Xwedê sona me xêr bike.

Xwedê we ber hev pîr û kal bike.

---

<sup>134</sup> Day Nisbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd- Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>135</sup> Ji bo zarok bûnê.

<sup>136</sup> Mela Reşid Dündar, *Devera Serhedê*, Gimgin-Mûşê 1945. Ragihandin:10 Çile 2016.

Xwedê we herdu dinya rezîl û ruswa neke.

Xwedê we hev re pîr û kal bike.

Xwedê yarê te be.

Xwedê zava û bûka we pîr û kal bike.<sup>137</sup>

\*\*\*

Bûk û zavayên we pîroz û mibarek bit.

Hûn têr 'emr bin.

Pê û parê yêd te xêr be.

Pêkve pîr bibin.

Tu û mêrê xwe pêkve bin.

Xwedê qîzeke baş têxe rizqê te.

Xwedê ser balgehekî pîr ket.<sup>138</sup>

\*\*\*

Aqûbet (axde) li sere we be.

Bûka we bi xêr û xweşî be, bi nan û dew be, bi qîz û law be.

Jina te (bi) dilê te be.

Jina te (bi) kêfa te be.

Xwedê dayik û bav ji ser serê we kêr neke.

Xwedê destê te û dergîstiya<sup>139</sup> te ji hev neke.<sup>140</sup>

Xwedê keçikek spehî nasîbî te bike.

Xwedê malxwiyê we bihêle, ji qeza û bela dûr bike.

Xwedê miradê te bi yeka Estelî<sup>141</sup> bike.

Xwedê tev kal û pîr bike.

---

<sup>137</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016.

<sup>138</sup> Hecî Hesen Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibata 2016.

<sup>139</sup> Dergîstî: Evîndar, yar, hezkirî, xoşewîst, xweşdivî, berdilî û dilber.

<sup>140</sup> Ji deve koçerên bajar a Sert ê.

<sup>141</sup> Mîdiyata navçeya Mêrdînê da taxek.

Xwedê tiala yeka bi dilê te bike kevçiyê (para) te.

Xwedê tiala yeka bi dilê te bike nisîbê te.

Xwedê yekî bi dilê te bide te.

Xwedê yekî bi dilê te bike qîsmet.

Xwedê yekî şîr-helal bike nesîbê te.<sup>142</sup>

\*\*\*

Bi dilkî şa, bi çavkî zuha.<sup>143</sup>

Bi xêr û xweşî tê da rûnin.

Mala Bokarkî<sup>144</sup> li pişta te be.

Mala te ava be.

Mala te hezar carî ava be.

Mala te nemîne bê semyan.<sup>145</sup>

Malê te wer (her dem) bereket tê da be.

Warê te şên be.

Xaniyê we bi xêr û xweşî be, bi xêr û xweşî tê da rûnin, zaroyê xwe tê da sinet bikin û bizevicînin.

Xwedê ava bike.

Xwedê hîn ji viya çêtir nisîbê we bike.<sup>146</sup>

Xwedê ji dê û bavê te razî be.

Xwedê ocaxê te şên bîke.

Xwedê oxir û feleka te li hev bîne.<sup>147</sup>

\*\*\*

Belkî mala te xana xwedê be.

---

<sup>142</sup> Gazî, b.n.b., r. 81-101.

<sup>143</sup> Ji bo xaniyê ku nû hatiye çêkirin tê gotin.

<sup>144</sup> Bokar navê şêxekî ye.

<sup>145</sup> Semyan (Saman, sermîyan, seman): Milk, mal, kapîtal, tişt, eşya.

<sup>146</sup> Ji bo xaniyê ku nû hatiye kirin te gotin.

<sup>147</sup> Gazî, b.n.b., r. 81-101.

Bira tu ber mala xwe qedîm bî.  
Kîjan xêre bira Xwedê miyaser ke.  
Maleke teye, bira heft mal lê çê bin.  
Ocaxa te (qapiyê) te şên be.  
Qapiyê te qapiyê Xwedê be, şên be.  
Qapiyê te şên be, ava be, têr be, tijî be, zere lê nekeve.<sup>148</sup>

### 5.1.13. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan

Xwedê îşê te li hev bîne.  
Te li çî netê (niyetê) daye Xwedê qebûl bike.<sup>149</sup>  
Tu bi xêr û xweşî herî bine danka zavê.  
Tu rûreş nebî.  
Xêra Xwedê li te be.  
Xwedê ciyê te bike cinet.  
Xwedê dereca te zêde bike.  
Xwedê derecak (dereceyek) mezin bide te.  
Xwedê kesî neke tora neşuştiya.  
Xwedê te bisitirîne.<sup>150</sup>

\*\*\*

Xwedê birayê te bihêle.  
Xwedê ji te razî be.  
Xwedê kesî nexê tengasiye.  
Xwedê te bihêle.<sup>151</sup>

\*\*\*

Cefaya dîtiye kifareta gunahan be.  
Hûn xêr û xweşî herin û werin.

<sup>148</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 382-387.

<sup>149</sup> Ji bo tiştên wekî qurban û mewlûde tê gotin.

<sup>150</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 81-101.

<sup>151</sup> [Http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041](http://tirsik.net/index.php?mijarid=1041). Ragihandin: 14 Îlon 2016

Ser xêrê re hatin.  
Tu serfirazê dîn û dinyayê bî.  
Xwedê bê hewariya te.  
Xwedê car din Umrê nesîb ke.  
Xwedê cefayê we bîxe kifaretê gunehan.  
Xwedê heca we nesîbê hemû mislimanan bike.  
Xwedê hewza we nezerê bike.  
Xwedê hevza we nezera pîsan bike.  
Xwedê hewara te were.  
Xwedê yekitiyê nesîbe miletê me bike.  
Xwedê tifaqekê bide Kurdan û misilmanan.<sup>152</sup>

\*\*\*

Kaniya we çîqa av lê here nemiçiqe.  
Kevir ber piyê te penêr be.  
Mala te bibe ocax.  
Mala te bibe wek behra Wanê<sup>153</sup>.  
Mala te mîna çemê ‘Erez<sup>154</sup> be.  
Merivatiya me zirav û dirêj be.  
Rizqê te wek çiyayê Gilîdaxê<sup>155</sup> be.  
Xwedê ‘evdê tengasiyê were rehmê.  
Xwedê dîn û dinya te berk bike.  
Xwedê êdî êş û kederan nîşanî te neke.  
Xwedê te bike mû, neqetîne.

---

<sup>152</sup> Mela Reşid Dündar, *Devera Serhedê*, Gimgim-Mûş 1945. Ragihandin: 10 Çile 2016 ; Mela Arif Karakaya, *Devera Serhedê*, Kop – Mûş 1947. Ragihandin: 21 Çile 2016.

<sup>153</sup> Behra Wanê: Li bajara Wanêyê ku mezintirînê golên Kurdîstan yê.

<sup>154</sup> Çemê ‘Erez: Çeme ku çiyayên Bingolê dize û bajara Îdirê ra dikişê derya Hezar ê.

<sup>155</sup> Gilîdax: Çiyayayê Agirî yê ku mezintirînê çiyayê Kurdîstan yê.

Xwedê te ji delavê teng xelaske.

Xwedê we êşa bêderman derxe fireqetiyê.

Xwedê we herd aliyan nede şermê.<sup>156</sup>

\*\*\*

Manzara<sup>157</sup> te yê pîs inda be.

Xarina we riz û goşt be.

Xwedê bi tera be.

Xwedê bimbarek bike.

Xwedê cihê gindî<sup>158</sup> cînet bike.

Xwedê hevalê te be.

Xwedê nesîbekî pak nîşanî we bike.

Xwedê rizqê bol bide we.

Xwedê we hişm û bela durxe.

Xwedê we şerê minafîqan biparezê.

Xwedê zêde bike, ber destê miriyê we be.<sup>159</sup>

## 2.2. Nifir

Wekî di'ayên nav çanda Kurdî da nifirên Kurdî jî bi jiyana Kurdan a piralî û pir deng ve rasterast girêdayî ye. Di vî warî da nifir û di'a du tiştên diwate ne. Ango tiştên ku pêkhatina wan bi rêya di'ayan tê xwestin, bi rêya nifiran pêknehatina wan tê xwestin; tiştên ku bi rêya di'ayan pêknehatina wan tê xwestin, bi rêya nifiran pêkhatina wan tê xwestin.

Nifirên nav Kurdan da gelek zêdene, ji ber ku ziman û çanda me dewlemende û kevnareye, lê mixabin nifirên me ji vê sed salê wek me bê qedrin, herçî em nifira ji bikin nahên cih û tesîra wan heman dem nabe.

---

<sup>156</sup> Xwendekar Mihemed Bakî, Esmâ û Selva Îlerî, *Devera Serhedê*, 'Eşîra Birûkan- Wan. Ragihandin: 2 Adar 2016.

<sup>157</sup> Manzara: Şikil, sikûm, bejin.

<sup>158</sup> Gindî: Kes, zarok, gede.

<sup>159</sup> Brahîm û Newroz Kurdî, *Devera Rojavayê*, Kamîşlo 1976-1978. Ragihandin: 20 Sibat 2016.



Bêguman nifirên Kurdî jî wek di'ayan gelek in û pir jî peyvikên giran û biwate navda hene ku meriv fedî dike binivîse. Ev nifirên li jorê hatin beravkirin, her yek ji aliyê hin kesên kifş ve têne gotin. Meriv dikare nifiran ser wan sernavan bihonîne.

Wek mînak: Zêdetir beşên nifiran hene bikurtasî:

- Nifirên ku ji aliyê bavan va li zarokên xwe ra têne gotin.
- Hinek ji aliyê dayikan va li zarokên xwe yê piçûk ra têne gotin.
- Hinek nifir wexta ku cîran hêrs dibin zêde nifira zarokan dikin.
- Hinek nifir ji aliyê jinan va li mêrên xwe ra têne gotin.
- Hinek nifir ji aliyê xelkê va ji hevûdu ra têne gotin.
- Hinek nifir ji aliyê xelkê va ji dagirker, xwînmêj û zordestan ra têne gotin.
- Nifirên zayendperest hene ku ji devê jin û mêran derdikevin.

Çawa kû me gotibû pir peyvên giran û biwate hene wek "Cegera te pilte pilte devê te da were" ev peyva "pilte pilte" ku bi wateya "parî parî" û "çetî çetî" û "kerî kerî" an jî "perçe perçe" ye, niha kêma tê bikaranîn. Çetî ji bo goştê, tê manaya perçê biçûk. Minak: "Çetiyên te werin xwarê." Ev peyvên piwate nav di'a û nifiran da zêde derbas dibin.

Bi hêviya ku xemxurên zimanê Kurdî giraniya xwe bidin ser xebatên wisa û peyvên balkêş têxin jiyana rojane. Xortên Kurdhez mijar bi mijar nifiran ji hev kifş bikin û her yekê ji aliyê kê ve têne gotin, ji bo çî hatiye gotin binivîsin. Bi nivîsandinên wisa peyvên Kurdî derdikevin holê. Ev yek ji şadî û bextewariya serkeftina edebiyata gelêriye.

Di bin vê beşê de binbeşên "*Ajal û Heywan*", "*Bîr û Bawerî*", "*Cil û Berg*", "*Dar û Hêşînayî*", "*Êş û Nexweşî*", "*Miraz û Bext*", "*Mirî û Mirin*", "*Reng û Rengdêrî*", "*Rizq û Debar*", "*Wesle û Parçe*", "*Xwarin û Vexwarin*", "*Zarok (Kur û Keç)*", "*Zewac û Malbat*", "*Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan*" û "*Beşek Kifriyên (Dijûn) Wek Nifiran*" hat diyar kirin. Ev binbeş di nav edebiyata gelê Kurd da bi kurtasî wiha cih digirin. Li vir em dixwazin li ser çend mijaran bisekinin.

### 2.2.1. Ajal û Heywan

Hûn bibin gur bi hev bikevin.

Kund li warê bavê te bixwînin.

Mar bi te ve bide.

Marê kor bi te ve bide.

Moz bi zimanê te ve bide.

Tu bidî pey kûsî.<sup>160</sup>

\*\*\*

Goştê te bibe para teyr û tûyan.

Goştê te para teyr û tûya be.

Gurê har nav keriyê we keve.

Gurê har te bixwin.

Hûn bibin gur û rovî hev bikevin.

Înşelah tu gornepişîkî bibî.

Mar û mişk te bixwin

Mêşa kerê zimanê te ve bigre.

Mişk doşanî bî.

Tu buyî para guran.

Tu êşa roviya bikevî.

Tu şîva guran bî.<sup>161</sup>

\*\*\*

Jehremar te gez bike.

Hey kund mala te de bixwunin

Gurê har têke nav pezê we.<sup>162</sup>

\*\*\*

Hûn bibin gur bi hev bikevin.

---

<sup>160</sup> Qadrî Yıldırım, *b.n.b.*, r.315.

<sup>161</sup> Day Nisbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin:15 Sibat 2016.

<sup>162</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945.Ragihandin: 20 Îlon 2016; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

Tengala te, tengala xezalê be.

Tu bibî şîva gura.

Wey tu bibî jûjî.<sup>163</sup>

\*\*\*

Belkî bivî qijka perbelek.

Belkî gurê har te bigre.

Belkî tu gornapişikî bî.

Devê kûçka herî.

Hespkî banzdî.

Merê reş texe.

Rûviyê reş bê pêşiya te.<sup>164</sup>

### 2.2.2. Bîr û Bawerî

Ayîkên min ji te re nemînin.

Fatîha te bixwînim di demeka nêz de îşellah.

Her dû dinya rû reş bî.

Hûn teslîmî Xewzê Hîzan bin.

Kaxiza te binivîsim îşellah.

Kefen li te şa bi îzna Xwedê.

Kefenê te bidirûm îşallah.

Koka we biqe.

Tofana Xwedê bi ser te de bê.

Tu bin şepkî da bimînî.

Tu teslîmî Mir Hesenê Welî bî.

Tu teslîmî Xwedê bî.<sup>165</sup>

\*\*\*

---

<sup>163</sup> Hesen Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>.  
Ragihandin: 25 Îlon 2016.

<sup>164</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, Berg II, Weşanên Aram, 2013 Amed, r. 387-402.

<sup>165</sup> Artemêt, *b.n.b.*, r.66.

Ez wê dinyayê heqê xwe lê helal nakim.

Fermana Xwedê li te rabe.

Ji Xwedê dixwazim teyrok bi ser we da bibare.

Li hizura Xwedê rû reş bî.

Sukûmê te erdê sar be.

Şepe li ser te da welgere.

Xwedê dergahe xêrê te kilît ke.

Tofan li te rabe, tu çiqasî virekî.<sup>166</sup>

\*\*\*

Af û nifirên pêxemberan li pey te bin/ li te rêz bin.

Bêîman herî huzûra Xwedê.

Bêmele herî.

Dewletê tu li ser dewletan bigerî.

Dewletê zewala te ji Xwedê be.

Dê û bavê te xêrê ji te nebînin.

Di agirê cihenemê de bişewitî.

Erebeyeke bêplaqe lê xistî.

Erzehala te here ba Xwedê.

Heta ku xweş bî îman li ber reş bî.

Ji dergê Xwedê mehrûm bî.

Ji hevalan mayî.

Ji hêrsan biteqî.

Ji îman û Quranê mehrûm bûyî.

Ji rehma Xwedê bêpar bimînî.

Li dinyaya din destê Şêx Evdilqadir di pêsîra te be.

Nifirên Mûsa Pêxember li pey we bibe.

Nimêja sibehê şeytan di kerika guhê te de bimîze.

Qudûm di çongan de nemayî.

Qurbana zarên xelqê bûyî.

---

<sup>166</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

Qutiya te tijî, rûviyê te rast nebe.  
Te çawa agir berda heyata min heyata te jî agirdadayî bibe.  
Te çawa mala me xera kir Xwedê jî mala te xera bike.  
Te qirika min tehl kir, Xwedê jî ya te tehl bike.  
Tu teslîmî dîwan û edaleta Xwedê bibî.  
Xezeba Xwedê ji te re were/li ser te bibare.  
Xezeb li te bibare.  
Xêrekê ji xwe nebînî.  
Xêrê jê nebînî.  
Xêrê ji ciwaniya xwe nebînî.  
Tu avê ji teyr û tilûran bixwazî.  
Xwedê lê xwedîtî nekirî û Pêxemberî lê şifaetî nekirî.  
Tu belaya xwe di ba Xwedê de bibînî.  
Xwedê bela xwe bide eskerê romê.  
Xwedê te hê rûreş bike.  
Xwedê te ji ber destan dernexe.  
Xwedê te kevir bike.  
Xwedê ya qenc neke nesîbê te.<sup>167</sup>

\*\*\*

Min hewara Xwedê ku tu bi devê gurên sibatê herî.  
Min hewara Xwedê ku tu derpiyê rengîn li ber serê xwe nebînî.  
Min hewara Xwedê û Şêx Evdilqadirê Gêlanî ku dû ji bixêriya te hilnekişê.  
Min hêvî heye ku qûn li te biçire.  
Min hêvî heye ku qûş li te biqete.  
Min hêvî heye ku tu ji çîrtê re bêjî şorî.  
Min hewara Xwedê ku tu car riya te rast neçe.  
Maşarê tu kor bibî.  
Min hewara Xwedê ku tu bi şîrê makerê (kerên mê) mezin bibî.<sup>168</sup>

\*\*\*

<sup>167</sup> Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016 ; Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>168</sup> Zeynelabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Îlon 2016.

Bela we ji ber piyê we bê û li kesî negere.

Birûska sayî li te keve.

Kî xirabiya min dixwaze Xwedê bira bîne pêşiya wî.

Kûçikê har di mala te keve, we perçe perçe bike, însellah hûn giş bi hev ra har bibin.

Maşalê tu bi hevalê şeytîn bî, dûrî ometa Mihemed, Xwedê bela xwe bide te.

Maşalê tu yê gurî bibî, dermanê te yê ji destê min be.

Maşalê tu yê wer (her dem) li kuçe û qapiya (deriyan) bigerî.

Reh û rîşa te bibire.

Reş û heş ser te da were.

Ruyê te reş, serê te niviz (nizm) be.

Sipî bikevê canê te.

Şapa heyva gulanê li te rabe.

Şapa heyva gulanê serê te de bê.

Şeytan şefaate li te bike.

Tin (tu) bimînî bêxweyî, nav gûyê xwe de bigevizî.

Tin (tu) cinetê çavê xwe nebînî.

Tiştê ku te xwar li te bibe quzilqurt.

Tu bê Yasîn herî.

Tu bi qurbana ker û kûçika bî.

Tu bi sorikê bikevî bi xuriyê bimirî.

Bi sorika keto bi xuriya miro.

Tu bî, kurm di te da were, tu li dixtora û hekîma û şêxa bigerî.

Tu bî, tu kûçikê gurî bî, tu qapî qapî bigerî, xelk pariyek nan nede te.

Tu bihelisî, Helisiyo.

Tu di axa sar kevî.

Tu herî aqreb(dûpişk) bi te bigre.

Tu hilperike canê xwe.

Tu ji wî halê xwe nefilitî.

Tu li pişt deriya bimînî.

Tu qanqiranî (kangren) bibî.

Tu qijik û pepûk bibî.

Tu tu xêrê ji emrê xwe nebînî.

Tu xêrê ji can û bedena xwe nebînî.

Tu xêrê ji pîreka xwe nebînî.

Wey Pira Salatê li ber te bibe wek şûr û mû.

Weyla şapa heyva gulanê li te rabûye.

Wey tu li mala xwe nemirî, tu li derî û kolanê Fileha û Cuhîya bimirî.

Xocê Xizir xenîmî te be.

Xwedayê alemê te misteheqê agirê cehenemê ke.

Xwedê bela we bibe ber deriyê we.

Xwedê bike tu ji germa bifetisî.

Xwedê çi serê min aniye serê te jî bîne.

Xwedê çog û cuniya ji te bistîne.

Xwedê heca te qebûl neke.

Xwedê heqê min ji te vexwaze.

Xwedê heqê min ser Pira Selewatê ji te bixwaze.

Xwedê hiş û mêjî ji te bibirhîne.

Xwedê hiş û mêjî ji te bistîne.

Xwedê niga ji te bistîne, tu bi gopal bimeşî.

Xwedê nimya (nimêja) te qebûl neke.

Xwedê rojiya te qebûl neke.

Xwedê te ji derge û dîwanê xwe bavêje.

Xwedê û pêxember ji te ne razî be.

Xwedê we misteheqê ezabê xwe bike.

Xwedê ziman ji te bistîne, tu lal bibî. <sup>169</sup>

\*\*\*

Ayê<sup>170</sup> min te ra nemîne.

Bayê bafisa te keve.

Bayê birûskê te keve.

Belkî ax û zarê min te ra nemîne.

Belkî bela Şems te ra bê.

Belkî ciyê xwe ziha nebîne.

Belkî ecêbekî usa bê serê te, wekî hinek bêjin: hebû, hinek bêjin: nebû.

Belkî gunê wî bive stûna Selîmê bighîje Xwedê.

Belkî kevirê te ciyê rast nesene.

Belkî kevir-kuçik ser te da bibare.

Belkî per-baskê te bişkên.

Belkî şûrê Şems stiyê te keve.

Belkî tu binikisî.

Belkî tu jî bikevî rija min.

Belkî tu ron bî, ser bêrê nesekinî.

Belkî wira bivî kevir.

Ber siya çeva rûniştî.

Birûskê tu kutayî.

Bivî kûteke şewitî.

Cinê mala Cin Teyar belkî te keve.

Eba te rûyê tavê nebîne.

Îlê tokêva zeloqiyano.

Îsêbiya bike, usa bibî, belkî em şîşa nan dirêjî te kin.

Kirasê filankesêda herî xarê.

La îmana te bişewite.

---

<sup>169</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 6-82.

<sup>170</sup> Ayê: Ax, ox û of.



Lê gulla Şems lê ketî.  
 Lê gulle te ketê.  
 Lê paşopê bûyî.  
 Lê pê li tîra Şems kirî.  
 Lê pey mala cina kirî.  
 Lê qurbana hevalê xwe bûyî.  
 Lê qurbana zarê xelqê bûyî.  
 Lê reş û heş serda hatî.  
 Lê sewdeserî<sup>171</sup> bûyî, çola ketî.  
 Lê şiva kora çevê te ketî.  
 Lê teyrokê<sup>172</sup> lêxistî.  
 Lê Xwedê ber undakirî.  
 Lê Xwedê ber xwe avîtî.  
 Lê Xwedê dîwana te kirî.  
 Mi çi lezet te dît, tu wê lezetê ji Xwedê bivînî.  
 Mi gazî şems kirî, belkî îro siba atara filankesê bê serê te.  
 Mi gazî Şems kiriye, tu dîn û har bî çola keví.  
 Min destê xwe avîtiye pêşa am û tama, belkî îro siba xafilqedeke usa tera bê, wekî  
 bê tu waymîş nebî.  
 Ocaxa ‘Eto te xe.  
 Ocaxa min belkî dîwana te bike.  
 Selmanî Sind belkî te derkeve.  
 Şems dîwana te bike.  
 Şems te ber xwe bavêje.  
 Şîna şipûkê, dena Dihokê ser teda bê.  
 Te xêr xwe nedîtî.  
 Teyrok<sup>173</sup> ser te da bibare.  
 Topa Şems te keve.  
 Tu xêrê wayê nebînî.  
 Tu Xwedê da bîvînî.  
 Weylê agir berkavka te ketî.

<sup>171</sup> Sewdeserî: Çol û beyaran ketin.

<sup>172</sup> Teyrok: Xirabî, bêşansî, qederreşî.

<sup>173</sup> Teyrok: Xerabî, bêşansî û qederreşî.

Weylê boqa te fire bûyî.  
Weylê haqas bûyî.  
Weylê pihîna Şems lê ketî.  
Weylê Xwedê jê standî.  
Xêrê bikî wayê qe nebînî.  
Xwedê agir ser te da bibarîne.  
Xwedê heqê te bê der.  
Xwedê te rûsipî neke.  
Xwedê te sosret ke.  
Xwedê tu qebûl nekî.  
Xwedê ya heq nede ya neheq.  
Xwedê, te hewla te, dewlê te bavêje.  
Zerga Şems te keve.<sup>174</sup>

\*\*\*

Birûsk li te keve / birûska Xwedê li te keve.  
Kevir û kuçik li te bibare.  
Ma şalê ewê sî ro rojiyê bigre û şeva eydiyê nebînî.  
Ma şalê fermana we rabe.  
Ma şalê kirasê reş<sup>175</sup> li te be.  
Ma şalê tîr<sup>176</sup> li te hilê.  
Ma şalê tu bi gulla sibê herî.  
Ma şalê tu bî tu di nava alemê da sosret bî.  
Ma şalê tu bî, tu bikevî ber desta.  
Ma şalê tu bî, tu di mala xwe da qe nebînî bûk û zava.  
Ma şalê tu bî, tu gurrî<sup>177</sup> bî, neynûk tunebin tu xwe pê bixurînî.  
Ma şalê tu biperitî.  
Ma şalê tu dîn û har bî bi çola kevî.  
Ma şalê tu herî, darbesta<sup>178</sup> te were.  
Ma şalê tu ker û lal bî.

<sup>174</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>175</sup> Kirasê reş: Di nîfirê de maneya şîn girtinê de hatiye bi kar anîn.

<sup>176</sup> Tîr: Eş, tajan, sancî.

<sup>177</sup> Gurrî: Nexweşiya xwiranê.

<sup>178</sup> Darbest: Sedye; gava ku kesek bimire an birîndar be an jî nexweş be, di şûna ku tabût tunebe li darbestan dikin pê digihînin bajêr an nexwesxaneyê. Tabût, çardara ku pê nexweş tîn naqilkin.

Ma şalê tu korocax<sup>179</sup> bimînî.  
Ma şalê Xwedê ji te bistîne teqeta çoka û roniyêd herdu çava.<sup>180</sup>  
Ma şalê Xwedê per û baskê te ji te bistîne.  
Tofana Xwedê bi ser te de bibare.  
Topa Xwedê li te keve.  
Toqa Xwedê di hustuyê te keve.  
Tu bi dora xelkê bî.  
Tu bi ser bela xwe vebî.  
Tu bî tu ber xwe nebînî.  
Tu di tora zaliman kevî.  
Tu li ber tofana Xwedê herî.  
Xwedê li te were xezebê.  
Xwedê Ocaxa te şên neke.  
Xwedê ruh stendo.  
Xwedê ruhê te bistîne.  
Xwedê te bike sosret.<sup>181</sup>

### 2.2.3. Cil û Berg

Benikê doxîna te biqete  
Kincê te bimbarek nebe.  
Kum te bimîne.  
Laçika jina te li serê te be.  
Tu cilê xwe da rihetiyê nebînî.  
Tu hesreta cil û nivîna bî  
Tu kincê xwe biçirînî.  
Tu neqetînî.  
Tu wan cila neqetînî.<sup>182</sup>

<sup>179</sup> Korocax mayîn: Bê zar û zêç mayîn.

<sup>180</sup> Ji strana «Lo Bavo».

<sup>181</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b*, r.80-86.

<sup>182</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

#### 2.2.4. Dar û Hêşnahî

Dara te şîn nebe.

Pel bi dara te ve nemînin.

Pelê dara te biweşin.

Rezê we teriz lêxe.<sup>183</sup>

\*\*\*

Dara te gulî nede.

Dara te kulîlk /pêl / gulî nede.

Dara te pûç bit.

Guliyê dara te biweşe.

Lehî li sexlê te bixe.

Pelên dara te biweşin.

Xwedê dest te da pûçke.

Xwedê dest te da xulîke.

Xwedê oxira te lê neyîne.<sup>184</sup>

#### 2.2.5. Êş û Nexweşî

Ava reş bi çavê te de bê.

Bayê sor bi kezeba te bikeve.

Bûkik di çavê te de şîn bibe.

Canê te zer bibe.

Derdekî bêderman li te rabe.

Dev li te xwar bibe.

Êşa mirîşkan bi te bikeve.

Êşa zirav bi te bikeve.

---

<sup>183</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.313

<sup>184</sup> Hecî Hesên Akin Gûzereşî, *Devera Hekariyê*, Çelê- Colemêrg 1951. Ragihandin:19 Sibat 2016; Edebiyatnas Necmî Akin Xanî, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1972. Ragihandin:19 Sibat 2016.

Kezeb li te reş be.

Kula salê li te bê.

Kurm bikevin laşê te.

Rebî sîsotk<sup>185</sup> di te de were.

Rîş<sup>186</sup> di laşê te de derkeve.

Roja te roja reş be.

Tu bi xurya herî.

Tu dîn bibî bi laşê xwe bikevî.

Tu har bî li çol û bestan bikevî.

Tu ji herdû çavan bibî.

Tu kerr û lal bî.

Xûn di dev ra hato.

Xwîn vereşiyayo.

Xwîna reş di dev û pozê te re were.<sup>187</sup>

\*\*\*

Çobelana mirîşkan te keve.

Dil û hinavê te reş be.

Êş hundirê te keve.

Kezeba te bişewite.

Kezeba te reş bibe.

Koka te biqe.

Kuleka mezin texe.

Kula bêderman bi canê te derkeve.

Mêjjiyê te reş be.

---

<sup>185</sup> Sîsotk: Sîroz.

<sup>186</sup> Rîş :Aletjî.

<sup>187</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.313.

Mêjîyê te te'ta va bizelqe.

Para gora bî.

Pençeşîr li te bigre.

Qir nav we keve.

Roviyê te hundurê te ve bizeliqê.

Serê xwe nexwaşîyan ranekî.

Tu bi çobelanê herî.

Tu bi xurî û sorikan herî.

Tu bikevî pîlên te bişkên.

Tu çol û beyaran bikevî.

Tu derdê bê derman herî.

Tu dîn û har bibî.

Tu genim bavêjî ziyane hildî.

Tu goşt û canê xwe bikevî

Tu kincên xwe bidirînî.

Tu xêrê cane xwe nebînî.

Weyla tu sancî bî.

Xezeba Xwedê te bigrit.

Xwedê cirê<sup>188</sup> te mi damirandî.

Xwedê kezeba te qetqet bike.<sup>189</sup>

\*\*\*

Derdê bêderman bikeve canê te.

Êş serê te keve.

Êşa mirîşkan bi te bikeve.

---

<sup>188</sup> Cir: Sukum, şikl , tewr, rû û wech.

<sup>189</sup> Mela Ferîd Bazîdî, *Devera Serhedê*, Bazîd- Agirî 1958. Ragihandin: 26 Sibat 2016.

Goştê te bihele.

Hestiyên te birizin.

Kezeba te biwerime.

Kezeba te were xwarê.

Li dewsa avê xwîn bimîzî.

Rûviyên te di devê te re bân.

Xeneqreş<sup>190</sup> li xeneqê ketî.

Xwedê te gurî bike.

Ziravê te biqete.<sup>191</sup>

\*\*\*

Hûn derdê bêderman bigirin.

Kezeba we reş be.

Kul gewriya we bişidîne.

Sanciya roviya li we bigre.

Tu xêrê can û bedena xwe nebînî.

Xweşî nebe para te.<sup>192</sup>

\*\*\*

Avka zer li te bizê.

Derd û kulên te xelas nebin.

Goştê te zer be.

Har û dîn, cunî bî.

Hêta te reş be.

Hundirê te devê tera bê.

---

<sup>190</sup> Xeneqreş: Xenîgok, nexweşîya xeneqîtikê.

<sup>191</sup> Occo Mahabadî, <https://occomahabad.wordpress.com/2016/03/03/nifiren-kurdan-kurtlerin-beddualari/> .  
Ragihandin: 15 Avrêl 2016.

<sup>192</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

Hundirqulî bî.  
Kuleka min mezintir te bigire.  
Tu bi xwînê vereşî.  
Tu guhêşê herî.  
Wayla zikêşî bî.  
Waylê sancî te ketê.  
Weyla agir te ketiyê.  
Xwedê tayê têxe bedena te.<sup>193</sup>

\*\*\*

A xerab di te de bê.  
Çavê te rijit.  
Difna<sup>194</sup> te bişkêt.  
Ma bi jan te ketî.  
Stuyê te bişkêt.  
Xwedê te gurî bike.<sup>195</sup>

\*\*\*

Sed û bîst û pênc cara bihetikî.<sup>196</sup>  
Tu bibî para xurî û sorikan.<sup>197</sup>  
Tofan li te keve.  
Kezeba te di devê te de derkeve.  
Tu çînî çînî bibî .  
Jana<sup>198</sup> zirav li te keve.

---

<sup>193</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945, Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin:15 Sibat 2016.

<sup>194</sup> Dîfn: Bêvil, poz, lût, kepî û organa bênkirinê.

<sup>195</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>196</sup> Bihetikî bûn:Rezil bûn.

<sup>197</sup> [Http://bijwen.sozlukspot.com/w/nifiren-kurdi/](http://bijwen.sozlukspot.com/w/nifiren-kurdi/). Ragihandin: 13 Îlon 2016.



Tu mêjîreşî bibî.  
Tu xêrê ji xwe nebînî.  
Bila goştê te xwe ji hestiyên te berde.  
Hey topa Xwedê li te bikeve.  
Înşalah dema tu axîn bikî, axîna te xwîn were.  
Hey xwîna sor di devê te re bavêje.  
Maşalê dev li te xwar bibe.  
Înşalah tu ranehêjî baqê keziyan.<sup>199</sup>  
Kuro tu bi goştê canê xwe kevî.  
Tu bi çora zirav bikevî.  
Înşalah tu dîn bibî û bi çola bikevî.  
Maşarê tu kerr û lal bibî.  
Hey kezeba te qul bibe.  
Lawo kezeba te reş bike.  
Tu ji herdu çavan bibî.  
Kezeba te di devê te de derkeve.  
Tofan li te keve.  
Tu xêrê ji xwe nebînî.

\*\*\*

Êşa mirîşkan bi te bikeve.  
Êşa zirav bi te bikeve.  
Gerden helyayo-helyayê.  
Kezeba te biwerive.  
Kula Helebê bikeve mala wî.  
Qirika te şil nebe.  
Rûviyên te di devê te ra bân.  
Stûr jê keştê, gerdan hilyayê.

---

<sup>198</sup> Jan: Elem, êş, azar, ezab, nesaxî, kul, derd, ezyet û tazîp.

<sup>199</sup> Kezî: Bisk, pirç, cênik û porrê ku li pişte hatiyê vehûnandin.

Tu bi xurya herî.

Tu tim qiriktehl bî.<sup>200</sup>

\*\*\*

Ava reş bi çavê te de bê.

Axa sar te nehewîne.

Ba li çongên te bikeve.

Bayê sor bi kezeba te bikeve.

Bayê Şimşatê li te rabe.

Bedena te reş-hêşîn be.

Belaya xwe di ber piyên xwe de bibînî.

Bi bin erebeyekê kevî û goştê te bi tekan ve bigire.

Bi çifta dewarekî çûyî.

Bi girêşreşê ketê.

Bi guhanreşê ketê.

Bi nikulreşê bikevî.

Bi pêsoşkê bikevî.

Bi qotikê ketî

Bi sewnêsiyê ketî.

Bi sibehê neketî.

Bi tewekê ketî.

Bi xewtêşê ketî.

Bibe dasî û bikeve qirika te.

Bidî derzî-derman û emirbilah daynî ber serê xwe.

Canê te ji kul û derdan xalî nebe.

Cegera te bişewite .

Cendekê te bibe pîneyê Sîço.

Cîgera te biperite.

Cîgera te di devê te re were.

---

<sup>200</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-a-kurdi-3.html>. R: 25  
Îlon 2016.

Cîgera te kun<sup>201</sup> be.  
Çavên te ji hêşiran xalî nebin.  
Çermê te biwere/biweşe.  
Derdê bêderman bikeve canê te.  
Derdê bêderman lê rabûyî.  
Deriyê mala bavê te girtî be.  
Deriyê te bi heft hejên guhîjê girtî bin.  
Derman di çongên te de nemîne.  
Di bin çengan da kînor hato.  
Dil ji kulan xalî nebûyî.  
Dil û hinavên te di devê te ra werin.  
Dilê te bişewite.  
Dinya li ber çavên te reş be.  
Diran di devê te de nemînin.  
Êş serê te keve.  
Êş û ûş li te rabin.  
Êtixî ji mala te, soxî ji navê te kê m nebin.  
Êvar bi ser de nehatî.  
Felek li serê te bigere.  
Fireng li hatî.  
Gewrêş bi gewriya te bikeve.  
Her du lingên te bi hev re bişkên ku tu ji xwe re rûnî.  
Hetanî dawîya emrê xwe nalînî bikî.  
Hêtereş li hêta bikeve.  
Îlancix di gewriya te de were .  
Înşeleh tu dê bi ber biavêjî. (bi tenê ji bo jinan)  
Jana zirav bi te da were.  
Ji vir neçî dera han.  
Ji xeberdanê bikevî.  
Ji xewê ranebûyî.  
Kef bi devê te ketî.

---

<sup>201</sup> Kun:Qul,qulik û kurî.

Ketî ber lepan û çav li destan bî.  
Kesek nalenala te nebihîze.  
Kezeb ji dêv re hatî.  
Kezeb peritiyo.  
Kezeb xwê biyo.  
Kezeba te bihele.  
Kezeba te qul bibe.  
Kezeba te tîkeyên xwînê bin û ji devê te re bîn.  
Kezev li te reş bibe.  
Kêlekên te li ser nivînan birizin.  
Kînor<sup>202</sup> di qûna te de derkeve.  
Koça te ji keriyên bimîne.  
Kul di mala te keve.  
Kul, jan, dev, diran, bigire pişik û parxan.  
Kula derê biharê lê xistî.  
Kula Helebê bikeve mala wî/ di mala te keve.  
Kula salê te da derkeve.  
Kurê te li te bimore.  
Kurê te tev kuran nebe.  
Kurm bikevin laşê te.  
Mar bi te ve bide.  
Maran lê xistî.  
Marê kor bi te vede.  
Marê reş lê xistî/li te vede.  
Nexweşiya te li te heşt nobe be.  
Pirtikên te li esmanan bin.  
Pişikreşî bûyî.  
Qanser li te were/derkeve.  
Taya mirinê bi te keve.  
Tu bi cinan bikevî.  
Tu bi goştê canê xwe kevî .

---

<sup>202</sup> Kînor: Çîban, apse û kulê ku li çermî mîrov tê.

Tu bi xewê kevî û jê ranebî.  
Tu bi xuriyan herî.  
Tu goştê xwe birûçikinî.  
Tu ji her du çavan bibî û kesek destê te negire.  
Tu ji her du çavan bibî.  
Tu ji her du çavan mehrûm bibî  
Tu dîn bibî bi laşê xwe bikevî.  
Tu dîn bibî û bi çolan/bi çiya û baniyan bikevî .  
Hêlikreşek te bixesîne.  
Hestiyê piştê lê xaşê bî.  
Ji birçînan hişk bûyî.  
Kulê li kezebê xistî.  
Hûr û rûviyên te di devê te re bên.  
Hûr ji dêv re hatî.  
Ava zer di canê te de bê xwarê.  
Zikê te zer bibe û dermanê te jî li ba min bibe.  
Ziman di devê te de biwerime.  
Zimanê te bi ber diranê te bikeve.  
Zimanê te bi esmanê devê te ve bigire.  
Zimanê te ji devê te vekişe.  
  
Xeneqa te cêr bibe.  
Xeneqûtk li xeneqa te keve.  
Xişxişe li destên te bikeve.  
Xwîn di dêv ra hato.  
Xwîn vereşiyayî.  
Xwîn-kêm vereşî.  
Gerden cêr bûyî.  
Gerden heliyayî.  
Goştê te birize.  
Goştê te bibe xurê/xwarina mişk û maran.  
Goştê te bihele.  
Goştê te li erdê, hestiyê te li bin piyan be.

Gula çardexurê<sup>203</sup> li binçenga te bikeve.

Guleyek li navçavê ketî.

Gulla berbanga sibê li te keve.

Gulla serê sibê li te keve.

Hêta te bişkê.

Tu ker û lal bibî.

Wey diran di devê te de nemînin.

Ziravê te biqete.

Xwedê te gurî bike.

Zik lê werimî /perçifî Tu nebêjê ox.

Tu nebêjê xwezî bi îro.

Tu parçeparçeyî bibî.

Tu dîn bibî bi çiyar bikevî.<sup>204</sup>

\*\*\*

Derdê bêderman bikeve canê te.

Êş serê te keve.

Goştê te bihele.

Hestiyên te birizin.

Kezeba te biwerime.

Kezeba te were xwarê.

Li dewsa avê xwîn bimîzî.

Rûviyên te di devê te re bîn.

Xeneqreş li xeneqê ketî.<sup>205</sup>

\*\*\*

Hayla derdê bêderman te girtiyê.

---

<sup>203</sup> Çardexor: Demençeyên ku bi carekê çardeh fişekan tê da heye.

<sup>204</sup> Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016; Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>205</sup> Occo Mahabadî, <https://occomahabad.wordpress.com/2016/03/03/nifiren-kurdan-kurtlerin-beddualari/>. Ragihandin: 15 Avrêl 2016.

Înşallah desmala min li serê te be.

Înşallah êşek te bigre, dermanê te li tu welata nebe.

Înşallah Xwedê topa Êris têxe mala bavê te.

Înşallah Xwedê ya bîne serê te, neyîne serê tu kafiran.

Jinikê tu derdekî bê derman bikevî.

Merhemet û bereketa Xwedê ser we de neyê.

Xwedê derdekê bêderman bide te.

Ya Rebî tu zalima qehr û perîşan bike.<sup>206</sup>

\*\*\*

Av têkevê mêjiyê te.

Bazinê stûyê te bişke.

Jehra mahrê<sup>207</sup> pîr bixwî.

Keser û derd hevrêyê te bin.

Kula sala par te keve.

Rîşa pûç<sup>208</sup> nav we keve.

Şepe li ser te de bê.

Tilî û pêçikên te bikişin.

Topa Êris nav cîgera te bikeve û cîgera te pirtî pirtî bibe.

Zimanê we bikêşe.<sup>209</sup>

\*\*\*

Afatên giran bê serê te.

Agirê sor bi canê te keve.

Ava zer û zelal ji hestiyê te bê.

---

<sup>206</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Êlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>207</sup> Mahr: Mar.

<sup>208</sup> Nexweşiya goştê mirov perçe dike.

<sup>209</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

Bila şewta dilê te, tu car netevize.  
Çavê te zuha nebin.  
Çoka te bişkê tu ji cî ranebî.  
Di gurçika te da kula qansêrê were.  
Di qirika te da kula qansêrê were.  
Dil û hinavê te biperitin.  
Eşa tûtika<sup>210</sup> li we keve, şevê yek ji we here.  
Goştê te bi kelbetanê<sup>211</sup> hîlbê.  
Goştê te birize, kurm û kêz di hestiyê te keve.  
Hêlek te terr be, hêlek te hişk be.  
Hestiyê te bişkê, çavê te birje.  
Hey tûtma Mêrê Cûdî çuyî hinavê te de.  
Hey zehmetfiringiyê tu girtî.  
Hey zeregê (zerik) girtî.  
Heylê şevê didanêş, rojê serêş bigihî (gihayî) te.  
Heylo te keziya xwe kur kirî ser canê xwe.  
Jana reş li te keve, tu derman nebînî.  
Jana zer<sup>212</sup> li kezeba te keve.  
Mûmar<sup>213</sup> di te da were.  
Ne bi xêr û ne bi silamet.  
Quzilqurt û ava zer li te be.  
Rebî, tu ji bedena xwe binalî, tu ji piştta xwe bikalî.  
Satilcanî li te keve.

---

<sup>210</sup> Tûtik: Mirîşk.

<sup>211</sup> Kelbetan: Pencik, pens û pense.

<sup>212</sup> Jana zer: Nexweşiyê zerikê.

<sup>213</sup> Mûmar: Nexweşiyek e ku li sere tiliyên mirov peyda dibe û dike ku ew biêşin û biwerimin. Kurmikekî biçûk û zirav. Marok, ragirtin.



Similmewtê tu girtî.

Şîvsot<sup>214</sup> di qûna te de bê.

Taya mirinê te bigre.

Tepelika<sup>215</sup> qafê te rabe.

Tu bi menencîtê bikevî.

Tu bi zerka reş<sup>216</sup> kevî.

Weylê ava zer hestî u wesela hatî.

Weylê bayê felcê tu girtî.

Weylê janeserê<sup>217</sup> girtî.

Weylê zecerê girtî.

Xiştik<sup>218</sup> te bigre. (Dêrsim)

Xwedê jana xwe canê te ke.<sup>219</sup>

\*\*\*

Ava reş bê ser çevê te.

Ava zer te bizê.

Belkî danavî bi.

Belkî derdê te der nebe.

Belkî girêşa te dernebe.

Belkî îşiqa çevê te birije.

Belkî sursuran gewriya te da bimîne.

Belkî tu bivî para xurî-sorika.

Belkî tu buviya qertemezê kevî.

Belkî tu der nebî.

Belkî ziya te ronbe.

Bînaya çeva belkî te kor ke, topal ke, şil u şet ke.

---

<sup>214</sup> Şîvsot: Nexweşiya basur.

<sup>215</sup> Tepelik: Ser serê mirov.

<sup>216</sup> Zerika reş: Nexweşiya sîroz

<sup>217</sup> Janeserî: Serêşî

<sup>218</sup> Xiştik: Nexweşiya pêz e ku nexweşiyeke kuştov e.

<sup>219</sup> Gazî, *b.n.b.*, r.6-82.

Cegera te qul be, belkî devê te ra bê.  
Cegera te qul be.  
Derd belkî te derkeve.  
Derd bikeve canê te.  
Destê te bikşe.  
Dil-hinavê te zer be (devê tera bê).  
Firnê te ra bê.  
Girê devê te derê.  
Girê te netemire.  
Gurî bî û neynik tinebe tu xwe bixurfînî.  
Gurî bî, xwe dîwara dî.  
Herd çeva kor bî, ava reş bê çevê te.  
Istiyê te bin te da bimîne.  
Istuyê te bişkê heft ciya.  
Kêra reş dilê te keve.  
Kerkong stiyê teda bê.  
Kêzika kulfê ketiye nava dilê te.  
Korayî te da bê.  
Kul gewriya te derkeve.  
Kula heft penç te derê.  
Kulê qirikê girtî.  
Kûnî kûnî bî.  
Kunişk-kunişkî bî belkî.  
La guha ker biyê, la zimanda jî lal biyê.  
La xwe xwarê.  
Lalî te da bê.  
Lalome zimanê te keve.  
Lê ava reş bûyî.  
Lê dil-hinavê te devê te ra bê.  
Lê kul gewriyê ketî.  
Lê kul te da hatî.  
Lê lingê te struyê te ketî.  
Lê pizika pîs te da hatî.

Lê qotikê lê girtî.  
Lê qurtemezî bûyî.  
Lê sarincî bûyî.  
Lê stiyê te jê bûyê, erê welle.  
Lê stû lê şkestî.  
Lê şipûkê tu kutayî.  
Lê xolorê birî.  
Lê xu kelîne ketî.  
Lingê te quloz be, serê te têkeve bin cendekê te.  
Mejiyê te çavê te ra bê.  
Nalîn ji te bê.  
Qirqinde te da bê.  
Qolinciya rûviyê reş te bigre.  
Rûvîkî biwaqî.  
Ser te da kul be.  
Stiyê te bin te keve.  
Stiyê te bişkê, tasê te biniqise.  
Stiyê te bişkê.  
Şil bî, şet bî.  
Şîş nav dilê te keve.  
Şîşê hesinî guhê, te ra çuyî.  
Tu bikşî, bivî qoncik belkî.  
Tu biqelî, kotî bî.  
Weyla neynik lê weriyayî.  
Weylê tîra reş nav dilê te ketî.  
Xeneqûtk qirka te derkeve.  
Xeneqûtkê bigirî.  
Xewtêşka kulê lê ketî.  
Xişxişeyî bî.  
Xûna reş devê te bê.  
Xwedê bike bibecî.  
Xwedê bike binipixî.  
Zarê te zikê te da bimîne.

Zarê te zikê te da here.  
Zikê te da biqerise.  
Zimanê te bişkê (jê be) .  
Zingezing guhê te bê.<sup>220</sup>

\*\*\*

Ava reş bi çavê te da were.  
Ava reş di çavê te da bê /were/ hato.  
Ava zer di canê te da bê xwarê.  
Bedena te reş be.  
Ber xwe nediyo.  
Bi te keve derdekî bê derman, dermanê te şîrê teyran û qoçê keran be.<sup>221</sup>  
Cîgera te biperite.  
Cîgera te di devê te re were.  
Cîgera te di porê te re were.  
Cîgera te qul be.  
Çavê te di mista<sup>222</sup> min keve.  
Çêtiyên<sup>223</sup> te werin xwarê.  
Derdê bê derman bikeve canê te.  
Di bin çengan da hato.  
Dil û hinavên te di devê te ra were.  
Hustuyê te bişkê.  
Hustuyê<sup>224</sup> te di ber te da bimîne.  
Jana zirav<sup>225</sup> bi te da were.  
Kezeb xwê biyo.  
Kezeba te bihele.  
Kezeba te were xwarê.  
Kûçikê har bi te bigre.  
Kula Helebê di mala te keve.  
Kula salê<sup>226</sup> di te da derkeve.

---

<sup>220</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>221</sup> Ji strana «lo bavo».

<sup>222</sup> Mist: Kulm, boks, gurmiç, kefa destan, hundirê destan û deste givaştî.

<sup>223</sup> Çêfî: Ji bo goşt, perçê biçûk. Çêfî-çêfî: kerî kerî, perçe perçe.

<sup>224</sup> Hustu (Stû, sto, sitî, îstî, îskur, îstu, histî, histo, esto, ustoy): Gerdan, qirik, gewrî, hefik.

<sup>225</sup> Jana zirav: Nexweşiya weremê, tuberkuloz.

Kwînêra<sup>227</sup> reş di sîngê da hato.

Laşê te çêtî çêtî be.

Qeda bi te keve.

Qeda û bela bi te keve.

Qirqende<sup>228</sup> bi te da were.

Rûviyê te di qûna te ra were.

Tu bi çol û polan kevî.

Tu bi çolê kevî.

Tu bi devê hirça har herî.

Tu bi xeneqtkê<sup>229</sup> kevî.

Tu çêtî çêtî bî.

Tu kor û 'utim, bî.

Tu kur û kem bî.

Tu kût û 'utim<sup>230</sup> bî.

Tu xêrê ji canê xwe nebînî.

Xenequt bi te bigre.

Xenequt bi te keve.

Xişxişe<sup>231</sup> bi te bigre.<sup>232</sup>

### 2.2.6. Miraz û Bext

Mirazê te di çavê te de bimîne.

Tu negîjî mexsed û miraza.<sup>233</sup>

\*\*\*

Bextê te bibe bextê qijika reş.

Bextê we bibe bextê gelean.

---

<sup>226</sup> Kula salê: Tewrek kul, kwînêr, birîn.

<sup>227</sup> Kwînêr: Kunêr, kînor û babetek kulê birînê.

<sup>228</sup> Qirqende: Tewirek nexweşiyê ye.

<sup>229</sup> Xeneqûtik: Kuxika xeneqûtikê, babetek kuxikêye, li hin ciyan qenequtik jî dibêjin. Bi taybetî zarok bi vê nexweşiyê dikevin.

<sup>230</sup> Kût û 'utim: Acûze, mirov dikeve ber destan.

<sup>231</sup> Xişxişe: Heywanek; gava ku bi mirovan vede mirov reş dibe û dimire.

<sup>232</sup> Mahmud Lewendî, *Hêvî Kovara Çandîya Giştî*, Hejmar 3, Paris - France 1985, r.80-86.

<sup>233</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.313.

Cawa<sup>234</sup> we ji min re bê.

Mal û milkên te ji min re bimînin.

Mirazê te çavên te de bimîne.

Tu li bextê xwe şa nebî.

Tu mirazê xwe şa nebî.

Tu mirazqijikî bî.<sup>235</sup>

\*\*\*

Miradê te di çavê te da bimîne.

Mirazê te di pozê te de were.

Oxira te ne ya xêrê be.

Qe mezin nebûyî.

Tu bêmiraz herî.

Tu mirazê min nebînî.

Tu qurbana zarê xelkê bî.

Tu xuya min bin erdê kî.

Xwedê dergahê xêre te veneke.

Xwedê kindirê te biqetînê.

Xwedê te gurî bike.

Ziravê te biqete.<sup>236</sup>

\*\*\*

Bextê te bextê qijika reş be.

Kambaxê<sup>237</sup> bi goştê canê xwe ra rê naçe.

Mirazkê te çavê te de bimînin.

---

<sup>234</sup> Cewaba we ya nebixêr. Xebera mirinê.

<sup>235</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

<sup>236</sup> Kek Îsmed Öner Taşuçani, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1960. Ragihandin: 20 Îlon 2016

<sup>237</sup> Kambax: Pir xirap, gelek nebaş, wêran, xopan.

Qeda te ber lingê te be.  
Qîzê tu di malada bimînî.  
Roj ser te re nebore.  
Tu bê miraz biminî.  
Tu lezetê canê xwe nebînî.  
Tu mêrekî kor û pîr bikî.  
Tu mirazê xwe nebînî.  
Tu şîn û şahî tişteki nebînî.

Xwedê mirazê te neke.  
Xwedê tu miraz pê nekî.  
Xwedê wî mirazî ve tu wî şa nekî.<sup>238</sup>

\*\*\*

Tu bi mirada xwe şa nebî.  
Xêrikê ji xwe nebînî.  
Xwedê ya qenc neke nesîbê te.<sup>239</sup>

\*\*\*

Bav û birayê te bi miradê te şa nebin.  
Bereketê ji emrê xwe nebînî.  
Bextê te reş be.  
Bêmiraz çûyî.  
Min xêr ji te nedît; tu jî xêrê ji mirazê xwe nebînî.  
Miradê te di çavê te de bimîne.  
Miradê te di qirika te de biqurmiçe.  
Miraz di çavan de mayî.  
Miraz pê nekirî.

---

<sup>238</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin:15 Sibat 2016.

<sup>239</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R: 25 Îlon 2016.

Mirazê te di çavên te de çortan<sup>240</sup> be.  
Mirazê te di pozê te de were.  
Mirazê te mirazê gûlika biharê be.  
Mirazê te mirazê qijikê be/qijika kor be.  
Mirazê te tev mirazan nebe.  
Mirazê te di qirika te da bimîne û tu şa nebî.  
Tu bi miradê xwe şa nebî.<sup>241</sup>

\*\*\*

Mirad di qirikê da mao.  
Miradê te di axê keve, keto/ê.  
Miradê te di qirika te de bimîne.  
Tu bi qedera xwe şa nebî, tu negê mexseda xwe.  
Tu ronahî nebînî.  
Tu rûsipî nebî.  
Weylê Xwedê te serfirazê dîn û dinê neke.  
Xwedê riya te bike qesra bêderî.  
Xwedê te serfiraz nekit.<sup>242</sup>

\*\*\*

Bav birê te mirazê te şa nebin.  
Bav birê te xêrê ji te nebînin.  
Belkî koka bavê te biqe.  
Belkî tu pala Emo şa bi.  
Bextê te reş be.  
Dara reş ber derê te bigere.  
La bêmiraz mirê.  
La mirazê te reş biyê.

---

<sup>240</sup> Çortan: Keşk, toraq.

<sup>241</sup> Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016 ;  
Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>242</sup> Gazî, *b.n.b.*, r.6-82.



Lê netûfa te qeliyayî.  
Lê palê şa bûyî.  
Miraz reş bî.  
Mirazê te biqurçime.  
Mirazê te çevê te da bimîne.  
Mirazê te çevê te da bimîne.  
Mirazê te neqede.  
Mirazê te zikê te da mayî.  
Tu xêrê mirazê xwe nebînî.  
Weylê şa nebûyî.  
Xwedê bextê te reş ke.  
Ziyayê zer bike, tu ti bext-miraza nevînî.<sup>243</sup>

\*\*\*

Bav û birê te bi miradê te şa nebin.  
Bextreşo / bextê te reş be.  
Ma şalê tu şa nebî.  
Miradê te di çavê te da bimîne.  
Miradê te di qirika te da biqurçime.  
Mirazê te di pozê te ra were.  
Mirazê te di qirika te da bimîne, tu şa nebî.  
Tu bê mirad herî.  
Tu şa nebî.<sup>244</sup>

### 2.2.7. Mirî û Mirin

Av negihe ser te.  
Car li serê te bêne hev.  
Eyd di ser te re derbas nebe.  
Girî ji mala we kêr nebe.  
Kurm bikevin laşê te.

<sup>243</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>244</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r.80-86.

Ocaxa te kor bibe.

Pepûk li te bixwînin.

Rebî tu eydê nebînî.

Rîş di laşê te de derkeve.

Taya mirinê bi te keve.

Tu bê îman herî.

Tu bê wêrt<sup>245</sup> biçî.

Tu bi saxî bikevî gorê.

Tu bibî komek hestî.

Wey kef bi devê te bikevî.

Xebera nexêrê ji te re were.<sup>246</sup>

\*\*\*

Bizrê we biqele.

Çira te vemire.

Dê û bavê te xêrê ji te nebîne.

E'mrê te qut bibe.

Ez cil û kincên te bi xêra te bidim.

Ez te bi xwelî bikim.

'Eyd di ser te re derbas nebe.

Goştê te bibe xwarina mişk û maran.

Goştê te mar û mişk bixwin.

Havîn di ser te re nebore.

Li te nebe sibeh.

---

<sup>245</sup> Wêrt: Tobe, îflas. Wert: Dûnde, silale, zuriyet, ûcax, dol û binemal.

<sup>246</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R.: 25. Îlon 2016.

Mal mîrat bûyo.

Mala te bi xelkê bimîne.

Malika wan li heft mîratan bigere.

Meytê te li ber tava havînê genî bibe.

Mezelê te nekeve nava tu mezela.

Pirtiyên te li asîman bin.

Serê te bixwe.

Topa Xwedê li te keve.

Tu bê mirad biçî.

Tu bi hesretê herî.

Tu bi saxî bikevî gorê.

Tu bi xewê kevî û jê ranebî.

Tu bibî şîva gura.

Tu di ava gû de bixeniqî.

Tu herî û qe venegerî.

Tu qe mezin nebî.<sup>247</sup>

\*\*\*

Deriyê te bête dadan.

Feleka te biqulibe.

Inşelah goştê te bibe xurê mişk û maran.

La lawo, min hewara Xwedê ku dê û bavê te xêr ji te nebînin.

Maşarê tu perçe perçe bibî û seg goştê te bixwun.

Maşarê ku gora te wenda bibe.

Tu ji sihê negehî tavê.

---

<sup>247</sup> Qadrî Yıldırım, *b.n.b.*, r.313 ; Zimanzan Hakan Çiftçi, *Devera Serhedê*, Gîhadîn-Agirî 1977. R: 19 Sibat 2016.

Tu bê kuştin, neyê şûştin.<sup>248</sup>

\*\*\*

‘Eyd û ‘erefat ser tera derbas nebe.

Berve gor bî/Ber bigor bî.

Destê min wê dinyayê pêsîra te da be.

‘Emrê te gulika biharê be.

Ez bême hewariya te.

Înşalah tu biwerimî.

Kok û urta we biqele.

Meytê te min îro be.

Ocaxa dayka te kor be.

Ocaxa te bişewite.

Sala te dor te venegere.

Sukûmê te winda be.

Şîn we kê m nebin.

Te nebe sibeh.

Tu bin tirekî<sup>249</sup> kevî.

Tu gor gor bî.

Tu gora xwe de nesekinî.

Tu herî qeda te ber piyê te be.

Tu zinara bikevî parçê te parî parî bin.

Waylê tu çuyî pelekî ketî.

Xwedê nehiştî.<sup>250</sup>

---

<sup>248</sup> Zeynelabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Îlon 2016.

<sup>249</sup> Tir: Tirêle û kamyonên dirêj.

<sup>250</sup> Mela Reşid Dündar, *Devera Serhedê*, Gimgim - Mûşê 1945. Ragihandin: 10 Çile 2016 ; Mela Arif Qêrekaya, *Devera Serhedê*, Kop – Mûş 1947. Ragihandin: 10 Sibat 2016.

\*\*\*

Qebra te tijî mar bit.

Înşalah kelehê<sup>251</sup> te gurk bixwet.

Roj ser te ava nebit.

Xwedê pişta te bişkênit.

Xwedê te negehînit sihar<sup>252</sup> ê. <sup>253</sup>

\*\*\*

Cesedê te xurê seyên har be.

Hûn weywey bikin.

Ji şahiyê şa nebî.

Meytê<sup>254</sup> te dijminan re bimîne.

Meytê te xurê kurmikan be.

Selaya te bibhîzim

Solên te ji min re bimînin. <sup>255</sup>

\*\*\*

Bavê te gorbikor be.

Ez gora te bikolim.

Ez meytê te veşêrim.

Ez meytekî te ra hazirbikim.

Ez reşê te girêdim.

Gorgorî, merivekî fesat bû.

Tu bi xwe va mirinê bikevî.

Tu hizura Xwedê rezil û ruswa bî.

---

<sup>251</sup> Keleh (kêlek) :Te'el , rex,al,teref,tenişt.

<sup>252</sup> Sihar: Sibêh, sipêde, seher û şefeq.

<sup>253</sup> Mihmed û Zerîfe Bateyî, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirnex 1973-1979. Ragihandin: 30 Cotmeh 2015.

<sup>254</sup> Meyt: Laş,cesed, beden.

<sup>255</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

Tu li erdê bimînî.  
Tu mehrumê mehdara pêxember bî.  
Tu rû reşê dîn û dinyayê bî.  
Xwedê belê bide te.<sup>256</sup>

\*\*\*

Bê ser û berate herî.  
Cejn û ‘eyd te bibe hesret.  
Ez şîna te nekim, tu bê şîn herî.  
Ez te bi gorê bikim.  
Ez te bin ‘erdê bikim.  
Gora te tarî be.  
Meytê te veşêrim.  
Rehma Xwedê ser te re derbas be.  
Sukûmê te erdê be.  
Tu bi lawîniya<sup>257</sup> xwe şah nebî.<sup>258</sup>  
Tu gencatî ya xwe nebînî.  
Tu gora xwe da nesitirî.  
Tu gorbîgor herî.  
Tu li serê riyan berate bî.  
Gundên we bi ser gundan re pîne pîne be.  
Tu mehrûmî cejn û ‘eydan bibî.  
Tu sêwî<sup>259</sup> bibî.  
Tu têkevî bin desta.

---

<sup>256</sup> Day Nisbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015.

<sup>257</sup> Ciwanî, gencinî.

<sup>258</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

<sup>259</sup> Sêwî: Bêdêûbav, êtîm, bêkes û bêxudan.

Tu têkevî ber destê min.

Tu pîs bimirî.

Ûrt ocaxa we biqele.<sup>260</sup>

\*\*\*

Av negihe ser te.

Ava tofanê li te rabe.

Bav (dê, bira, xwîşk, ap ...) lê mirî.

Bav li pêşiya kur ketî.

Bihar (havîn, payîz, zivistan) bi ser de nehatî.

Bi nalenal ji vê dinyayê bicehimî û herî.

Cihê wî cehneme be.

Cil û palaz te nehewînîn.

Di şîna bavê te de hêsirên te bimiçiqin.

Di hembêza<sup>261</sup> axa sar de bisitirî.

Di xewê de marek li te vede.

Emrê te emrê gûlika biharê be.

Emrê te kin/kurt bibe.

Emrê te pûç bibe.

Emrê te qut be.

Ez reşê te girêdim.

Girî ji mala we kêm nebe.

Gû li gorê bûyî.

Har bibî û li serê sergoyan bikevî.

Havîn di ser te re nebihure.

Hestiyên te birizin.

Ji îro dernekevî sibehê.

Ji kerban bimirî.

Kêranê xaniyê te bişkê.

Kilim kilim li ser daweta te nekeve.

---

<sup>260</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

<sup>261</sup> Hembêz (Hemêz, himbêz): Bersîng, bermil, pêsîr û koş.

Kilîta reş li derê te keve.  
 Kit ji mala te nemîne.  
 Koka te bibe koka gûlika biharê.  
 Koka we biqele/vemire.  
 Konê te bişewite û bibe rijî.  
  
 Konê te nekeve tev konan.  
 Kotan li koka we rabe.  
 Kotanê Eysa Pêxember li koka we rabe.  
 Li te nebe sibeh.  
  
 Mezelê te nekeve nava tu mezelan.  
 Mirin bi peretî bi dêst neketî.  
 Mirin xwestî, lê bi dêst neketî.  
 Şahî û seyrana te vegere şîn û merezan.  
  
 Min reş girêdayî.  
 Meytê te li erdê bimîne.  
  
 Pepûk bi ser te de bixwînin.  
 Ro li ser mala te neçe ava.  
 Roja ku tu qilim dilim dilîzî qeşmerok<sup>262</sup> bi te bilîzin.  
 Roja reş û qîra qijikê para te be.  
 Roja xwe nedîtî.  
 Sewta te bibire.  
  
 Stûyê te di ber te da bimîne.  
 Te rût bikin û daynin ser teneşirê<sup>263</sup>; lê segekî gurî ava te biçelpîne.  
 Tu bi saxî bikevî gorê.  
 Xebera nexêrê ji te re were.  
 Qir bi koka we bikeve.  
  
 Êrt qeliyayî.  
 Tu eydê nebînî.  
 War reş bûyî .

<sup>262</sup> Qeşmerok (Qeşmer): Qerfî, henekî, tirraneyî, tinazî û zarker. Kesê/a pêkenok.

<sup>263</sup> Teneşîr: Teneşo, texteşo û textê miriyan.



Xanî bi ser de tep bûyî.  
Xurê guleya bêbavekî bûyî.  
Xwedê bêîman kuştî.  
Xwedê bike kasika kembera te hemasa di ber xelqê de bişkê.  
Xwedê bike ku boçikan bi te ve girê bidin.  
Xwedê bineşe hesret/teberik kirî.  
Xwedê kindirê te biqetîne.  
Xwedê koka we biqelîne.  
Xwedê lê nehatî rehmê.  
Xwedê paşepêl li kerê siwar kirî.  
Xwedê rehetiyê nedê.  
Xwedê riswa kirî.  
Xwedê ruh standî.  
Xwedê te nesitirîne.  
Xwedê wêrtas kirî.  
Xwelî li sêrî bî.  
Stêrka te negihêje esmanê heftan.<sup>264</sup>

\*\*\*

Betila<sup>265</sup> te kurt bibe / Betila te kurt biyê.  
Çilên zavatiyê neçe ser laş û keleşê te.  
Derê te mor be.  
Dû ji mala te dernekeve.  
Ecêbên giran bên serê te.  
Ez bimrim ji we bifilitim.  
Fîstanê te li ser dilê te biçire / Fîstanê te li ser dilê te çiryao.  
Guliyên te kur û kem bibin li ser te<sup>266</sup>.  
Gulle li te keve, tu bi serad û bêjing bî.

---

<sup>264</sup> Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016; Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>265</sup> Betil: Emr, temen.

<sup>266</sup> Dema keçikek gurra diya xwe neke yanî bi ya wê neke, diya wê vê nifirê lê dike.

Heylê min ser xwendî.

Ji çavên te mij, ji dilê te xem kê m nebe.

Kaşkaşok û paşpaşoka<sup>267</sup> ser hesin ser te ra here.

Kezeba diya te li te bişewite.

Kezeba te li ber gulla here.

Mala te bimîne bê kebanî<sup>268</sup>.

Mala te bimîne bê malxwê.

Maşalê tu negê (negihê) ser azana serê sibê.

Mêjiyê te bibe şiv ji bavê te ra.

Mêjiyê te ji devê te bavêje.

Melkemût<sup>269</sup> rihê te bistîne / Melkemûtî rihê te stendî.

Mor û kilît devê te bikevê.

Tu azana mellê<sup>270</sup> sibê nebihîzî.

Tu bê ruh bimînî.

Tu bê şuştin herî.

Xesû û xezûrê te bimre.

Xwedê te zûka ji min bistîne.<sup>271</sup>

\*\*\*

Ava te zelal nebe.

Bav-birê te bimire.

Bê aqûbet bimirî.

Belkî meytê te ser stuyê mi be.

Belkî miriyê rûyê erdêvî.

Belkî necê: “Jinê bavê ser min.

---

<sup>267</sup> Kaşkaşok û paşpaşok: Tren, trê, şimendifer, qitar.

<sup>268</sup> Kebanî: Kevanî, jin, pîrek, afret, kulfet, xanim, xatûn, keybanû û bermalî.

<sup>269</sup> Melkemût: Ezrayîl, ruhstîn, melkemot û melekê mewtê.

<sup>270</sup> Mellê: Îmam, mela, rêberê olî, xoce, pêşîvan û zana.

<sup>271</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 6-82.

Belkî qijka reş jî pey te nekeve.  
Belkî tu bêaqûbet bî.  
Belkî tu bêîman bimirî.  
Belkî tu gora xweda qûn rûnêyî.  
Belkî tu heft tebekê binê erdêda heri xarê.  
Bikevî ber desta.  
Cegera te qul be.  
Çevê min te nekeve.  
Çûyîna te hebe, hatina te tinebe.  
Emrê te kin be.  
Erda sar da herî.  
Germ razêyî, sar rabî.  
Gor bi gor bî.  
Gorê da nesitirî.  
Hilgêra te hebe, dagêra te tinebe.  
Kevirê qulî bî.  
Kevirê te biqulibe.  
Kirasê reş xwe kî.  
Lê serî pê hilnedayî.  
Lingê te zengûyê da bimîne.  
Pêş mal nekevî.  
Razana te hebe, rabûn tinebe.  
Roja te reş be.  
Ser kelle erdê kevî.  
Serê te tim reş bivînim.  
Şîna reş serê te da bê.  
Şûna reş da herî.  
Tu bimirî, tekevî tabûta reş.  
Xwedê te bistîne.<sup>272</sup>

\*\*\*

Agir bi te keve / agir pêketo.  
Atara<sup>273</sup> we biqele / biqellihe.

---

<sup>272</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

Belqitiyê belqitî.  
 Çûyina te hebe, hatina te nebe / çûyina te hebe, hatina te tunebe.  
 Derî moro / Mor li deriyê te keve.  
 Emrê te qut be.  
 Gulla berbanga sibê li te keve.  
 Gulla serê sibê lêketo.  
 Gulla serê sibê li te keve.  
 Gurê har bi te bigre.  
 Kilîta reş li deriyê te keve.  
 Koka we biqeke / biqellihe.  
 Koka we vemire.  
 Kund<sup>274</sup> li deriyê te bixwîne.  
 Ma şalê tu bê melle<sup>275</sup> herî.  
 Marê kor bi te vede.  
 Marê reş bi te vede.  
 Mêjîyê te di pozê te ra were / Mêjî di poz ra hato.  
 Meytê te hilê / Meyt hilato.  
 Meytê te li erdê bimîne / Meyt li erdê mao.  
 Min ji te xêr nediyo / nedîto.  
 Ocaxa te kor be.  
 Ocaxa we ji kok da vemire.  
 Perçê mezin guhê te be.  
 Reşayî li mala te bigerî.  
 Ro lê hilnehato.  
 Ro li te hilneyê.  
 Ro li te nerî ava.  
 Topa ezmana li te keve.  
 Topa Xwedê li te keve.  
 Tu bê av herî.<sup>276</sup>  
 Tû bê kefen herî.

---

<sup>273</sup> Atare: Kom û komik, êl (bo musteqbel).

<sup>274</sup> Kund: Bum, pepûk, pû û firindeyek şevger.

<sup>275</sup> Bê melle çûyin: Bê qur'an û bê şuştin çûyin, mirin.

<sup>276</sup> Di maneya meytê te neyê şuştin e.

Tu ber xwe nebînî.  
Tu bi dora mi bigerî.  
Tu bî tu di ber destan kevî.  
Tu bî tu di gorê da nesitirî.  
Tu bî tu nebînî.  
Tu bî, tu bi avê herî / tu bifetisî / bixeniqî/.  
Tu bî, tu binepixî.  
Tu bikevî berdesta.  
Tu di ber lehiyê<sup>277</sup> da herî.  
Tu herî, tu venegerî.  
Tu ji ciyê xwe ranebî.  
Tu perçe perçe bî.  
Tu sêwî bimînî  
Tu têkevî ber destan.<sup>278</sup>

### 2.2.8. Reng û Rengdêrî

Mêjda em dizanin kû Kurd di nav rengan de herî zêde ji rengê “sor” hes dikin. Em xwestina mehrûmbûna ji vî rengî di nifirên Kurdan da jî dibînin. Wek mênak nifirên wiha hene.

Devê te li kevirê reş bikeve.  
Bayê sor bi ber devê te bikeve.  
Tu derpiyê sor li ber serê xwe nebînî.<sup>279</sup>

\*\*\*

Ava reş di çavên te de bê.  
Bextê te bibe bextê şîlana sor.<sup>280</sup>

\*\*\*

Ava şeve reşî têkeve çavên te.  
Bayê sor bi devê te bikeve.

---

<sup>277</sup> Lehî: Lêser, avrabûn, lêkend, lêmişt û lês.

<sup>278</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r.80-86.

<sup>279</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.315.

<sup>280</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

Delingeka we sor yek jî spî be.

Dergahe bavê te reş be.

Hundire te reş be.

Marê reş texe.

Pizikeka sor te de derkeve.

Tu derpiyê sor û spî xwe nebînî.

Tu şeve reş bî.<sup>281</sup>

\*\*\*

Sed kevirê reş pey te ve bin.

Ser tiliya te şirwe,<sup>282</sup> pişt pehnî ji we ve.

Derê te sor be.

Derpiyê sipî ber xwe nebînî.

Derpiye sor û zer li ber serê xwe nebînî.

Tiliya te bi hine nebe.<sup>283</sup>

### 2.2.9. Riziq û Debar

Aşê te bixeriqe.

Çingîn li tasa te bikeve.

Di mala we de şiv hebe, taştê nebe.

Ev newal tijî zêr bibin, libek nebe nesîbê te.

Heska te biqelişe.

Ji tîna zimanê te bibe gazez.

Kevçiyê te qul be.

Kodika te tijî nebe.

---

<sup>281</sup> Kek Îsmed Öner Taşuçanı, *Devera Serhed*, Qulp-Îdir 1960. Ragihandin: 20 Îlon 2016.

<sup>282</sup> Hilwe, vi yalî

<sup>283</sup> Mela Salihê Dihê, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016 ; Seyîd Beşîr Erzen û Mabata Wî, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2016.

Li ber deriyan bimînî .  
Li ber heft deriyan bigerî .  
Nan bibînî avê nebînî .  
Nanê baçîk<sup>284</sup> bi dest we nekeve.  
Nanê ceyî bi dest te nekeve.  
Nanê garis bi dest we nekeve.  
Nanê tisî bi dest te nekeve.  
Pel bi dara te ve neminin.  
Rizqê te ser pişta kevroşkê pêşbe.  
Star bi serê te nekeve.  
Stêrka te negihîje ezmanê heftan.  
Taştiya te hebe, şîva te tunebe.  
Tu avê ji teyr û tilûran bixwazî.  
Tu bi doxa kevçî negrî.  
Tu bi zêr bigrî, bibî xwelî.  
Tu li çolê bê av bimînî .  
Tu nanê gilgil<sup>285</sup> nebînî.  
Tu nebêjî xwezî bi îro.  
Yeka te nebî didu.  
Zêviya te zîwan bigre.<sup>286</sup>

\*\*\*

Çem û kanî ser we bimiçiqin.  
Ji xêran bêpar bûyî.  
Kalîna pêz ji ber derê te neyê.

---

<sup>284</sup> Baçîk: Tarîgan, çewdêr

<sup>285</sup> Gilgil: Garis, genimok, şamî û lazût.

<sup>286</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R: 25  
Îlon 2016.

Ji koç û keriyân bimînî.

Ji lillah ketî.

Kevçiyê te qul be.

Kevçiyê te zon negire.

Li ber deriyân bimînî.<sup>287</sup>

\*\*\*

Avê bibînî nê nêbînî, nê nêbînî avê nêbînî.

Çêtiyên te werin xwarê.

Çi girtî di dêst de pûç bûyî.

Çingînî li tasa te keve.

Çiraya te vemire/damire.

Çiraya te çirûsk bi ber nekeve.

Çîka te agir pê negire.

Debara te berî biharê biqede.

Delav neçe ser zeviya te.

Di mala we de şîv hebe, taştê nebe.

Di olama xelqê de mirî.

Dîzika te nekele.

Dû ji kuçikê te ranebe.

Dûman li ser kuleka te nekeve.

Ev newal tijî zêr bibin, libek nebe nesîbê te.

Girara<sup>288</sup> te nekele.

Heta ku xweş bî hemasa pale bî.

Heta mirinê qe tu rindiyê nêbînî.

Xwedê cil û nivîn lê heram kirî.

Xwedê hê lê hesret kirî.

Xwedê jê birî.

Xwedê kerema xwe lê nekirî.

Rezê we teriz lê xe.

---

<sup>287</sup> Day Nîsbet û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2016 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd- Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>288</sup> Girar: Xarina birinc, savar, maş, bilxur, nîsk, nok û lubî tê çêkirin.



Xwedê sitamî lê nekirî.  
Xwedê sûra rehmê ji ber dil derxistî.  
Xwedê şewqê nevêje mala we.  
Xwedê qe ji bintînan dernexistî.  
Goşt dîtî, diran bi dêst neketî.  
Lêkend her sê sexelên te bi ro de bibe.  
Zik lê têr nebî.<sup>289</sup>

\*\*\*

Dinya li ber çavên te reşbe.  
Ji taqet bikevî.  
Ji tînan sekî hilehil bikî.  
Li ber heft deriyan bigerî.  
Nan lê hesret bûyî.  
Nanê cehî/gêris bi destê te nekeve.  
Nanê te li ser pişta kêvrîşkê be.  
Pel bi dara te ve nemînin.  
Pelê dara te biweşin.  
Pişrûka hişk bi dest te nekeve.  
Qirika te şil nebe.  
Sêl nanê wî nepijîne.  
Sikûmê<sup>290</sup> te li min hesret bibe.  
Sitar lê hesret bibî.  
Şitla te hêşîn nebe.  
Şîva miriyan lê çûyî/lê hesret bûyî.  
Tî bûyî û arava kincan bi dêst neketî.  
Tî û birçî mirî.  
Tu hewciyê ker û kûçikan bî .  
Tu kes li deriyê te nexe.  
Tu li çol û çîyan şeveder bimînî.  
Tu li çolê bêav bimînî.

---

<sup>289</sup> Umît Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016.

<sup>290</sup> Sikûm: Wech, rû, şikl, dem û çaw.

Nan lê hesret bûyî.

Pars kirî.

Tûrê parsê li mil bî.

Tûrikê parsê ji destê te nekeve.

Heta ku xweş bî ji xelqê ra pale bî.

Zikê te têr nebe.<sup>291</sup>

\*\*\*

Înşelah tu pars bikî lê pars jî bi destê te nekeve.

Yeka te nebe dudo.

Yê te xwar, li te bibe jehr û ziqum.

Înşelah tu rezîl û riswa bî.

Înşelah tu bikevî ber van desta.

Min hewara Xwedê ku berîka te hertim (mîna tûrikê Elik û Fatik) qul be û tiştek tê de nemîne.<sup>292</sup>

\*\*\*

Bazinê<sup>293</sup> stûyê te bişkê.

Cûcika wî pirç pê ve neyê.

Çav li destan bibî.

Çavê te li deriya be.

Nenîkên te tunebin ku xwe pê bixwirînî.

Pişta xwe rast nekirî.

Tu ber bavêjî.<sup>294</sup>

\*\*\*

Cara (tu car) têrxwarînî li te tune be maşalê.

Heft kulavê rêşîn li bin te birize.

---

<sup>291</sup> Occo Mahabadî, <https://occomahabad.wordpress.com/2016/03/03/nifiren-kurdan-kurtlerin-beddualari/>. Ragihandin: 15 Avrêl 2016.

<sup>292</sup> Zeynelabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Îlon 2016.

<sup>293</sup> Bazin:Zend,best,bask û meçek.

<sup>294</sup> Civaknas Fatma Öner, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1972. Ragihandin: 21 Tîrmeh 2016.

Hesretiya te pariyek nan be.

Hîvya min ji Xwedê heye keda te nebe qîsmetê te.

Hîvya min ji Xwedê heye tu li ber mirina xwe tasek av ji min bixwazî û ez jî nedim te.

Hîvya min ji Xwedê heye tu qapî qapî (derî derî) li parsê bigerî.

Li ser ruyê dine da tin (tu) xweşiyê nebînî.

Maşala tu bî, dû di rojina te da hilnê / Dû di rojina te da dernekeve.

Nan tajî be, tu kêroşk bî.

Nanê we ji deriya be, ava we ji newala be.

Şekirê çayê li te bibe xesret.

Tu bê av û bê ked bimînî.

Tu bi parsê bikevî.

Tu bi porê jina xwe nan bixwî.

Tu bî, tu rêjberê xelkê bî, tu wer (her dem) rêjberiya xelkê bikî.

Tu motacî bav û birê xwe bî.

Tu motacî cîranê xwe bî.

Tu motacî dijmina bî.

Tu motacî evda bî.

Tu motacî gawira bî.

Tu motacî ker û kêçika bî.

Tu motacî tasek av bî.

Tu pêxwas û bêwar bimînî.

Tu qe têr nexwî.

Tu tu car têr nexwî, hew roja eydî (cejnê) tu têr bixwî, ew jî tu verşî.

Tûrikê parsê li milê te be, têrbîna te li dinê nebe.

Xwarin mala te de nemîne, tu bikevî ber desta.

Xwedê malê te ji te bistîne, tu parsê bikî.

Xwedê pergala te bela ke.

Yeka te nebe dudu, tu negihêjî heval û hogira.

Zikekî te têr be, deh zikê te birçî be.<sup>295</sup>

\*\*\*

Belkî destê xwe nedî ser zikê têr.

Belkî têr xarna te qe tune be.

Belkî teyrok zeviya te bikute.

Belkî tu şelê reş kêleka xwe nebînî.

Belkî xarna te bive jera mera.

Bîna bîso ji te neyê.

Bîna nên ji mala te neyê.

Çi mi ra dixazî bira bikeve kodka te.

Çi mi ra dixazî Xwedê bide te.

Dest bavêjî çi hişk be.

Dest bavêjî çi pêva neyê.

Dewê te ser pišta kêwrûşkê be, berdêy, bernedêy pêra neghînî.

Elk têkeve nav dilê te.

Genim bavêjî, ceh biçinî.

Kalîna pêz ber derê te neyê.

Kodka te welgere.

Kul ber ketî.

Lê kula kor xarî.

Lingê te erdê şîn nekeve.

Nanê te ser pišta xezalê be.

Rizqê te biqele.

Siyê ser xwe nevînî.

Tasê te biniqise.

Te bive miyê mera.

Timê çevê te deriya be.

---

<sup>295</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 6-82.

Tu rizqê xwe nexwî.  
Yeke te nebe duda.  
Zeviya te hêşîn nebe.  
Zikê te birçîna bike qure-qur.  
Zikê te qe têr nebe.<sup>296</sup>

\*\*\*

Çavê te li deriya be.  
Kalîna<sup>297</sup> pêz ji ber deriyê te neyê.  
Tu bi parsê kevî.  
Tu bî tu rizqê xwe nexwî.  
Tu têr nebînî.  
Tu têr nexwî.  
Yeka te nebe dudo.<sup>298</sup>

#### 2.2.10. Wesle û Parçe

Wesle tê wateya parçe, pird, qet, pişk, pilte, çêtî û beş ê. Ango gelemperî tiştêkî diçin parçe wê. Hinek ji hemîyê, çendek ji tevahiyê, hindêk ji gişê. Qedek nanî û firek avê bide min. Mînak: Daristan-dar, gulistan-gul.

Dema ku stû şikiya, mirin li pey e; dev û qirik navendên ziman, xwarin û vexwerinê ne; wezîfeya diranan girîng e, ji ber vî qasî, em dibînin, ku Kurdan di hinek nifirên xwe da cih danê daxwazên zirardîtina wesle û perçeyan jî.

Ba bi çongê bikeve.  
Bayê sor bi devê te bikeve.  
Çavên te birijin.  
Devê te li kevir bikeve.  
Dilê te bişewite.  
Diran di devê te de nemînin.  
Gerden heliyawo.  
Hestiyên te birizin.

<sup>296</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>297</sup> Kalîn: Dengê pêz.

<sup>298</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r. 80-86.

Mêjiyê te textan ve bizeliqe.

Qirika te şil nebe.

Stûyê te di bin te de bimîne.

Tiliya te bi hine nebe.

Tu her tim qiriktehl bî.

Zimanê te ji devê te vekişe.<sup>299</sup>

\*\*\*

Ba çonga te ketî.

Ba qiça te keve.

Dev û diranê te xirşin.

Serê te bişkê.

Tu çil û çolax bî.

Zimanê te li ber diranê te keve.

Zimanê te reş be.<sup>300</sup>

### 2.2.11. Xwarin û Vexwarin

Av negihe ser te.

Ji tîna zimanê te bibe gazek.

Li te heram be.

Li te jehr û ziqûm be.

Nan bibînî avê nebînî.

Nanê tisî bi dest te nekeve.

Taştiya te hebe, şîva te tunebe.

Tu avê ji teyr û tilûran bixwazî.

---

<sup>299</sup> Qadrî Yıldırım, *b.n.b.*, r. 316 ; Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>300</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

Tu bi doxa kevçî negirî.

Tu li çolê bê av bimînî.

Tu serê mar bixwî.<sup>301</sup>

\*\*\*

Tu nan bibînî dew nebînî, dew bibînî nan nebînî.

Tu nan û dew bikevî.<sup>302</sup>

\*\*\*

Bibe dasî û bikeve qirika te.

Di ber te de bimîne.

Di firnikên te re were.

Di pozê te ve were.

Jehr be, li te bibe jehr.

Li te bibe goştê berêz.

Li te nebe sibeh.<sup>303</sup>

\*\*\*

Ji tîbûna ezmanê devê te biqele.

Ji tîna 'esmanê devê te bizeliqe.

Li te ziqum û axû be.

Loqma te û hêsrê te bi hev ra bin.

Nanê te deriyan û şîva/ şîrê te keriyane be.

Qet li te negivire.

Tu jehrê bixwî.

Tu kulê bixwî.<sup>304</sup>

---

<sup>301</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r. 313.

<sup>302</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

<sup>303</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R: 15  
Îlon 2016.

\*\*\*

Di aranê de mayî.  
Di ber de jehr bî.  
Di ber de jehra marê reş bî.  
Di ber de mayî.  
Di ber doza xelqê de herî.  
Di ber te de bimîne.  
Di firmikên te re were.  
Di pozê te re were.  
Lê zeherman bî.

Di xeneqa te de bimîne.  
Bixwî; lê sekî pê vereşî.  
Jehr bi ber ketî.  
Kul bi ber ketî.  
Li ber çêm ji tînan bimirî.  
Li te postê berazan be.  
Li te xwîna xinzîr be.  
Li te zeher û ziqûm be.  
Xwarina te gil û gemar be.<sup>305</sup>

\*\*\*

Kerratiyê<sup>306</sup> vexwe, (bixwe).  
Kûçik li kezeba te taştê bixwe.  
Quzilqurt û kureder.  
Quzilqurt û tetirxan.<sup>307</sup>

## 2.2.12. Zarok (Kur û Keç)

Dengê zarokan neyê guhê te.

---

<sup>304</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015 ; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin:15 Sibat 2016.

<sup>305</sup>Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016. Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>306</sup> Keratî: Ziqûm, quzilqurt.

<sup>307</sup> Gazî, *b.n.b.*, r.6-82.



Kurê te bi tendûra kel bikeve.

Ocaxa te kor bibe.

Rebî lolo di mala we de nemînin.

Waqîna zarokan neyê guhê te.

Wey mîza ewladê nêr li dawa te nekeve.<sup>308</sup>

\*\*\*

Belg bi dara te ve nemînin.

Belgên dara te biweşin.

Dola te dola ‘Eliyê Mîrze be.

Lawo. Oxira te nexêr be.

Mîza ewladên nêr dola te nekeve.

Qijeqija zarokan ser we nekeve.

Rûçikê te kulîlka biharê be.

Rûçikê te min îro be / hesret be.

Tu bi hesreta zarokan bî.

Tu vê dinyayê bê kur bimînî.

Warê te reş be, tu ‘ejîniya zaran nebînî.

Xwedê bedena te hêşîn neke.<sup>309</sup>

\*\*\*

Lawo, tu bela xwe ji ber nigên xwe bibinî.

Lawo, tu bela xwe ji destê xwe bibinî.

Lawo, tu xêrê bikî, xêrê ji xwe nebînî.

Xwedê zarûkên te têxe ber destan.

Tu qet mezin nebî.

Maşarê tu kordûnde<sup>310</sup> herî.<sup>311</sup>

---

<sup>308</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.313.

<sup>309</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>310</sup> Kordûnde (dûndan, dûnde): Bidûde ketin-zarok jê re peyda nebûn. Wate: Dol, ûcax, wert, zuriyet.

\*\*\*

Baca te bidim.

Hejinî bi ziman keto.

Tu bê dundeh bî.

Tu ji fêkiyên malê mehrûm bî.<sup>312</sup>

\*\*\*

Dara te şîn nebe.

Înşeleh tu berbavêjî (bi tenê ji bo jinan).

Serê wî di nav zilaman de bilind nebe.

Tu bê dûnde herî.

Waqîna zarokan neyê guhê te ( ji bo jinan).

Xwedê te bihêre û nehêle.<sup>313</sup>

\*\*\*

Destên te hêleçanan nehejînin.

Xwedê atara te bibirîne.

Ewledê ewledê te xêrê ji te nebîne.

Heylo tu ji bav û kalê xwe re nebiyî zelum.

Pore te li ser te kur be.<sup>314</sup>

Qîzê Xwedê qe lawa û qîza nede te.

Şîrê min li te heram be, li ber çavê te çira kora be.

Tu bi qurbana zarokê xelkê bî.

Tu di ber destê ap û amojna kevî.

Tu xêrê ji kurê nekî.

---

<sup>311</sup> Zeynelabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts> .Ragihandin: 25 Îlon 2016.

<sup>312</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

<sup>313</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R: 25 Îlon 2016.

<sup>314</sup> Ve nifire li keçikan dikan.

Tu xêrê ji mala xwe, ji zarokên xwe nebînî.

Xwedê te bêweled bihêle.

Xwedê te korîcax bike. (Qûlû/Qonya)

Xwedê warê te hêşîn neke.

Xwedê warê te kor bike.<sup>315</sup>

\*\*\*

Bedena te şîn nebe.

Belkî dengê dergûşa<sup>316</sup> kurîn nekeve guhê te.

Belkî dergûşa kurîn nedî ber hemêzê.

Belkî kurê filankesê bimire, cegerê wê qul be.

Belkî lûrî nekî.

Bêşik kurîn nehejînî.

Derdê cegerê nebînî.

Dergûşê kurîn nebînî.

Du seriya ser belgîkî nebînîn.

Guliyê te jêbe ser birê te da.

Guliyê te jêkim heft kêra, heft dûzana.<sup>317</sup>

Kurê te bimire.

La porê te kur biyê.

Lê dûndayê te qeliyayî.

Lê rûyê te reş bûyî.

Lê serê te kur biyê.

Mirazê te kurê te nebe.

Warê te reş be.

Weqîna kura nekeve guhê te.

Weylê neban bûyî.

Zarê te nanê te bîrkin.<sup>318</sup>

\*\*\*

---

<sup>315</sup> Gazî, *b.n.b.*, r.6-82.

<sup>316</sup> Dergûş: Bêşik, hêleçan, çinçîl, landik, mehdik, hêlik, hêlanek.

<sup>317</sup> Dûzana: Jilêt, cilêt, cilêt û devik.

<sup>318</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

Gulî kurbiyê.  
Lawo, lawo tu xêrê bikî, tu qe nebînî.  
Porê te kur be / Por kurê.  
Tu ji ciwaniya xwe xêrekê nebînî.<sup>319</sup>

### 2.2.13. Zewac û Malbat

Bûka te di mala bavê xwe de bimîne.  
Heneya zavayan/bûkan li kefa destê xwe nebînî.  
Li te bimbarek nebe.  
Kulfetê te li te gurê har be.  
Dara te hêşîn nebe.<sup>320</sup>

\*\*\*

Benikê konê te biqete.  
Brûsk li mala te bixe.  
Derîkê mala bavê te girtî be.  
Konê te bişewite.  
Mala te belav bibe.  
Mala te kirkirkê êzîdiyan be.  
Mala te li ser pişta xezalê be.  
Mala te ne ava.  
Mala te xera bibe.  
Malik li te bela bibe.  
Stûna xaniyê te bişewite.  
Şape li mala te bikeve.  
Warê bavê te bibe kavi.<sup>321</sup>  
Xwedê mala te bi serê te da bixelê.

<sup>319</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b*, r.80-86.

<sup>320</sup> Umît Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016.

<sup>321</sup> Kawil: Wêran, kambax, xirabe, xopan, xirabûy, hereffî.

Xwedê şewqê navêje mala we.<sup>322</sup>

\*\*\*

Kul di mala te keve.

Mala te serê te bixwe.

Malik wêran bûyî.

Ocaxa te kor, deriyê te mor be.

Reş miraz bî.

Tu mirazê min nebînî.

Stêrka te biquli be.<sup>323</sup>

\*\*\*

Min hewara Xwedê û Pêxember ku agirê kulê bi mala bavê te bikeve.

Hey lawo ez çî bêjim, hema bila mala te bi serê te da hilweşe, çewa ku va ye bi serê me ve hildiweşînin.

Hey lawo, malika te here mîratê.

Hey Siltano, maşarê tac û text li te wenda bibin.

Maşarê Agirê semawatê têkeve mala te û kitik nemîne.

Min hewara Xwedê ku malik li te belav bibe.

Maşarê agir bi loda te bikeve.

Mala te here mîratê.<sup>324</sup>

\*\*\*

Agir mala we xe.

Bendkê konê we biqete.

Birûsk konê we xe.

Dîreka xaniyê bavê te bişkê.

Hûn malê xwe nexwun.

Kul derê bavê te bigire.

---

<sup>322</sup> Qadrî Yildirim, *b.n.b.*, r.314.

<sup>323</sup> Cıvıknas Fatma Öner, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1972. Ragihandin: 21 Tîrmeh 2016.

<sup>324</sup> Zeynalabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Îlon 2016.

Kunda kor warê bavê te keve.  
Mala bavê te biherikê û ava nebe.  
Mala te serê te da hilşê.  
Mala te wêran be.  
Mala we mîrat bimîne.  
Mala we nebe kifiyetê<sup>325</sup> we.  
Mala we serê we bixwe.  
Mala we serê we de xirab be.  
Mala we serê we de xopan be.  
Reşê bav û birayên te serê xwe girêdim.  
Roja te reş be.  
Stûna konê we bişkê.  
Şexte mala bavê te keve.  
Tu mal mîrat bimînî.  
Ûrta te kor be, pişta te tu kes nemînê.  
Warê bavê te reş be.  
Xwedê bûkan meke nesîbê we.  
Xwedê gundê we li ser gundan pîne pîne bike.  
Xwedê konê te dayne.<sup>326</sup>

\*\*\*

Bûkaniya te li dîwêr bimîne.  
Malxera we dinya kire dojen.<sup>327</sup>

\*\*\*

---

<sup>325</sup> Kifiyet: Nesib, qismet, enîvîs, çarenivîs, qeder, şans, rojgar, siûd, talîh, felek, bext.

<sup>326</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945, Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>327</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

Çîka te biqete.

Derîkê mala bavê te girtî be.

Kit ji mala te nemîne.

Kul di mala te bikeve.

Mala te bi xelkê bimîne.

Mala te li ser pişta xezalê be, tu bidî pey kûsî.

Malika wan li heft mîratan bigere.

Qotik bi mala te bikeve.

Top li mala te keto/ ketê.

Tu heft salan mala bava nebînî.

Xwedê şewqê navêje mala we.<sup>328</sup>

\*\*\*

Agir bi derê te keve.

Agir bi mala te keve.

Agir bi ser we de bibare.

Agir bikeve mala te.

Agir di tifika (tenûr) te da nemîne.

Agir li loda te bikeve û tu xwe li ber germ bikî.

Agir li mala bavê keto.

Brûsk li mala te bixe û tu tenê ji nav da herî.

Mal mîrat bûyo.

Mal şewitiyo.

Mala bavê te bişewite.

Mala bavê te xirab bibe.

Mala te belavbelavî bibe.

Mala te berê bayî bikeve.

Mala te bi serê te da bixele/bihelişe.

---

<sup>328</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklora-kurdi-3.html>.R: 25  
Îlon 2016.

Mala te bibe kelefe û kelefe jî bibe warê bûman.  
Mala te bişewite.  
Mala te here ber mîratê.  
Mala te here devê kulê.  
Mala te ji xelqê re bimîne.  
Mala te kerkene bibe.  
Mala te li ser pişta xezalê be û tu bidî pey kûsiyî.  
Mala te pîneyê malan bibe.  
Mala te qefa kendalekî be û kendal bi ser de hilweşe.  
Mala te serê te bixwe.  
Malik bûyî hêlîna kundan.  
Malik lê mîrate bûyî.  
Malik wêran bûyî.  
Malika wan li heft mîrateyan bigere.  
Ocaxa te kor be.  
Ocaxa te kor, deriyê te mor be.  
Ocaxa we ji kok da vemire.  
Stûna bavê te bişkê.  
Stûna xaniyê te bişewite.  
Teşta te êrd negire.  
Text û tacê te belav bûyo.  
Warê te perê merzelan be.<sup>329</sup>

\*\*\*

Aşî<sup>330</sup> ser mala te de bit.  
Bager konê te xira ke.  
Bêtifaqî di mala te keve.  
Lehî li we rabe, tova we ji kokê rabe.  
Pergala<sup>331</sup> te xera be.

---

<sup>329</sup> Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015 .; Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016.

<sup>330</sup> Aşî: Berfende, şepe, basû, şetele, şape, lehî.



Singê konê te bişkên.

Tu bê war û bê kes bimînî.

Tu xêrê ji mala xwe û ji canê xwe nebînî.

Ûrt<sup>332</sup> û ocaxê we rabe.<sup>333</sup>

Ji min hewara Xwedê ku tu li ser zîn û zengû nebiriqî.<sup>334</sup>

Keçê tu bî, kes te nexwaze, heger bixwazin, te şûnda berdîn.

Tin (tu) kirasê jina xwe li xwe bikî.

Tin (tu) mêra bera xwe de nebînî.

Tin (tu) nebî mêr neçî nav mêra.

Tu bi zavahiya xwe şa nebî.

Tu hişk bî, bedena te şên nebe.<sup>335</sup>

Tu jinbî bimînî.

Tu li ser hev du qîza binî.

Tu xêrê ji jina xwe nekî.

Tu xêrê ji mêrê xwe nekî.

Xwedê min ji te bistîne yeka nebaş li te derxîne.<sup>336</sup>

Xwedê yekî keçel û ser rizî bike nesîbê te.

Xwesî were ser te.

Hêwî were ser te.

Zuriyet ji te çênebe.<sup>337</sup>

\*\*\*

Belkî hebinê te tu kevirî negere.

---

<sup>331</sup> Pergal: Nîzam, sazûman, dîzen.

<sup>332</sup> Ûrt: Tuxm, zurriyet

<sup>333</sup> Gazî, *b.n.b.*, r.6-82.

<sup>334</sup> Ev nifiran hanê ji keçikan re tê gotin yanî tu nebî bûk.

<sup>335</sup> Ev nifira ji bo keçikan tê gotin, yanî zarok ji te çênebin.

<sup>336</sup> Jin vê nifirê li mêrê xwe dikin yanî ez bimirim Xwedê jineke xirab bike nesîbê te.

<sup>337</sup> Gazî, *b.n.b.*, r. 6-82.

Belkî singê te ciyê kevir bê kutanê.

Belkî singê te nesene.

Belkî singê teyî kona neyê kutanê.<sup>338</sup>

\*\*\*

Ar<sup>339</sup> di mala bavê keto / ar bi mala bavê keto.

Ar di mala te keve / ar bi mala te keve / ar bi malê keto.

Argûnê te ji kok da vemire.

Argûnê<sup>340</sup> te vemire.

Mala bavê te bişewite.

Mala bavê te xirab bibe.

Mala te wêran be.

Mala te xirab be / Mal xirabo.

Tu bê war bimînî.

Tu xêrê ji mala xwe nebînî.<sup>341</sup>

\*\*\*

Agir mala te keve.

Belkî bêdadî<sup>342</sup> mala te da bê.

Belkî derê te neyê girtinê.

Belkî rep mala bavê te keve.

Belkî warê te şîn nebe.

Birûsk mala te keve.

Birûsk şêmîka texe.

Birûskê qapiyê te xistî.

Delinga te delinga mêra nekeve.

Hal bikeve mala te.

Heft mêra bigerî.

Hîmê mala bavê te serobin be.

Hîmê te hilşê.

Hînê te bive hîmê Gurdemîr.

---

<sup>338</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>339</sup> Ar: Agir, adir, ataş.

<sup>340</sup> Argûn: Tifîk, kuçik; bi taybetî ji bo xwe germkirinê bikartînin, ango di şûjta sobeyê de tê bikaranîn, lê wek şikil dişibe tifîkê, şomîneyê.

<sup>341</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r.80-86.

<sup>342</sup> Bêdadî: Neheqî, bêdaletî, tade, zilm û stem.

Jina te mala bavê vegere.  
Kilîta reş derê te keve.  
Kilîteke heft pûtê derê te keve.  
Konê te reş be.  
Kula Helebê têkeve mala te.  
Kula kor beyt-ocaxê bavê te ketî.  
Kula kor qapiyê te ketî.  
Lê qapiya te deverû bûyî.  
Lê qapiya te hilşiyayî.  
Lêyî mala te rabe.  
Mala te ber tofanê here.  
Mala te here ber mîrata.  
Mala te ser mala bela be.  
Mêrê te bimire serî te bigere.  
Ocaxa te bitemire.  
Şipûk ser mala bavê te da bibare.  
Tu xêrê mala xwe nebînî.  
Weylê derî lê xitimî.  
Xwedê mala bavê te xirab bike.  
Xwedê mala te bişewtînê.  
Xwedê ocaxa te şên neke.<sup>343</sup>

\*\*\*

Înşalah<sup>344</sup> warê te hêşîn neyê.  
Nale nala te bê min.  
Qebeheta şevê bi serê te de were.  
Penêrê min ê ter ber pîyê we be.  
Bila Rebbê alemê tu bela nede can bila bide mal.  
Mêrko bila bela te ber piyê te be.  
Hûn sax herin û silamet warnê.  
Mal,mezelê te ava be.  
Şeytan te bilîze.

---

<sup>343</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>344</sup> Înşallah: Maşale, maşallah, ma şaleh û îşale.

Mirazê te ber pêşira te be.  
Mirazê te reş be.  
Miraz reşî bî.  
Çobelan niqulê te xe.  
Çobelanê herî.  
Rûhstîn bibe mêwanê we.  
Xwedê rûhê te bistîne.  
Tu zikêşê herî.  
Zikêş te bigre.  
Simêl hesret bûyî.  
Rebbê alemê me nede şermê.  
Emegê min xenimî we be.  
Mêrko tûrkê te ser pişta kûsî be.  
Xwedê mala te bişewitîne.<sup>345</sup>

#### **2.2.14. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan**

Sukûmê te min îro be.  
Şexte li texe, çiqasî virekî.  
Tu çav vekirî herî.  
Tu her herî xêr nezivirî.  
Tu şîva gura bî.  
Xwedê ser te da bigre.<sup>346</sup>

\*\*\*

Behr ser te bimiçiqe.  
Stûyê te bin pîlê te keve.  
Topa Seddam li te keve.  
Ûris li te rabe.<sup>347</sup>

---

<sup>345</sup> Dr. İsmail Kiran, *Devera Serhedê*, Gundê Adirê-Wan 1970. Ragihandin: 21 Avrêl 2016.

<sup>346</sup> Day Nîsbet Öner û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Tîrmeh 2015; Mela Mûsa Celalî, *Devera Serhedê*, Bazîd -Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.

<sup>347</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Devera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

\*\*\*

Arîkê te li esman bin.  
Baskên te bişkên.  
Eskerê romê bî jê xelas nebî.  
Heft kevir pêşiya te heft kevir pey te bin.  
Kenê te gewriya te de bimînê.  
Serê te bin bîçerê bikeve.  
Şûr li iskura te keve, tîr li bedena te keve.  
Tasa we bineqise.  
Tiliya te henê de neçike.  
Tu her tengasiyê de bî, firaqetiyê nebînî.  
Tu qulqulî bî.  
Wey lê tu kor bî.  
Wey lê xwe bilî.<sup>348</sup>

\*\*\*

Av têkeve mêjiyê te.  
Goştê te zer be.  
Înşallah te'êla xwe, xwe ra kaşkî.  
Tu pêpikcotî bî.<sup>349</sup>  
Waynê te'el reş bî.  
Xwedê heqê min te bistînê.  
Xwedê te pirtî pirtî ke.<sup>350</sup>

\*\*\*

Mala te ser û binda bişewitê.

---

<sup>348</sup> Mem Artemêt, *b.n.b.*, r. 66.

<sup>349</sup> Pêpikcotî: Pêpikên te cot bin.

<sup>350</sup> Malbata Feyzullah û Fayîme Îlerî, *Dervera Serhedê*, Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.

Mêrê te bimre.

Sancî zikê te ketî.

Xwedê qapûyê xêrê te venekê.<sup>351</sup>

\*\*\*

Bê belkî baznê stûyê te bişkê.

Bişalê kurm di te kevin .

Bişalê tu bi hevva reş bibî .

Heft ecebên giran bê serê te.Maşarê serê te li tehtekî bikeve.

Maşarê tu kût bibî.

Maşarê Xwedê te kor bike.

Min hewara Xwedê ku stuyê te bişikê.

Birûsk li te keve

Maşarê kevir û kuçik li te bibarin.

Tu xêrê jê nebînî.

Ocaxa mala bavê te kor be.

Tofan li te keve.

Tu li piya bî goştê te li erdê be.

Tu mezin nebî.

Tu xêrê ji xwe nebînî.<sup>352</sup>

\*\*\*

Kevir û kuçik li te bibarin.

Tu car riya te rast neçe.

Tu hewceyî agir û kuçikan bî.

Tu ji herdû çava bibî.

Tu ker û lal bibî.

Topa Xwedê li te keve.

---

<sup>351</sup> Brahîm û Newroz Kurdî, *Devera Rojavayê*, Kamîşlo 1976-1978. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>352</sup> Zeynelabidin Zinar, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Îlon 2016.

Tu xêrê ji xwe nebînî.

Tu, qet tu gûna nebînî.

Qanser lê hato.

Tu, tu gûna nebînî.

Xûn di dev ra hato.

Cegera te bişewite.

Xwedê te bike kevir.<sup>353</sup>

\*\*\*

Agir bi ser we de bibare.

Agir di tifika te de, nemîne.

Ba bi çongê te bikeve.

Bayê sor bi kezeba te bikeve.

Bizrê we biqele.

Bûk di çavê te de şîn bibe.

Cihê wî cehneme be.

Çavên te birijin.

Çermê te biwere.

Deriyê te, bi heft hejên guhîjê girtî bin.

Devê te li kevir bikeve.

Felek li serê te bigere.

Goştê te bihele.

Gula çapliyê li bin çengê te bikeve.

Hestiyên te birizin.

Hey top li serê te keto/ê.

Înşeleh, kevir bi ser we de bibarin.

---

<sup>353</sup> Kek Nesîm Erziromî, *Devera Serhedê*, Tekman-Erzirom 1969. Ragihandin: 11 Çile 2016.

Kezeba te qul bibe.  
Li dinya dî destê Şêx Evdilqadir di pêşîra te be.  
Li te nebe sibeh.  
Me ra rebî-xwedê li te neyê rehmê.  
Moz bi gunê te ve de.  
Nava gunên te bixure.  
Oxira te ne ya xêrê be.  
Qeremê te bişikîn.  
Qorika te bişikê.  
Rebî tu çiçiqî bibî.  
Rebî tu har bibî.  
Rûreşî bi ser te de bê.  
Stûyê te bişikê.  
Te qirika min tehl kir, xwedê ya te jî tehl bike.  
Topa xwedê li serê te bikeve.  
Tu bi hesretê herî.  
Tu bi xewê kevî û jê ranebî.  
Tu bi xwe ve mijûl bî, me ji bîr bikî.  
Tu bibî benîştê devê xelkê.  
Tu bibî komek hestî, bikevî ber vî destî.  
Tu bibî piç û parî, her perçeyekî te, di tûrekî de veşêrin.  
Tu bibî piç û parî.  
Tu bikevî ber destê dêmariyan.<sup>354</sup>  
Tu di ava gû de bixeniqî.  
Tu dîn bibî bi çiya bikevî.

---

<sup>354</sup> Dêmariyan (dêmarî-damarî-deymarî): Zirdê, jinbav, zirdayk, jinbab.



Tu dîn bibî bi laşê xwe bikevî.  
Tu hûr bibî, piçên te li esmanan bikevin.  
Tu ji her du çavan xitim bibî.  
Tu li çol û çiyayên şevêder bimînî.  
Tu nebêjî ox.  
Tu xêrê ji xwe nebîne.  
Tuxmê we biqele.  
Wey diran di devê te de nemînin.  
Xezeb li te bibare.  
Xwedê jê standiyê, Xwedê belê bide.  
Zimanê te ji devê te vekişe.<sup>355</sup>  
\*\*\*  
Agir pê ketî.  
Agir te germ neke.  
Aşê te bixeriqe.  
Bendê piştê te biqete.  
Benikê doxîna te biqete.  
Ber avêtîyê.  
Bêriya berazan li hevşiyê te be.  
Bibî xweliya êrgûn.  
Bi ro de çuyî.  
Birûsk li te keve .  
Birûska esmanê heftan lê ketî.  
Bizrê we biqele.  
Bûk di çavê te de şîn bibe.  
Çav kor bûyo.

---

<sup>355</sup> Hesên Kaya, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-kurdi-3.html>. R: 15  
Îlon 2016.

Cirma xelqê were ber derê te.  
Çavên te çavên Çeko bibin.  
Dengê te bibire.  
Dest kişiyayî.  
Destan dar negirtî.  
Dev li te negere.  
Dev li te xwar bibe.  
Di erdê de herî xwarê.  
Erd li ber piyan qelişî û tê de çûyî.  
Erd li per piyê te veqelişe, heta navikê tê de herî xwarê û kes dest nevêje te.  
Erd û esman li te bên hev.  
Ewk li te biqelişe û şûjin bi dest te nekeve.  
Ewkê te bibe rîs û bi te ve dar de bibe.  
Herî, qe venegerî.  
Hevalê kûçikan bûyî.  
Hevalê telaqreşan bî.  
Hêşiya konê te biqete.  
Hûn bibin gurê serê çileyên û bi hev de bikevin.  
Ji binî ve hejjiyayî.  
Kepaze bûyî.  
Kevir û kuçik li te bibarin.  
Kevirê te li ser kêvir nemîne.  
Kumê te tu carî tel nebe.  
Kuştîyê di ber xelqê de bî.  
Kûçikê har te bigire.  
Lawo lawo tu xêrê bikî, tu qe nebinî.  
Lebat di çongên te de nemîne.  
Lehî li sexeleyê te xe.  
Leteme<sup>356</sup> werin ber derê te.  
Lê binêrî û bibehecî.

---

<sup>356</sup> Leteme: Şilşeht, nejêhatî, destsist û seqer.

Li ber bobelîskê çûyî.  
Li ber deriyan bimînî.  
  
Li hevalan binêrî û bihelî.  
Li min av û xwîn bûyî.  
Li pêş xelqê bendikê doxîna te biqete.  
Li serê sergoyan ketî.  
Menzîl qut bûyo.  
Mero! gur li te bicivin û goştê te ji hestiyar bikin.  
Mêjiyê te di pozê te ra were.  
Mêjî tev li hev bûyo.  
Mêjî vala bûyo.  
Min ji te xêr nedîto.  
Mitikê<sup>357</sup> ketiyo.  
Mîza şêtîn tev be.  
Mor li deriyê te keve.  
Moz bi gunên te vede.  
Moz bi zimanê te vede.  
Nav neketî nava deftera mişkan jî.  
Navê te agir, dostê te barût be.  
Ne ji Xwedê tirsîyayî ne jî ji bendeyan şerm kirî.  
Negihiştî kêrê.  
Neyarê te bibe qiraskê serê te.  
  
Nivîn lê pîj hatî.  
Oxira te ne ya xêrê be.  
Oxira te oxira Qolo be.  
Oxira te oxira Zahirê Kerî bibe.  
Para guran bûyî.  
Parçeparçeyî bibî û parçeyê te yî herî mezin guhê te bimîne.  
Parçê mezin guhê te be.  
Perdeya rûyê te biqete.  
Piyê te bi ber piyê te nekeve.

---

<sup>357</sup> Mitik: Gotik,xeneqtk,boğmaca.

Pîj bi çavê te re here.  
Porê te kur be.  
Qe gir nebî.  
Qe mezin nebûyî.  
Qijdeyê te li min teberik bibe.  
Qijik bi ser ketî.  
Qijika qijikê bi ser ketî.  
Qijika reş bi ser ketî/bi ser te de hatî.  
Qijikan çav derxistî.  
Qorika te bişkê.  
Rêx bi ber ketî.  
Rojê bi qaydekî biçilmisî û bipişirî.  
Rûçikê te li min hesret bibe.  
Rûreşî bi ser te de bê.  
Se û kûçik li te rêz bin.  
Sed û bîst û pênc caran bihetikî  
Seg bi ser de vereşî.  
Segekî kefen revandî.  
Segkî bicehimî.  
Serê te bixwe.  
Serê te li kevirekî bikeve.  
Serê te qe bilind nebe.  
Serê wî di nav mêran de bilind nebe.  
Serî qûç bibe, binî pûç bibe.  
Star bi serê te nekeve.  
Stû şkestî./Stûyê te bişkê.  
Stûyê te di heftê cihî de bişkê.  
Sûra rehmê di dil de nemayî.  
Şapat bi ser te de were.  
Şetele li te bikeve/rabe.  
Şeteleya bihar û payîzan lê ketî.  
Şexte li te xe.  
Şeytan guhê te de bimîze.

Taşirxanî bûyî.  
Te keziya min qusandê.  
Tepa xelqê hemasa li sêrî bûyî.  
Tertexanî bî.  
Teşqe le pêşîra te bernedin.  
Têr nexwarî.  
Tiliya te bi hine nebe.  
Tirtûl bi ber ketî.  
Tîra Xwedê lê ketî.  
Top lê keto .  
Topa Xwedê lê ketî.  
Topa Êris li te keve.  
Tu bext-mirada nebînî.  
Tu bê dûnde herî.  
Tu bêmiraz herî.  
Tu bêûrt herî.  
Tu bêwêrt biçî.  
Tu bi guleyeke neşûştî herî.  
Tu bi halê ne tu hal kevî.  
Tu bi wê hesretê herî.  
Tu bi xwe de bikevî û zirara te negihêje tu kesî.  
Tu bibî beniştê devê xelqê.  
Tu bibî jûjî.  
Tu bibî komek hestî, bikevî ber vî destî.  
Tu bibî movik û hestî.  
Tu bibî piç û parî û her parçeyekî te di tûrekî de veşêrin.  
Tu bibî piç û parî.  
Tu bibî şîva guran.  
Tu bi kefa segê har herî.  
Tu bikevî ber destê dêmariyan.  
Tu binerd bî.

Tu biqurçimî.  
Tu car riya te rast neçe .  
Tu çiqçiqî bibî.  
Tu di ava gûyî de bixeniqî.  
Tu firofehşî bibî.  
Tu gûnê nebînî.  
Tu har bibî.  
Tu heft salan mala bavê xwe nebînî.  
Tu herî, bêser û bêberate herî.  
Tu ji destê xwe bibinî.  
Tu ji kokê ve biqurçimî.  
Tu porê xwe bi ser bav û birayên xwe de kur bikî.  
Tu qe mezin nebî.  
Tu qe tunebî.  
Tu rezîl û riswa bibî.  
Tu sêwî bibî.  
Tu şeveder bimînî.  
Tu têkevî ber destan/destê min.  
Tu tim qiriktehl bî.  
Tu tu/qet tu gûnan nebînî.  
Tu tu xêrê ji xwe nebînî.  
Tu û şahî rastî hev neyên.  
Tu xweş bî, di halê reş de bî.  
Tu xweş bî, hemasa nexweş bî.  
Tuxmê we biqele.  
Tuxmê/tûra we biqele.  
Tûka gewriya te bimiçiqe.  
Tûka sar merhema rûyê te be.  
Tûka xelqê jê re gulav bûyî.  
Tûrra we hesret be/teberik bibe..  
Xêrê ji emrê xwe nebînî.  
Xina te bi berê bayî bikeve.  
Xîre, xîreta berazan bibî.

Xweziyê bi savêra sêg bînî.  
Xwîn/cirm were ber derê te.  
Yeka te nebe didu.  
Yeka xerab ji te re hafî.  
Zikê te bi sulba<sup>358</sup> bêbavekî hilpingire.  
Zikê te bi tir û fisên xelqê têr be.<sup>359</sup>

\*\*\*

Bixwî û pê vereşî.  
Çûna te hebe hatina te nebe.  
Dê û bavê te xêrê ji te nebînî.  
Hevalê kûçikan bûyî.  
Ji kerban bimirî.  
Kepaze bûyî.  
Kevir û kuçik li te bibarin.  
Kûçikê har te bigire.<sup>360</sup>

\*\*\*

Belkî tu ser mi da bikevî.  
Belkî tu waymîş nebî.  
Bira xêrê dinê nebînî.  
Destê te devê te keve.  
Êgirda bismitî belkî.  
La riya te rast nebiyê.  
Lê ser bela xwe vebûyî.  
Nav mû, agirda bişewitî.  
Peniyê te vir da bin.  
Ser bela xwe vebî.  
Weyla kerbûyî bî.

---

<sup>358</sup> Sulb: Dol,nifş,zuriyet.

<sup>359</sup> Umîd Demîrhan, [http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf). R: 02 Tebax 2016 ;  
Ehmed Serhedî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.

<sup>360</sup> Kek Îsmed Öner Taşûcanî, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1960. Ragihandin: 20 Îlon 2016.

Xafil qeda te ra bê.  
Xwedê riya qenc nede peşiya te.  
Xwedê te feş ke.  
Xwedê topa te agir ke.<sup>361</sup>

\*\*\*

Birûsk li te keve / birûska Xwedê li te keve.  
Çêtiyên<sup>362</sup> te werin xwarê.  
Kevir û kuçik li te bibare.  
Kûçikê har bi te bigre.  
Qeda bi te keve.  
Qeda û bela bi te keve.  
Rûviyê te di qûna te ra werî.  
Topa ezmana li te keve.  
Topa Xwedê li te keve.  
Tu ber xwe nebînî.  
Tu bi devê hirça har herî.  
Tu bi dora mi bigerî.  
Tu bi dora xelkê bî.  
Tu bi ser bela xwe vebî.  
Tu bî tu ber xwe nebînî.  
Tu bî tu di ber destan kevî.  
Tu bî tu nebînî.  
Tu bî, tu binepixî.  
Tu di ber lehiyê da herî.  
Tu herî, tu venegerî.  
Tu xêrê ji canê xwe nebînî.  
Xwedê mala te bişewitîne.  
Xwedê te bike sosret.<sup>363</sup>

---

<sup>361</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387-402.

<sup>362</sup> Çêti: Ji bo goşt perçên biçûk. Çêti-çêti, kerî kerî, perçe perçe.

<sup>363</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r.80-86.



### 2.2.15. Beşek Kifriyên (Dijûn) Wek Nifiran

Her çendî ku kifrî bi rasterast ji nifiran neyê hesibandin jî lêbelê ev gotin jî di nav xwe da wateyeke nifirî dihewîne. Wek minak:

Bi sekitî.

Bicehimî.

Bidehibe.

Bikerife.

Bikewit.

Biperpite.

Bisekite.

Can dayî.

Çav rijiyo.

Çavrijiyayo

Çav kor bûyo.

‘Emir quto.

‘Emirkino.

Ferfityo.

Firê neketî

Gurrî bî.

Har bûyo.

Heliyayî.

Kerafî be.

Hundir qetiyayî.

Hundir qul bûyo.

Hundir reş bûyo.

Hişk bûyî.

Dêranê.

Kezebreşo.

Kizirî.

Kor bûyo.

Kulê biro.

Meyt hilato.

Ling kişiyayî.

Guran xwarî.

Malik wêrano/ê.

Mirar bûyî.

Pars kirî.

Pepûkê.

Pişt şkestî.

Quzilqurt be.

Li te porkurê.

Perpityo/perpityê.

Quzelqur be.

Şepirze bûyî.

Ziqûm bibe.

Tu bimirî.

Xwelîserî.

Xwelîsero.<sup>364</sup>

\*\*\*

Bê mirado.

Belqityo.

Emirquto.

Gura xwaro.

Gurrî bûyê.

Kezeb peritiyo.

Kulê biro.

Qurçimiyo.

Top lêketo.

Tu bibehecî.

Tu bibelqitî.

Tu biperpitî.

Tu kotî bî.

Xêr nediyo.<sup>365</sup>

\*\*\*

Belkî bikeribî.

Belkî bipizinî.

Belkî bizirifî.

Kepenekî bi.

Kût bî.

Lê nikisî.

Porkurê.<sup>366</sup>

---

<sup>364</sup> Anonîm wek hemû herêman.

<sup>365</sup> Mahmud Lewendî, *k.n.b.*, r.80-86.

### 3. DÎ'A û NIFIRÊN HERÊMA BEHDÎNAN, BABAN û SORAN

#### 3.1. Dî'a

Di navbera di'ayên gelan û çanda wan a piralî de têkiliyên xurt hene. Em wan têkiliyan di navbera di'ayên Kurdan û çanda wan a dînî, civakî û aborî de jî dibînin. Li vir em dixwazin li ser çend mijaran bisekinin.

Di bin vê beşê de binbeşên “*Bîr û Bawerî (Îman)*”, “*Beheşt (Cennet)*”, “*Qeza û Bela*”, “*Çav û Çawpîsî*”, “*Xêr û Xêrat*”, “*Dil û Hinav*”, “*Êş û Nexweşî*”, “*Dinya*”, “*Zilm û Zalim*”, “*Dilovanî û Mehder*”, “*Rizq û Debar*”, “*Gor û Qebir*”, “*Mal û Melal*”, “*Mirad û Bext*”, “*Şeytan (Pelît)*”, “*Mirî û Mirdin*” û “*Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Beşan*” hat diyar kirin. Ev binbeş di nav edebiyata gelê Kurd de bi kurtasî wiha cih digirin.

##### 3.1.1. Bîr û Bawerî (Îman)

Ya Rebî tu îmana me kamil bike.

Ya Rebî tu me bê îman neke.

Ya Rebî tu me li ser îmanê bimirîne.

Ya Rebî tu îmana me qayîm bike.

Ya Rebî tu ji îmana xwe dilên me tijî bike.

Ya Rebî tu me bigehînî rêza îmandaran.

Ya Rebî tu îmana pêxemberan têxe dilê me da.

Ya Rebî tu dilên me ji bê îmaniyê bişo.<sup>367</sup>

\*\*\*

Xwaye îmanman be hêz bikey.

Xwaye îmanman be nisîb bikey.

Xwaye îmanman damezraw<sup>368</sup> bikey.<sup>369</sup>

---

<sup>366</sup> Ordîxan û Celîlê Celîl, *b.n.b.*, r. 387- 402.

<sup>367</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *Semînara Lîsansa Bilind a Bitez, Zanîngeha Wan Yûzûncû Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî*, Wan 2016, r. 10.

<sup>368</sup> Damezraw: Qayim, sabît.

<sup>369</sup> Zimannas Rabar Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr, 1993, Ragihandin: 19 Sibat 2016

### 3.1.2. Beheşt (Cennet)

Beheştî bî.

Înşallah tu di beheştê de ebedî bibî.

Înşallah Xwedê hemî misilmanan têxe beheştê.

Înşallah Xwedê me daxilî beheştê biket û ji beheştê jî me daxlî firdewsê biket.<sup>370</sup>

\*\*\*

Înşallah Xwedê me ji beheştê xwe bê par neket.

Xwaye be beheştî pan û berîn<sup>371</sup> şadman bikey.

Xwaye beheştîman be nisîb bikey.

Xwaye la beheştîyekanman<sup>372</sup> hîsab bikey.

Xwedê beheştê bi rîzîqê me bike.

Xwedê cihê te biket beheşt.<sup>373</sup>

### 3.1.3. Cerg û Mêlak

Çaw û dilit ron bê.

Xwaye dilit le serit bihêlî.

Xwaye dilman firawan bike.

Xwaye ewey le dilte be nisîbit bike.

Xwaye le waneman hîsab bikey ke dilxoş û asuden.

Ya Rebî cergit nesutê.<sup>374</sup>

### 3.1.4. Çav û Çavpîsî (Çavzer)

Hey çavê te di rohnî bin.

Înşallah çavê Xwedê li ser te bit.

Înşallah ser û çavê te sax bin.

<sup>370</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 10.

<sup>371</sup> Pan û berîn: Berfireh û fire.

<sup>372</sup> Beheştîyekanman : Ehlê Cenet be.

<sup>373</sup> Zimannas Reband Ismael, *Devera Soran*, Hawlêr 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>374</sup> Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz- Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016.

Înşallah serûçav li bihuştê bin.

Înşallah tu di çavên xelkî da herê mezin bî.

Înşallah Xwedê te ji çavêt hesîd û pexîlan<sup>375</sup> biparêzît.

Xwedê çavêt te ji heramî yê wergêrit.

Ya Rebî tu çavên me rohnî bikey.

Ya Rebî be durman bixeytewe le çawpîsan.<sup>376</sup>

\*\*\*

Înşalleh le çawî pîs be durman bigre.

Xwaye biman parêzî le çawpîsan.

Xwedê çavêd te ji heramiyê dîrket.

Xwedê çavên te ron ket.

Xwedê te rûsipî kit.<sup>377</sup>

### 3.1.5. Dilovanî û Rehm

Xwedê rehimê xwe te bibet.

Ya Rebî tu barana rehimê bibarînî.

Ya Rebî tu bi rehima xwe digel me bikî.

Ya Rebî tu me bê rehim nekey.

Ya Rebî tu me rehma xwe mehrum nekî.

Ya Rebî tu rehima xwe bi darêjî ser vê axê.

Ya Rebî tu rehimê bi me bibî.<sup>378</sup>

\*\*\*

Rehmet bixeyte malekanmanewe.

Xwaye baranêkî be rehmet bibarênî.

<sup>375</sup> Pexîl: Çavnebar, hesûd, zikreş.

<sup>376</sup> Zimannas Reband Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>377</sup> Rebî Îsmâîl Halid, *Devera Behdînan*, Akra-Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo-Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>378</sup> Qabeel Muhemed Mawld s.n.b., r. 12; Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz- Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016.

Xwda le soz û mîhrebanî xot bêbeşman nekey.

Xwda rehmit pê bikat.<sup>379</sup>

### 3.1.6. Dil û Hinav

Xwedê dilê te aram biket.

Xwedê dilê te ji kerb û kînê paqij biket.

Xwedê dilê te tijî îman biket.

Xwedê dilê te xweş biket.

Xwedê li dîf dilê te bide te.

Xwedê li goreyî dile te bide te.

Xwedê riziqê te êka li dîf dilê te biket.<sup>380</sup>

\*\*\*

Xwedê dilê te li ser îmanê bixelit.

Xwedê dîf dilê biket rizqe te.

Xwedê êke ve dil rizqe te biket.<sup>381</sup>

### 3.1.7. Dinya û Cihan

Înşallah hindî dinya hebît tu tê da bî.

Înşallah tu li vê dinyayê û dinyaya dî jî serfiraz bî.

Înşallah tu pêşemanê<sup>382</sup> vê dinyayê nebî.

Înşallah Xwedê te li dîn û dinyayê biser bêxît.

Înşallah Xwedê xweşiyê vê dinyayê li ber me şîrîn neket.<sup>383</sup>

Xwedê kerema dîn û dinyayê digel te biket.

Xwedê te ji hemî bela û muqederetên dinyayê biparêzît.<sup>384</sup>

<sup>379</sup> Zimannas Rabar Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1993. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>380</sup> Qabeel Muhemed Mawld *s.n.b.*, r. 12 ; Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz-Silêmanî 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016.

<sup>381</sup> Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>382</sup> Peşemanî: Poşmanî, tobe, tobe karî, peşimanî.

<sup>383</sup> Li gor jiyana axîretê.

\*\*\*

Xwaye le belay dunya be durman bixey.

Xwdaye le kar û barî dunya yarmetîman bidey.

Xwedê te werê û axîretê rûreş biket.

Ya Rebî ser firazî dunya û qiyamet bît.<sup>385</sup>

### 3.1.8. Geşt û Rêwîti

Be xêr û xoşî biçî û bêytewe.<sup>386</sup>

Dûr biroy û selamet bêytewe.<sup>387</sup>

Her le xoşî û şadî da bît.

Sefereket xêrandar bet.

Seferit pir xêr bêt.

Ya Rebî be selametî bigeyte cê.<sup>388</sup>

### 3.1.9. Gor û Qebir

Xwedê eşkenca qebrî li ser te sivik biket.

Xwedê qebrê te biket mêrgek ji mêrgên beheştê.

Xwedê qebrê te fireh biket.

Xwedê qebrê te neket kurikêk ji kurikên agrî.

Xwedê qebrê te rohnî biket.

Ya Rebî tu bersiva pirsyarên qebrî li ber me hêsan bikey.

Ya Rebî tu qebrê tu kesê tarî nekey.<sup>389</sup>

\*\*\*

Xwaya gorman pir nûr bikey.

---

<sup>384</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 12.

<sup>385</sup> Zimannas Gharib Ali, *Devera Soran*, Qaladize-Silêmanî 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>386</sup> Bêytewe: Bizivîf, wergerf.

<sup>387</sup> Rê bira dûr be, bila selamet be.

<sup>388</sup> Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz- Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016; Zimannas Gharib Ali, *Devera Soran*, Qaladize- Silêmanî 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>389</sup> Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

Xwaye gorekeman bikeye mêrgek le mêrgekanî beheşit.

Xwaye gorekeman bo ronak bikey.

Xwaye gorman bo firawan bikey.

Xwdaye le azarî gor be dûrman bigrî.<sup>390</sup>

### 3.1.10. Mal û Melal

Mal û mezelên<sup>391</sup> te ava.

Mala te ava, Xwedê te biket zava.

Xwedê mala te ava biket.

Xwedê mala te ron biket.

Xwedê ne bi mal ve ji hemî belayan we biparêzêt.

Xwedê te bi mal û mezel bêxît.

Ya Rebî tu mal û halê me xweş bikey.<sup>392</sup>

\*\*\*

Mala te herî avedan bit.

Xwedê mala te biket ava, kurê te biket zawa.<sup>393</sup>

\*\*\*

Malit awa bê.

Xwa malit bikate şiwênêk le şiwênekanî beheşit.

Xwa malit ronak bikatewe.

Ya Rebî herdem malit pir nûr bê.<sup>394</sup>

### 3.1.11. Mirad û Bext

Înşallah ew mirada di dilê te da, Xwedê te bi gehînitê.

Înşallah tu bi meqsed û miradê xwe bikevî.

<sup>390</sup> Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz-Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016.

<sup>391</sup> Mal û mezelên : Xanî, avayî.

<sup>392</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 14.

<sup>393</sup> Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibata 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibata 2016.

<sup>394</sup> Zimannas Rabar Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1993. Ragihandin: 19 Sibata 2016.



Înşallah Xwedê te bigehînît mirada te.

Xwedê mirada te hasil biket.

Xwedê mirada te li dîn û dinyayê hasil biket.

Xwedê te bê mirad ne ket.<sup>395</sup>

\*\*\*

Ewey le dilte Xwa bîkat be mirazit.

Xway gewre bot asan bike le geştin be mirazekant.

Xwedê miradê ji bo te bi cih bînit.

Ya Rebî Xwa mirazit hasil bikat.<sup>396</sup>

### 3.1.12. Mirî û Mirdin

Xwedê beheştê bi riziqê miryên me biket.

Xwedê te li ser îmanî bimirînît.

Ya Rebî tu berî mirna me gunehên me bixefrînî.

Ya Rebî tu 'ezaba qebirî li ser miryê me sivik bikey.

Ya Rebî tu ji miriyên me razî bibî.

Ya Rebî tu me bi serferazî bimirînî.

Ya Rebî tu min ji kedê bibe hedê.<sup>397</sup>

Ya Rebî tu sekeratê mirinê li ser me sivik bikey.<sup>398</sup>

\*\*\*

Xwa le gunahî mirdiwekanman xoş be.

Xwaye Leser îman mirdinman pê bibexşe.

Xwda temenit dirêj bikat.<sup>399</sup>

### 3.1.13. Rizq û Debar

---

<sup>395</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 14.

<sup>396</sup> Zimannas Rabar Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1993. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

<sup>397</sup> Ez perîşan nebim.

<sup>398</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 14.

<sup>399</sup> Zimannas Reband Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.

Xwedê heramiyê bi rizqê te neket.

Xwedê jinkeka baş bi rizqê te biket.

Xwedê rizqê te ji helalî zêde biket.

Xwedê rizqê te zêdeket.

Xwedê saxlemiyê baş bi rizqê te biket.

Xwedê zuriyeteka baş bi rizqê te biket.

Ya Rebî tu paryekê nanê helal bi riziqê me bikey.<sup>400</sup>

\*\*\*

Xwaye ewende riziqman pê bibexşe ke dînman le dest nedeyn.

Xwaye le her luqmeyekî heram biman parêze.

Xwaye le rizqî heram be dûrman bigrî.

Xwaye mal û saman bibexşe bew kesey ke şayenyetî.

Xwaye rizqêkî başman pê bibexşe.

Xwaye rizqêkî helalman be nisîb bikey.<sup>401</sup>

\*\*\*

Xwedê sihet xweş bikit.

Xwedê tu pariyêd heram rizqê me nekî

Ya Rebî tu me ji heramiyê dîr bikî.<sup>402</sup>

### 3.1.14. Zilm û Zalim

Înşallah Xwedê wan zalima borit.

Xwedê têra wan zalima heye.

Ya Rebî ew kesê ku zilmê biket, zilma wî bihêt rêka wî.

Ya Rebî tu bela van zalima ji me vekey.

Ya Rebî tu bi qehra xwe digel van zalima bikî.<sup>403</sup>

<sup>400</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 12.

<sup>401</sup> Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz- Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016

<sup>402</sup> Qabeel Muhemed Mawld *s.n.b.*, r. 12

\*\*\*

Ya Rebî tu destê zalima bişkênî.

Ya Rebî tu destê zalima ji serê me rakey.

Ya Rebî tu kursîkê<sup>404</sup> zalima hûrşînî.

Ya Rebî tu zalima bi ser neyêxî.<sup>405</sup>

\*\*\*

Xwaye biman parêzî le destî zordaran.

Xwdaye destî ew kese bişkênî ke zordare.

Xwdaye text û teracî zordaran bişkênî.

Xwdaye zulm û zordarî le kes qibul nekey.<sup>406</sup>

### 3.1.15. Xêr û Xêrat

Bimînî di xêr û xweşiyê da.

Ser xêrê oxir be.<sup>407</sup>

Silametî bizivirî.

Waxerê<sup>408</sup> te xêre bit.

Xwedan xêr bî.

Xwedanê xêra bî.

Xwedê dergehê xêrê bo te veke.

Xwedê me ji xêrên te bê behir<sup>409</sup> neket.

Xwedê xêr û bereketê bêxîr malê te.

Xwedê xêra te binvîsît.

---

<sup>403</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 12

<sup>404</sup> Kursîk: Text, rûnîstek, sendalî, sendaliye.

<sup>405</sup> Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>406</sup> Zimannas Reband Ismael, *Devera Soran*, Hewlêr 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016

<sup>407</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 11.

<sup>408</sup> Wexer: Sefer, rêwîti, oxir.

<sup>409</sup> Behire: Pişk, par, parçe, beş.

Xwedê xêra te mezin biket. <sup>410</sup>

### 3.1.16. Qeza û Bela

Înşallah dûrî belaya bî.

Înşallah tu çi belayan neyînî rêka me.

Înşallah tu ji bo tu kesî nebe bela.

Înşallah tu me ji hemî bela û muqederên dinyayê biparêzî.

Înşalleh bo kes nabîte hoy bela û naxoşî<sup>411</sup>.

Înşalleh le bela be dûr bît.

Ya Rebî tu bela van zalima ji me dûr bikey.

Ya Rebî tu me nêxî çi belaya.

Ya Rebî tu vê belayê ji ser miletê me rakey. <sup>412</sup>

\*\*\*

Xwaye be dûrman bixeytewe le bela û musîbet.

Xwaye biman parêzî le belay nagahan, le mekrî jinan le fîtney şeytan. <sup>413</sup>

### 3.1.17. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Beşan

Bimînî li jêr çavdêriya Xwedê.

Înşallah her serfiraz bî.

Înşallah tu hizar sal bî.

Xwedê barê te sivik biket.

Xwedê bereketê bêxete malê te.

Xwedê digel te bit.

Xwedê dilovaniyê bi te bibet.

Xwedê 'emrê te dirêj biket.

---

<sup>410</sup>Zimannas Rebî Îsmail Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>411</sup>Tu ji bo tu kesî nebî sedama bela û musîbetan.

<sup>412</sup>Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 10.

<sup>413</sup>Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz- Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016.

Xwedê gunehên te jê bibet.  
Xwedê harîkarê te bit.  
Xwedê hez te biket.  
Xwedê keremê digel te biket.  
Xwedê me ji destê zalima rizgar biket.  
Xwedê pêşmergey bi parêzit.  
Xwedê qewetê bidet te.  
Xwedê rehmê bi te bibet.  
Xwedê sebir û hedarê bidet te.  
Xwedê selametiye bidet.  
Xwedê te bi hîdayet bînît.  
Xwedê te bi parêzit.  
Xwedê te 'efî biket.  
Xwedê te ji hemî belayan biparêzit.  
Xwedê te ser bêxît.  
Xwedê tewfîqa te bidet.  
Xwedê welatê me bi parêzit.  
Xwedê zanîna te zêde biket.  
Ya Rebî her kesekî miradek di dilî hebît, tu bigehîniyê.  
Ya Rebî tu baraneka rehmê bi ser me da bibarînî.  
Ya Rebî tu dergehên bereketê li ber me vekey.  
Ya Rebî tu destê sitemkâra bişkênî.  
Ya Rebî tu di'ayên me qebîl bikey.  
Ya Rebî tu me biparêzî.  
Ya Rebî tu nivêj û rojiyên me qebîl bikey.

Ya Rebî yê zarok nebin tu zarokan bideyê.<sup>414</sup>

\*\*\*

Xwedê ‘emrê te têxe hezar salî.

Xwedê îlmê te zêde bikêt.

Xwedê te raçavke.<sup>415</sup>

### 3.2. Nifir

Wekî di’ayên Kurdî nifirên Kurdî jî bi jiyana Kurdan a piralî ve rasterast girêdayî ye. Di vî warî de nifir û di’ a du tiştên dijawate ne. Ango tiştên ku pêkhatina wan bi rêya di’ayan tê xwestin, bi rêya nifiran pêknehatina wan tê xwestin; tiştên ku bi rêya di’ayan pêknehatina wan tê xwestin, bi rêya nifiran pêkhatina wan tê xwestin. Li vir em dixwazin li ser çend mijaran bisekinin.

Di bin vê beşê de binbeşên “*Agir û Cehnem (Dozeh)*”, “*Cerg û Mêlak*”, “*Çav û Çavpîsî*”, “*Derd û Derman*”, “*Dil û Hinav*”, “*Gor û Qebir*”, “*Serî (Qaf)*”, “*Şeytan (Pelîd)*”, “*Mal û Malbat*”, “*Mirad û Bext*”, “*Mirî û Mirin*”, “*Zilmû Zalim*” û “*Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan*” hat diyar kirin. Ev binbeş di nav edebiyata gelê Kurd de bi kurtasî wiha cih digirin.

#### 3.2.1. Agir û Cehnem (Dojeh)

Înşallah agir bi berbît mala te.

Înşallah agir bi mala direwîna bikevît.

Înşallah agir bi te bikevît.

Înşallah agirê Xwedê bi cerg û mêlakên<sup>416</sup> te bikevît.

Înşallah dê cejnem li te ra bît.

Înşallah tu biçî cejnemê.

Înşallah tu di cejnemê da bikelî.

---

<sup>414</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 19; Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>415</sup> Zimannas Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>416</sup> Cerg û mêlakên: Dil û hinav.

Înşallah tu di cehnemê da yê ebedî bî.  
Înşallah tu di nav agirê cehnemê da bikelî.  
Înşallah Xwedê çarenvîsê<sup>417</sup> te biket cehnem.  
Înşallah Xwedê jiyana te biket cehnem.  
Înşallah Xwedê li ser dinyayê agirî berdet te.  
Înşallah Xwedê te bi agirê cehnemê bisojît.  
Xwedê cehnemê bi rizqê te biket.  
Xwedê te di agirî da bisojît.<sup>418</sup>

### 3.2.2. Cerg û Mêlak (Dil û Hinav)

Hey agir bi cerg û mêlakên te kefto.  
Hey mêlak kon.<sup>419</sup>  
Hey mêlaka te di devê te da bihête derê.  
Hey topa 'nzalê bi cerg û mêlakên te bikevît.  
Înşallah dê cerg û mêlakên te pirt pirt bin.  
Înşallah êşa pîs cerg û mêlakên te bigrît.  
Înşallah zerika zer mêlakê te bigrît.  
Xwedê cerg û mêlakên te bisojît.<sup>420</sup>

\*\*\*

Hey top dil.  
Înşallah ka çawa te dilê min sot, wisa jî dilê te bisojît.  
Înşallah seretan<sup>421</sup> dilê te bigrît.  
Înşallah topa Xwedê bi dilê te bikevît.  
Înşallah Xwedê 'ezîztirîn li ber dilê te bibet.

---

<sup>417</sup> Çarenivîs: Qeder, rojgar, şans, enînivîs.

<sup>418</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 24.

<sup>419</sup> Hey bê dil.

<sup>420</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 24.

<sup>421</sup> Seretan: Pênçeşîr, kanser, şêrpence û seretan.

Înşallah Xwedê mirada dilê te hasil neket. <sup>422</sup>

### 3.2.3. Çav û Çavpîsî (Çavazer)

Hey çavên te li pişt te bin.

Înşallah çavên hesîd û bexîla bipeqin.

Înşallah çavên te biçin patkê.

Înşallah çavên te bipeqin.

Înşallah ew çavên te kore bibin.

Înşallah heçkê te bi nav çavên te bikevîn.

Înşallah sipiyên çavên te birijin.

Înşallah nêrî li çavên te bihên.

Înşallah çavên te nebînin.

Înşallah to ji herdû çava kore bibî. <sup>423</sup>

### 3.2.4. Derd û Derman

Heyla derdê bê derman tu girtiyo.

Înşallah derdek te bigrît, derman bezê mêrya <sup>424</sup> reş bît.

Înşallah êşek te bigrît, dermanê te li çi memleketa nebît.

Înşallah kafir derdê te nebîne.

Înşallah te bi vî derdî bimirî.

Înşallah tu bikevî derdê heyla weylayê.

Înşallah Xwedê derdekî bidet te, derman nebît. <sup>425</sup>

\*\*\*

---

<sup>422</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 40, Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>423</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 25.

<sup>424</sup> Mêrya : Mûrî, gêrik, morîstang.

<sup>425</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 25.



Hey kulka serecê te girtiyo.<sup>426</sup>

Hey qulinca turkî<sup>427</sup> te girtiyo.

Hey tu yê bê wexer bî.

Hey xeme bay te girtiyo.

Înşallah kulbe<sup>428</sup> bikevît nefsa te.

Înşallah stoyê te bişkêt.

Înşallah tu biçî kehnîka qêrî.

Înşallah Xwedê te biket 'îbret.

Înşallah Xwedê zimanê te lal biket.

Xwedê devê te bibet patika te.<sup>429</sup>

### 3.2.5. Gor û Qebir

Înşallah qebrê te bibît kurkek<sup>430</sup> ji kurkên agirî.

Înşallah qebrê te rohnî nebit.

Înşallah tu di qebrî da jî rehet nebî.

Înşallah Xwedê 'ezaba qebirî li ser te sivik neket.

Înşallah Xwedê qebrê te teng biket.

Xwedê qebrê te tarî biket.<sup>431</sup>

### 3.2.6. Serî (Qaf)

Înşallah dersoka<sup>432</sup> min li ser serê tebît.

Înşallah sed ser bikevin dikulavekî<sup>433</sup> da.

Înşallah serê te dibin heft tebeqên erdî ve bît.

---

<sup>426</sup> Kulka serecê: Penceşêr te bigrît.

<sup>427</sup> Qulinca turkî: Rîvîka kore.

<sup>428</sup> Kulbe: Nexweşîya têrnexarîyê û zikîn.

<sup>429</sup> Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016 ; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>430</sup> Kurkek : Çelê,çal.

<sup>431</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 34.

<sup>432</sup> Dikulavekî: Desmal, pêşgîr.

<sup>433</sup> Kes ji mala hewe nemînît.

Înşallah tu xêrê ji serê xwe nebînî.

Înşallah Xwedê êkê bînît serê te, xelk tiliyên xwe bikin di guhê xwe ra.

Înşallah Xwedê ya bînît serê te ya înay serê kafra. <sup>434</sup>

### 3.2.7. Şeytan (Pefîd)

Înşallah roja qiyametê cihê te û şeytanî êk bît.

Înşallah şefa'eta te digel şeytanî bît.

Înşallah şeytan berevanê we bit.

Înşallah şeytan derdê te nebînît.

Înşallah şeytan ne'leta xwe ji te biket.

Înşallah tu di bin şeytanî da bî.

Înşallah tu digel şeytanî bihêy sojin. <sup>435</sup>

### 3.2.8. Mal û Malbat

Înşallah di mala te da ber<sup>436</sup> nemînît li ser berî.

Înşallah kola Helebê bikevit mala babê te.

Înşallah kurya mişkî<sup>437</sup> li mala te ber arî nekevit.

Înşallah mala te mîratê bît.

Înşallah tu le mala xwe nemirî. <sup>438</sup>

### 3.2.9. Mirad û Bext

Înşallah ew mirada di dilê te da hasil nebit.

Înşallah tu bê mirad bimirî.

Înşallah tu bi mirad û meqsedên xwe nekevî.

Xwedê mirada te hasil nekit.

---

<sup>434</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 25.

<sup>435</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 34. Rebî İsmail Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016; M.Nureddin Sêid, *Devera Behdînan*, Zaxo- Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

<sup>436</sup> Ber (berd): Kevir, kûşk, pel.

<sup>437</sup> Kurya mişkî: Gula mişka.

<sup>438</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 34.

Xwedê te bê mirad biket.

Xwedê te negehînte mirada te.<sup>439</sup>

### 3.2.10. Mirî û Mirdin

Înşallah dema tu dimirî di nav musulmanan neyî weşartin.

Înşallah demê tu dimirî kifin<sup>440</sup> nebit te werkin.

Înşallah tu li mal nemirî.

Înşallah Xwedê sekerata mirinê li ser te sivik neket.

Xwedê kitekê ji we nehêlît.

Xwezî ji xêra Xwedê ra tu miribay.

Xwezî tu zîtir miribay.<sup>441</sup>

### 3.2.11. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan

Hey Xwedê te tewarê<sup>442</sup> biket.

Hey Xwedê xezeb li te kirî her wekî li te kirî.

Înşallah cilkên te li ava tenî bidin.<sup>443</sup>

Înşallah dê renya befre<sup>444</sup> çî.

Înşallah hêlîvanka te pîvaz bît.

Înşallah Xwedê bela te ji me veket.

Xwedê heqê min ji te bistîne.

Xwedê kit û cuta bêxîr nav we.

Xwedê pişta te bişkênît.<sup>445</sup>

\*\*\*

Hey rûyê te reş bin.

---

<sup>439</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 34.

<sup>440</sup> Kifin: Kefen, kifn.

<sup>441</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 44.

<sup>442</sup> Teware (teyare): Balafîr, firoke.

<sup>443</sup> Wate: Aweka şîne ko bo tazyan dihête bikarînan.

<sup>444</sup> Befre: Şepe, berf.

<sup>445</sup> Zimannas Rebî Îsmâil Halid, *Devera Behdînan*, Akra - Hewlêr 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016..

Înşallah milê te bişkêt.

Înşallah tu nebî mêr û zelum.

Înşallah Xwedê te biket 'îbret.

Înşallah Xwedê te bikujit.

Ne'letên Xwedê li ser te bin.

Xwedê bela te ji me veket.

Xwedê harîkarê<sup>446</sup> te nebit.<sup>447</sup>



---

<sup>446</sup> Harîkar: Alîgir, destekder, komekîder, piştewan, piştgir, yarmetîder, yarmetîker.

<sup>447</sup> Qabeel Muhemed Mawld, *s.n.b.*, r. 44; Zimannas Mohammed Mêrgeyî, *Devera Soran*, Rawandiz-Silêmanî 1974. Ragihandin: 19 Çile 2016 ; Zimannas Gharib Ali, *Devera Soran*, Qaladize- Silêmanî 1991, Ragihandin: 19 Sibet 2016.

## 4. DÎ'A û NIFIRÊN (DUAYIY û ZEWTIY) BI DIMILÎ

### 4.1. Dî'a

Di bin vê beşa di'ayên dimilî da, binbeşên “*Bîr û Bawerî*”, “*Êş û Nexweşî*”, “*Miraz û Bext*”, “*Rizq û Debar*”, “*Zewac û Malbat*” û “*Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan*” hat honandin. Ev binbeş di nav edebiyat û çanda gelê Kurd da bi zaravayê Kirmanckî (dimilî) kurtasî wiha cih digrin.

#### 4.1.1. Bîr û Bawerî

Adirê cehnimî to ra dûrî bo.

Awê kewserî bibo qîsmetê to.

Bela û tifaqî şîma ra dûrî bê.

Bi xeyr û silamet şo û bê.

Ez to ra çendêk raziya Homa'yk endêk to ra razî bo.

Homa<sup>448</sup> fîrset nêkero destê zaliman.

Homa dadî û babê şîma, serê şîma ra kemî nêkero.

Homa joy îman ra nêkero.

Homa ro ma hemin bêro rehm.

Homa tifaqêk niyaro şîma rê.

Kamco bixeyra Homa ay bikero.

Qyyy îşalla ti şê re awê kewserî ser.

Rehmê Homa ro ci bo.

Xeyrê Homa ro to bo.<sup>449</sup>

\*\*\*

Cayê to cînet bo.

Homa mayê û pî şîma, serê şîma ra kemî nêkero.

Homa to dir bo.

Homa to raştê başan biyaro.

Homa to raştê bêbavan niyaro.

Ro to bimbarekî bo.

Ti cîranê Fatma Nebî bê.

<sup>448</sup> Homa: Xweda, Xway, Xwa, 'Ellah, Xaliq.

<sup>449</sup> Leyla Gültekîn, *Kovara Folklorê Kurdan*, Amed 2015, r. 29.

Ti cîrane pêxember û ewliyan bê.

Ti welî Homay bê.

Xaliq hetê to bo.<sup>450</sup>

#### 4.1.2. Êş û Nexweşî

Awa sipê bo, ro to bigeyro.

Ganê to sax bo.

Homa şifa xêr bido şima.

Ser û çime to neêşo.

Ya rebî ino derdê mi kafîr nibîno.<sup>451</sup>

\*\*\*

Ellah niweşî nido ganê to.

Ellah şifa û xêr bido to.

Homa joy nêkero miyane dest û lingan.

Niweşiya to keferatê to bo, Ellah şifayê xêr bido to.<sup>452</sup>

#### 4.1.3. Miraz û Bext

Homa miradê to bikero.

Homa miradêko baş bido to.

Ti bixeyr amey.

Ti çi biwazê Homa bido to.<sup>453</sup>

\*\*\*

Ellah miradê şima pê biko, kal û pîr biko.

Homa to ra weşbo.

Homa tor ê verdo.

Miramê to şêro serî.

Rebî miradê to biko.<sup>454</sup>

#### 4.1.4. Rizq û Debar

Homa hewt hebî lacî û keynêk bido to.

Homa malo heram nêkero qismetê ma.

Homa merdimî dest û lingan ra nêkero.

<sup>450</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.

<sup>451</sup> Karsaz Ehmed Osta, *Devera Bingolê*, Genç-Bingol 1985. Ragihandin: 29 Îlon 2016.

<sup>452</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.

<sup>453</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 29.

<sup>454</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016

Homa nanêko rehet bido to.  
Homa tengayî nêmocno to.  
Homa to hewcê joy nêkero.  
Ti çirey tengayî nêvînê.<sup>455</sup>

\*\*\*

Destê to anû pire bê.  
Ellah rizqo helal bido to.  
Ena dinya 'd çimiramê to estê,Homa bero seri.  
Nanê xwe rihat borê.<sup>456</sup>

#### 4.1.5. Zewac û Malbat

Çimê to roşnî bê.  
Homa bûka sûr kero,kê mi'd rono.  
Homa bûke kero.<sup>457</sup>

\*\*\*

Ena dinya 'd çimiramê to estê,Homa bero seri.  
Homa joy bêsermiyan nêkero.  
Homa to pîr kero, wayrî lacî û keynan kero.  
Şima piya kal û pîr bê.<sup>458</sup>

#### 4.1.6. Hinek Di'ayên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan.

Fêne roşnê aşm bêro vernî to.  
Homa anû bido to, fenê varitê nîsanî ro to bi varo.  
Homa joy aqil ra nêkero.  
Homa joy miheyr nêverdo.  
Homa joy vînayê çiman ra nêkero.  
Homa to , to û tûtanê tor ê verdo.<sup>459</sup>

\*\*\*

Rayê to akerdî bo.  
Roşnê çila bo, vernî to de bo.  
Seyin bixeyra Homa anû bikero.

<sup>455</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 29.

<sup>456</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016

<sup>457</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 29.

<sup>458</sup> Karsaz Ehmed Osta, *Devera Bingolê*, Genç-Bingol 1985. Ragihandin: 29 Îlon 2016.

<sup>459</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 29.

Ti anû raştê başan bêrê.<sup>460</sup>

#### 4.2. Nifir

Di bin vê beşa nifirên dimilî da, binbeşên “*Bîr û Bawerî*”, “*Êş û Nexweşî*”, “*Miraz û Bext*”, “*Mirî û Mirin*”, “*Rizq û Debar*”, “*Xwarin û Vexwarin*”, “*Rizq û Debar*”, “*Zewac û Malbat*” û “*Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Binbeşan*” hat honandin. Ev binbeş di nav edebiyat û çanda gelê Kurd da bi zaravayê Kirmanckî kurtasî wiha cih digrin.

##### 4.2.1. Bîr û Bawerî

Beqaqî to çinê bo.

Birûskê aşmê gulanî to ro bo.

Homa belê şima bido.

Homa nêmocno to.

Homa ro to bêro xezeb.

Homa to ro do.

Homa to bigero.

Homa to ker û kor ko.

Homa to wedaro û ero do.

Homa to wedaro.

Şo cehnimi.<sup>461</sup>

\*\*\*

Adirê cehnimî bo.

Ellah adir deko keydê to.

Homa ganê to bigiro.

Homa nêdo.

Homa rihê to bigro.

Qeda dinya ro guno.

Qur'an to ro do.<sup>462</sup>

##### 4.2.2. Êş û Nexweşî

Fekê to bişikyo.

Fekê to çewt bo.

<sup>460</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.

<sup>461</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

<sup>462</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.



Gilê çimanê to birişyê.  
Goştê wehşî bo.  
Gulî pero gunayî .  
Gulî to ro guno.  
Mirad û mexsedê to çimanê to'd bimano.  
Oyyy dil û gurçikê to bêrê teber.  
Oyyy ti ker û lal bê.<sup>463</sup>

\*\*\*

Awa siya bo.  
Bextereş.  
Bîvikê to biteqê.  
Bîvikê to vecyê.  
Boro, nêkero teber.  
Boxçikê to kêd bimano.  
Jan to ro guna.  
Jehr bo.  
Jehr û mirin.  
Jehr û ziqqûm bo.  
Jehrê marî bo.  
Keskîzer bo.  
Kezebê to bêrê teber.  
Lîlikê to biteqê.  
Loqelê to bêrê teber.  
Loqelê to bivisyê.  
Loqelê to qinê to ra bêrê teber.  
Mar to ceno.  
Marî ceno wo.  
Mêjî to bêro teber.  
Milê to bişikyo.  
Miyanê to bişikyo.  
Nefes ro to bişikyo.<sup>464</sup>

---

<sup>463</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

<sup>464</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

\*\*\*

Çimê to roş nêveyno.<sup>465</sup>  
Humay belay to bido.<sup>466</sup>  
Mele ti bora, ti teber nêka.  
Mele ti şora, ti nîra veyvekê yo.  
Qesbey to qul bo.  
Roja bîra tamaşey to.  
Serêy to bindê mano.<sup>467</sup>

\*\*\*

Canê to bihelesyo.  
Cîgerê to bitêqê.  
Cîgerê to fekê to ra bêrê teber.  
Çimê to bêrê teber.  
Çimê to kor bê.  
Çopilmi şima ro do.  
Derd û kulî pîzê to ra nêvecyê.  
Dest û lingî bişikyê.<sup>468</sup>

#### 4.2.3. Miraz û Bext

Bextê to siya bo.  
Ocaxê to kor bo.<sup>469</sup>

#### 4.2.4. Mirî û Mirin

Mezel to boro.  
Rihê to vecyo.  
Ti adiro sûr'd şêrê.  
Ti awe'd şêrê.  
Ti biteqê.  
Ti bimrê, nêfeletyê.  
Ti bimrê, şêrê bine linganê mi.  
Ti bimrê.

---

<sup>465</sup> Çavê te roniyê nebinin.

<sup>466</sup> Xwedê bela te bide.

<sup>467</sup> Anonîm herêma Pîran/Amedê.

<sup>468</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

<sup>469</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

Ti erdo bimanê.  
Ti nêfeletyê.  
Ti nêkerê teber.  
Ti nêrisê ewca.  
Vergî (cinawir) to borê.  
Wa boro nêkero teber.  
Warê to kor bo.  
Xezeb to ro bivaro.  
Zerî to siya bo.  
Ziwanê to lal bo.<sup>470</sup>

\*\*\*

Şêro nihat.  
Ti a dare'd şêrê.  
Ti ada siya'd şêrê.  
Ti bê mi bimanê.  
Ti dinya de bê û ax bikere.  
Ti nêrisê a heyam.  
Ti nêrisê kê.  
Ti zama nêbê.  
Top to ro guno.  
Erd aqeleşyo ti pedî şêrê.  
Ezman ro to bêro xezeb.  
Pirnikanê to ra bêro.  
Ro to jehrê marî bo.  
Roşnê çimanê to bibiryê.<sup>471</sup>

#### 4.2.5. Xwarin û Vexwarin

Afiyet bo.  
Afiyetê ganê to bo.  
Çim de to ra bero.  
Ellah cayê pî ko.  
Ellah ganê to ra şifa bido.

---

<sup>470</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

<sup>471</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

Ellah nesibê şima biko.  
Ezraîl to wedaro.  
Fek û pîrnîkan ra bêro.  
Fekê to ra bero.  
Homa zehf biko.  
Ma kê m kerd,Homa zehf biko.  
Qiriked bimano.  
Şifayê ganê to bo.  
To kul bora.  
To rê herem bo.  
To rê zehîr û ziqm bo.  
To rê ziqim bo.  
Zinca to ra bero.<sup>472</sup>

#### **4.2.6. Rizq û Debar**

Koçikê to kul bo.  
Nanê gilgil neko destê to.  
Ti beran da bigera.  
Ti nan û rihet nibîna.  
Ti nan veyna aw neweyna.  
Ti nan veyna do neweyna, Ti do veyna nan neweyna.<sup>473</sup>

#### **4.2.7. Zewac û Malbat**

Feleqê to siya bo.  
Felatî to çinêbo.  
Feleqsiya.  
Kê to bixerepyo.  
Îflahî to çinêbo.<sup>474</sup>

---

<sup>472</sup> Derûnas Hacer Bingol, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.

<sup>473</sup> Karsaz Ehmed Osta, *Devera Bingolê*, Genç-Bingol 1985. Ragihandin: 29 Îlon 2016.

<sup>474</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

#### 4.2.8. Hinek Nifirên Ku Nakevin Bin Tu Beşan

Oyyy ti şêrê bine erdî.

Oyyy ti bi masê.

Siyî to ro bivarê.

Şiyayîşo peyin bo.

Pîzed bimano.

Hal ra nêvecyê.<sup>475</sup>



---

<sup>475</sup> Gültekîn, *b.n.b.*, r. 30.

## 5. ENCAM

Danasandina miletekî da tiştê herî biwate naskirina çand û zimanê wî neteweyî yê. Bi wî awayî dewlenendiya kevneşopiya wî miletî derdikeve holê. Eger miletê Kurd jî bixwaze bênaskirin lazime ku çand û zimanê xweyî ku biwêj, lawêj, serpêhatî, pêşgotin, zûgotinok, çîrok, destan, stran, meselok, gotinok, di'a û nifirên nav xwe da dihewîne bizanibin û bi pisporî analiz bikin. Bi wî awayî şaristanî û kevneşopiya Kurdan a hezar salan derdikeve meydanê.

Di nav çarçoveya amedekirina vê tezê da piranî ji nav gel da; bi alîkariya milet, 'eşîr û malbatan gelek hevdîtin û xebatên rûbirû hatin çekirin. Digel vê nik şêx, mela, seyda, rewşenbîr, mamoste û zimanzanên Kurd ra jî lêkolîn û lêgerîn hate çekirin. Ango li ser kitêb, kovar, rojnamê, facebook û arşîvên Kurdî jî xebatên lêkolînê û raçavkirinên malperan hatin kirin.

Lê mixabin warê di'a û nifirên Kurdî da jî, ji bo edebiyata Kurdî ya nivîskî pir zêde çavkanî tune ne. Zêdetir di'a û nifir devkî û rîwayetên curbicur yên herêmî ne.

Di vê xebatê da me zêde mînakên notula di'ayên Qur'ana pîroz, sineta Pêxember, cewşena mezin û di'ayên ewliyan yên di nav gel da belavbûne zêde nenivîsîn. Çimkî babeta me di'a û nifirên ketine zargotina gel e. Pêwîst e ku ji bo pêşerojê di'a û nifirên Kurda jî bi awayekî akademîk û zimanekî xwerû bîn tomakirin û honandin.

Di'a û nifirên di navbera gel da wek çandekî tê bikaranîn. Lewra di'ayên pîroz yên resen ji Qur'an û sinetê hatine fêrbûn ji aliyê gel ve tên jiberkirin. Her tim bawermend nimêj û perestina xwe da ji wan di'ayan bikartînin. Ev yek jî di edebiyata devkî da dikeve nav edebiyata nivîskî.

Di dawiyê da em hatin vê encamê ku di van sed salên nû da di'a zêdetir li gor nifiran nav xelkê Kurd da pêşve neçûne û belavnebûne. Belkî meriv dikare hinek sedeman bihonînê. Ya yekem ev e ku bindestiya gelê Kurd e. Yên din ji zordestî, mêtîngerî û dagirkirina axa Kurdan e. Ev yek jî bûye sedema neheqiyê, zilm û cehaletê ji ber vê jî ev kesên ku mafên xwe bi rê û rêbazên hiqûqê ve nestandine ji ber bêçaretîyê, heyfa xwe bi layê nifiran va ifade kirine û xwe parastine. Nav gel da nifir wek adet û urfekî zêdetir devoka rojane da belav bûne.

Heke çend sedemên din jî em rêz bikin meriv dikare bêje di'a warê bîr û baweriya gel da kêmtên 'emilandin lê belê nifir jî zêde tî 'emilandin. Lewra nifir bi rêyeke kurt û hêsan ve çareseriya mafê xwe destxistin tê hesibandin.

Di'ayên Kurdan curbicur in û di nav gel da yê devkî tî 'emilandin dikevin naveroka zargotin û çandê. Tişteki çandiyê ye ku hemû welatên ku Kurd lê dijîn da hinek guherînê va xwe parastinê û belav bûnê. Lêbelê piranî ji bilî wan di'ayên pîroz wek ayet, hedîs, cewşen û di'ayên ewliya ev di'ayên devkî digel kesên xwe serî xwe di'a dikin da ji tî bikaranîn.

Destpêka belavbûna dîne Îslamê ya parzemînan şûn va bi alîkariya kitêbên pîroz, şev û rojên qendîla, rojên bimbarek wek rojên îne, eyd -'erefat û qendîlan da ew di'ayên hatin bikaranîn ketin hindûrê devoka gel û belav bûn nav çand û edebiyata xelkê Kurd jî.

Bandora dîne îslamê û jêderkên dîni û medresan digel alîm, şêx, seyda, mela û ewliya yê ku hezaran di nav miletê Kurd da derketine hezaran zêdetir aliman ev edebiyata Kurdan ya gelêrî da di'a bi gotin, helbest, dîwan û berhemên xwe ve pêşve birçûne. Ev di'ayên gelêrî mina axavtina jiyana rojane di nav xelkê Kurd da cih û war girtiye.

Dema ku meriv varyantên di'a û nifiran li gor deveran tîne pêşberî hevdu berawird dike, tê dîtin ku li gor devokan hevok yan jî peyv carna jî qertafan da guhertin çêdibin. Ev jî dide xuyakirin dewlemendiya ziman û edebiyata Kurdî li gorî erdnîgariyê pirdeng, pîreng û pîraliye. Lê sed mixabin li ber vê xebata dema ku me dît çend kelîme tîne manayeke em man nav berfirehiya xezîna zimanê Kurdî ya deverên cuda cuda da. Wek gor bihuşt Ehmedê Xanî û peyrewên wî jî didin nişandin ku ziman û wêjeya Kurdî hemû waran da çawa ku dewlemend û pîraliye wî warî da jî gelek dewlemend e.

Jibo zarokan mînak:

*Bira Xatûna Ferxan şekê bedena te nexe.*

*Şems bedena te şîn ke.*

*Xwedê bedena te şîn ke.*

*Xwedê bedena te ter bike.*

*Xwedê bedena we şên bike.*

*Xwedê bejna te ter bike.*

*Xwedê canê te hêşîn bike.*

*Xwedê warê te hêşîn ke.*

Jibo zewacê mînak:

*Evîna te bejn zirav be.*

*Evîna te bi dilê te be.*

*Jina te bi dile(kêfa) te be.*

*Xwedê jinkeka baş bi rizqê te biket.*

*Xwedê keçikek çarde salî bike nesîbê te.*

*Xwedê keçikek spehî nasîbî te bike.*

*Xwedê miradê te bi yeka Estelî bike.*

*Xwedê qîzeke baş têxe rizqê te.*

*Xwedê tiala yeka/ê bi dilê te bike kevçiyê (para) te.*

*Xwedê tiala yeka/ê bi dilê te bike nisîbê te.*

*Xwedê yeke/a xweşik bike nesîbê te.*

*Xwedê yeke/a salih nesîbê te bike.*

*Xwedê yekî bi dilê te bide te.*

*Xwedê yekî bi dilê te bike qismet.*

*Xwedê yekî şîr-helal bike nesîbê te.*

*Xwedê riziqê te êka li dîf dilê te biket.*

Di vê berhevkarîyê da berfirehî û kuraniya di'a û nifirên Kurdî gelekî bala me dikişandin. Zimanê di'a û nifiran hem rewan bû hem jî hemû peyvên erênî û neyînî radixistin ber çavan.

Em bi xwe ji cara ewil rastî ewqas navên curbicur nexweşîyan hatibûn. Ji bo bijîşk û ferhengszekî her peyveke têkildarî navên nexweşîyan wekî zêrê zer û gencîneyeke bû. Dema ku me ev nifirên têkildarî nexweşîyan dibihîstin, me rûbirû pirs dikir, kovar, kitêb, ferheng û malpera dinihêri bê ka ev çito nexweşî ye, çawa peyda dibe û encama wê çi ye. Ev peyvên erênî û neyînî yên ku di van di'a û nifiran da derbas dibin, pêşerojê wê bi kêrî bijîşkan, civaknas û derûnînasan jî bân.



Jibo nimûne hinek navên nexwaşîyan:

*Ava Zer, Bayê Felce, Buviya Qertemezê, Cinî bûn, Girêşreş, Guhanreş, Guhêş, Gurî, Gir, Guh Kerî, Danavî, Didanêş, Hêlikreş, Xewtêş, Qansêr, Xenequtk, Xişxişê, Xwetêşk, Nikulreş, Menencit, Mûmar, Îlancix, Kerkong, Kînor, Kezebrêş, Kwînêr, Kotî bûn, Kor û Topal, Kezeb Reş, Jana Reş, Jana Zirav, Jana Zer, Sîsotk(Sîroz), Sanciya Roviyan, Sewdeserî, Sewnêsi, Similmewt, Şîvsot, Xiştik, Xurî û Sorik, Şil û Şet, Tewek, Lalî, Sancî, Quzilqurt, Qirqinde, Qolincî, Qotik, Pêsoşkê, Pençêşîr, Rîşa Pûç(Alerjî), Zikêş, Zimankêşî, Zerik, Satilcanî, Zerka Reş, Janeser, Zecerê, Zingezinga Guh û hwd.*

Dawiyê da em dikarin bibêjin ku çanda Kurdî gencîneyeke pir kûr û dewlemend e. Di warê zaravada ev xebat pîr devlemend de ku hemû zaravayên Kurdî wek Kurmancî, Kirmancî (Dimilî), Soranî ji bili wê li gor deveran mezheb û olan jî wek behdînî, hekarî, êzîdî, 'elewî û rojavayê bakûr nav devokanda li gor hereman guhertin û nimûnyên din diyardibin. Peyvên hem watê zêdenê yan jî heman dem di hemû zaravanda tê êmilandin ji bo orjînalîteyê nehatin guhestin. Mijar yeke lê fîraksiyon curbicurin.

Jibo Xwedê tiala mînak: **“Xweda, Xwuda, Xway, Xwa, Ellah, Allah, Xaliq, Homa û Şems”**

*Ellah niweşî nido ganê to.*

*Ellah şifa û xêr bido to.*

*Homa firset nêkero destê zaliman.*

*Homa dadî û babê şima, serê şima ra kemî nêkero.*

*Lawo îşelaha Şems piştewaniya te be, tu têk neçî.*

*Xaliqê dinê-alemê bê hewara te.*

*Xwa malit bikate şiwênêk le şiwênekanî beheşit.*

*Xwayê beheşitman be nisîb bikey.*

*Xwedê çend sala 'emrê te kurtke bide ser aqilê te.*

*Xwedê dîn û dinya te berk (zexm) bike.*

*Ya Şems, tu hewara heftê du mileta bêyî, paşê hewara mal û zarê min bêyî.*

Jibo ajaleke çarpê mînak: **“Kêvrûşk, kêroşk, kevrîşk, kewrûşk, kêvrîşk, kevroşk, kêroşk”** hwd.

*Dewê te ser pišta kêwrûşkê be, berdêy, bersedêy pêra neghînî.*

*Nanê te li ser pišta kêvrîşkê be.*

*Nan tajî be, tu kêroşk bî.*

Jibo organekî bedenê wek gerdan, qirik, gewrî, hefik ra mînak: “**Hustu, stû, sto, sitî, îstî, îskur, îstu, histî, histo, esto, usto iskur**” hwd.

*Toqa Xwedê di hustuyê te keve.*

*Istuyê te bişkê heft ciya.*

*Şûr li iskura te keve, tîr li bedena te keve hwd. tê bikaranînê.*

Bi aliyê rastnivîs û peyvsaziyê da ji gelek peyvên Kurdî, ‘Erebî, Tirkî, Farsi, Îngilîzî hewparbûnê û ketine zimanê rojanê.

Mînak:

*Erebeyeke bêpilaqe lêxistî.*

*Tu bin tireke kevî.*

*Tu doxtor û hekîma bigerî.*

*Xwedê ji her qapiya (deriyan) qapîkî (deriyekî) lê veke.*

*Qapiyê te qapiyê Xwedê be, şên be.*

*Înşallah seretan (pênçeşîr) dilê te bigrît.*

*Qanser li te were/derkeve.*

*Weylê bin tîrenê ketî.*

*Torinê torinê te kêmaniyê nebîne*

*Xwedê riya doxrî bide te.*

*Serê te bin bîçerê bikeve.*

*Tu herî aqreb (dûpişk) bi te bigre.*

*Tu pir eydiya (îdan, cejnan) bibînî.*

*Xwedê te motacî tu benî adema neke.*

*Tu motacî bav û birê xwe bî.*

*Tu motacî ker û kûçika bî.*

*Aqûbet (axde) li sere we be.*

*Belkî tu bêaqûbet bî.*

*Xwedê beheştê bi riziqê me bike.*

*Ya Rebî tu paryekê nanê helal bi riziqê me bikey.*

*Xwaye ewende riziqman pê bibexşe ke dînman le dest nedeyn.*

Di vê xebatê da minakên bin xet da jî diyare rengîniya di'a û nîfirên Kurdî, bi teşeyekî zengîn hate diyarkirin ku ev rengînî dewlemendiya di'a û nîfirên Kurdî û nîşaneyê pêşketina çand û zimanê Kurdî ye. Di navbera zimanên cîhanê da danûstanineke pîralî û gerguhez heye ku dema tu wê peyvê derdixî wate nayê cih. Lê mixabin mînakên jorîn da jî kifşdibe gelek bêjê nav zimanan da xeliyanê bibûnê mal ê zimanekî din.



## 6. ÇAVKANÎ

### 6.1. Çavkaniyên Nivîskî

**MEALA QUR'ANA PÎROZ A KURDÎ**, (Amd.: Huseyîn Gündüz û Mehmet Seyhan û M. Emîn Özaşar), Weşanên Serokatîya Karûbarên Diyanetê, Stenbol 2015.

**ADAK**, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2013.

**AHMED MÎRZA MÎRZA**, “İslam Tarihinde Kürtler” *İslamin Kürdistan’da Yayılması*, Weşanên Nidayê, Stenbol 2015.

**AKKUŞ**, Suleyman, “*Di Dîwanên Klasîk û Çanda Kurdan de Dua*” Kovara Nûbiharê, Hejmar 132, r. 33-37.

**AZAD MAKÛYÎ**, *Ferhenga Kurdî- Farsî*, Weşanên Koma Kurdiya Kurmancî ya li Tehranê, Teran 1390.

**AYDIN**, Fatih, *Ji Wikîferhengê Ferhenga Kurdî – Kurdî*, Çapa Elektronik, 2016.

**BURKAY**, Kemal, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Dengê, Diyarbakır 2008.

**EHMEDÊ XANÎ**, *Eqîdeya Îslamê*, Weşanên AKYADê, Agirî 2014.

....., *Eqîdeya Îmanê*, Weşanên AKYADê, Agirî 2014.

....., *Hemû Berhem* (Berhevkar: Kawa Nemir, Selîm Temo), Weşanên Lîsê, Stenbol 2008.

....., *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî* (Wer.: Perwîz Cihanî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2007.

....., *Cewheru’l Me’anî fî Şerhu’l Dîwanu’ul Ehmedî Xanî*, (Wergera ‘Erebî: Tehsîn İbrahim Doskî), Weşanên Sipîrêz, Duhok 2005.

....., *Mem û Zîn a Ehmedê Xanî* (Amd.: Huseyn Şemraxî), Weşanên Rawza û Nubiharê, Stenbol 2011.

....., *Mem û Zîn* (Wer.: M. Emin Bozarslan), Weşanên Hasat, Stenbol 1990.

**BEDÛZZEMAN SÊÎDÊ KURDÎ**, *Ji Kuliyata Rîsaleyên Nûr Peyva Bîst û Sêyemîn* (Wer.: Sabah Kara), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 1992.

- BİLİR**, Sezen - **AKPINAR**, Alişan “Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu” *Kovara Dîroka Kurdî*, Hejmar 3, Stenbol 2014, r. 26-30.
- CUBRAN MES’UD** , *el-Ra’id Mu’cemu’l Luğatül Esrî*, Darül ‘Ilim, 1992 Beyrut.
- ÇIYA MAZÎ**, *Baxek ji Foklora Kurda – Ji Derdora Mêrdîn*, Weşanên Berbangê, Stenbol 2014.
- DEMÎRHAN**, Umîd, *Ferhenga Destî Kurdî bi Kurdî*, Çapa Duyem, Weşanên Sewadê, Bazîd-Agirî 2007.
- D. ÎZOLÎ**, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Dengê, Amed 2011.
- EBÛ HANİFE AHMED ed-DİNEVERÎ**, *İslam Tarihi*, (Wer.: Nusrettin Boleli), Hivda Yayınları, İatanbul 2007.
- ELÎ EKBER KURDİSTANÎ**, *Ferhenga Kurdistanî*, (Wer.: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2010.
- GÜMÜŞ**, Nezir – **KARADEMİR**, Fevzî – **İLHAN**, Ziver, *Ferhenga Kurdî- Tirkî*, Weşanên Türk Dil Kurumuyê, Enqere 2014.
- EVLİYA ÇELEBİ**, *Seyahatnameya Ewliya Çelebî*, Weşanên Wezarata Perwedehiyê, Stenbol 1997.
- FIRAT**, Mehmet, *Ferhenga Navên Riwekên Bi Kurdî*, Weşanên Sîtavê, Wan 2013.
- GAZÎ**, Mustafa, *Nifir û Duayên Kurdî*, Zîncîreya Pirtûkên Enstîtûya Kelepora Kurdî 33, Çapxaneyê Wezareta Perwerdeyê, Çapa Yekem, Hewlêr 2006.
- İBRAHİM SEDİYANİ**, *Adını Arayan Coğrafya*, Özedönüş Yayınları, İstanbul 2015.
- QANATÊ KURDO**, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, (Wer.: Ziya Avcî) Weşanên Lîsê, Stenbol 2009.
- KAŞGARLI MAHMUT**, *Diwana Lugata Tirkî*, Stenbol 2001. ( Bnr.: Kovara Dîroka Kurdî. Hejmar 3).
- NECATÊ ZİVİNGÎ**, *Stêrkên Edebiyata Kurdî*, Weşanên Banga Heqê, Stenbol 2014.
- M. EMÎN ZEKÎ BEG**, *Dîroka Kurd û Kurdistanê* (Wer.: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol 2012.
- MAHMUD LEWENDÎ (MALMÎSANÎJ)**, *Hêvî Kovara Çandîya Giştî*, Hejmar 3, Parîs - France 1985.

- MELA MAHMUT MA'SÛM BOTÎ (DILBIRÎN)**, *Cerxa Cihanê Tarîxa Kurd û Kurdîstanê*, Weşanxana Îhsan, Stenbol 2011.
- MELA MIHEMED QUTBÊ ERWASÎ**, *Tiba Melayê Erwasî* (Wer.: Kadri Yıldırım), Weşanên Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artukluyê, Stenbol 2013.
- MEM ARTEMÊT**, *Folklorê Kurdan*, Weşanên Komeleya Kurdî, Hejmar 5, Amed 2016.
- MUHAMMED ALÎ ES-SÎWÊREKÎ EL-KURDÎ**, *Ûrdûn Kürtleri*, (Çev.: Kadri Yıldırım) Avesta Yayınları, İstanbul 2006.
- MUSA ANTER**, *Ferhenga Khurdî-Tirkî*, Yeni Matbaa, İstanbul 1967.
- ORDÎXAN Û CELÎLÊ CELÎL**, *Zargotina Kurda*, Berg II, Weşanên Aramê, 2013 Amed.
- QABEEL MUHEMED MAWLÛD**, *Semînera Lîsansa Bilind a Bîtez*, Zanîngeha Wan Yûzûncû Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan 2016.
- SAĞNIÇ**, Feqî Huseyîn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.
- SERÎNSU**, Ahmed Nedîm, *Ferhenga Termên Dînî*, Weşanên Wezaretê Perwerdehiyê, Enqerê 2009.
- SHEERIN ARDALAN**, *Erdalan Kürtleri*, Avesta Yayınları, İstanbul 2011.
- ŞEMSETTİN SAMÎ**, *Kamus'ul A'lâm*, Matbaaya Mîhranê, Stenbol 1889-1898.
- ŞEREFXAN BITLÎSÎ**, *Şerefname*, (Wer.: M.Emîn Bozarslan), Weşanên Dengê, Diyarbekir 2006; Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2013.
- TORÎ**, Mehmet Kemal, *Ferhenga Torî*, Weşanên Berfînê, Stenbol 2004.
- YILDIRIM**, Qadrî, *Rêzimana Kurdî Ya Zaravayê Kurmancî*, Weşanên Avestayê, Stenbol 2013.
- ZANA FARQÎNÎ**, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004.
- 6.2. Çavkaniyên Devkî (Rûbirû)**
- CIVAKNAS FATMA ÖNER**, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1972, Ragihandin: 21 Tîrmeh 2016.

- DAY NÎSBET ÖNER Û MALBATA WÊ**, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1945. Ragihandin: 11 Adar 2015.
- DERÛNAS HACER BÎNGOL**, *Devera Amedê*, Erxanî 1978. Ragihandin: 12 Cotmeh 2016.
- DR. ÎSMAÎL KIRAN**, *Devera Serhedê*, Gundê Adirê-Wan 1970. Ragihandin: 21 Avrêl 2016.
- EHMED SERHEDÎ**, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1974. Ragihandin: 13 Tîrmeh 2015.
- EDEBIYATNAS NECMÎ AKIN XANÎ**, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1972. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- FEYZULLAH-FAYÎME ÎLERÎ Û MALBATA WAN**, *Devera Serhedê*, Gundê Canîkê-Wan 1962-1968. Ragihandin: 21 Sibat 2016.
- HECÎ HESEN AKIN GÛZEREŞÎ**, *Devera Hekariyê*, Çelê-Colemêrg 1951. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- XWENDEKAR MIHEMED BAKÎ Û SELVA ÎLERÎ**, *Devera Serhedê*, ‘Eşîra Birûkan, Wan 1984-82. Ragihandin: 2 Adar 2016
- ÎDRÎS BATEYÎ**, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirnax 1975. Ragihandin: 30 Cotmêh 2015.
- KARSAZ EHMED OSTA**, *Devera Bingolê*, Genç-Bingol 1985. Ragihandin: 29 Îlon 2016.
- KEK ÎSMED ÖNER TAŞÛÇANÎ**, *Devera Serhedê*, Qulp-Îdir 1960. Ragihandin: 20 Îlon 2016.
- KEK NESÎM ERZİROMÎ**, *Devera Serhedê*, Tekman-Erzirom 1969. Ragihandin: 11 Çile 2016.
- MALBATA BRAHÎM Û NEWROZ KURDÎ**, *Devera Rojavayê*, Kamışlo 1974-1976. Ragihandin: 20 Sibat 2016.
- MELA ARIF KARAKAYA**, *Devera Serhedê*, Kop-Mûş 1947. Ragihandin: 10 Sibat 2016.
- MELA FERÎD BAZIDÎ**, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1958. Ragihandin: 26 Sibat 2016.
- MELA MÛSA CELALÎ**, *Devera Serhedê*, Bazîd-Agirî 1963. Ragihandin: 15 Sibat 2016.
- MELA REŞÎD DUNDAR**, *Devera Serhedê*, Gimgim-Mûş 1945, Ragihandin: 20 Îlon 2016.

- MELA SALIHÊ DIHÊ**, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1945. Ragihandin: 20 Îlon 2016.
- MIHMED Ê ZERÎFÊ BATEYÎ**, *Devera Hekariyê*, Elkê-Şirmax 1973-1979. Ragihandin: 30 Cotmeh 2015.
- SEYDA MELA ŞEFÎQÊ BOTÎ**, *Devera Botan*, Rêya Armûşê-Wan 1946. Ragihandin: 27 Sibat 2016.
- SEYÎD BEŞÎR ERZEN Ê MALBATA WÎ**, *Devera Botan*, Dihê-Sêrt 1956. Ragihandin: 11 Mijdar 2015.
- ZIMANNAS GHARIB ALI**, *Devera Soran*, Qaladizê-Silêmanî 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- ZIMANNAS MAMOSTA MOHAMMED MÊRGEYÎ**, *Devera Soran*, Rawandiz - Hewlêr 1974. Ragihandin: 19 Cotmeh 2015.
- ZIMANNAS RABAR ISMAEL**, *Devera Soran*, Hewlêr 1993. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- ZIMANNAS REBAND ISMAEL**, *Devera Soran*, Hewlêr 1991. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- ZIMANZAN HAKAN ÇIFTÇÎ**, *Devera Serhedê*, Gîhadîn-Agirî 1977. Ragihandin: 19 Sibat 2016.
- ZIMANZAN M. NUREDDÎN SÊÎD**, *Devera Behdînan*, Zaxo-Duhok 1992. Ragihandin: 20 Sibat 2016.
- ZIMANZAN REBÎ ÎSMAÎL HALÎD**, *Devera Behdînan*, Akra-Duhok 1991. Ragihandin: 20 Sibat 2016.

### 6.3. Çavkaniyên Malperî

- DEMÎRHAN**, Umîd, <http://daxistin.ferheng.org/ferhengadesti.pdf>. Ragihandin: 02 Tebax 2016.
- .....[http://www.Kurdishstudies.pl/files/Fritillaria\\_Kurdica\\_2014\\_05.pdf](http://www.Kurdishstudies.pl/files/Fritillaria_Kurdica_2014_05.pdf).  
Ragihandin: 02 Tebax 2016.

**KAYA**, Hesên, *Çend Nîfr ji Kaniya Folklorê Kurdî I, II, III*,



<http://www.pen-Kurd.org/Kurdi/hesen-kaya/cend-nifirkaniya-folklor-Kurdi.html>.  
Ragihandin: 26 Îlon 2016.

<http://www.pen-Kurd.org/Kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-Kurdi-2.html>  
Ragihandin: 26 Îlon 2016.

<http://www.pen-Kurd.org/Kurdi/hesen-kaya/cend-nifir-kaniya-folklor-Kurdi-3.html>  
Ragihandin: 26 Îlon 2016.

**MAHABADÎ**, Occo, <https://occomahabad.wordpress.com/2016/03/03/nifiren-Kurdan-kurtlerin-beddualari/>. Ragihandin: 15 Avrêl 2016.

**NIFIRÊN DAYIKÊN KURD**, <http://www.ferhengamed.com/p/14390/nifire-n-dayike-n-Kurd>. Ragihandin: 26 Îlon 2016.

**NIFIRÊN KURDÎ**, <http://www.tirsik.net/p/1895/nifiren-Kurdi>. Ragihandin: 20 Îlon 2016.

**NIFIRÊN KURDÎ**, <http://www.mirbotan.com/zimani-Kurdi/228137-nifiren-Kurdi.html>.  
Ragihandin: 02 Hezîran 2014.

**NIFIRÊN KURDÎ**, <http://bijwen.sozlukspot.com/w/nifiren-Kurdi/>. Ragihandin: 20 Hezîran 2016.

**ZINAR**, Zeynelabidin, <https://www.facebook.com/zeynelabidin.zinar?fref=ts>. Ragihandin: 25 Tebax 2016.

## 7. XWE JÎNENÎGARÎ

Di sala 1972 da li gundê Taşûcanê (Taşucan) yê li ser navçeya Qulpa (Tuzluca) giredayî bajara Îdirê hatiye dinyayê. Dibîstana seretayî gundê Erekerê (Kaxîn) ya navendî û ya lîseyê jî bajara Agiryê qedandiye. Sala 1998ê da ji fakûlteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Erziromê mezun bûye. Heman deme beşa mamostetiya polê jî wî bajarê xwendiyê. Di zanîngeha Wanê beşa Dîroka Îslamê û Hûnerên Wê da di sala 2011an da lîsansa xwe ya bilind destpê kirîyê. Di sala 2013an da li Zanîngeha Wanê di beşa Edebîyat û Çanda Kurdî da jî master kiriye. Li ser edebiyata klasîk û dîrokê nivîs û meqaleyên wî di kovarên wekê Nûbihar, Nûpelda, Vangölü û hinek kovar û rojnemeyan din da hatine weşandin. Niha li bajara Wanê di lîseyeke da mamostetiyê dike. Nivîskar digel zimanê dayîkê ‘erebî, farisî, îngilîzî, tirkî (osmanî) û ‘ecemkî dizanê.